

**K.T.
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

DÎROKA WERGERÊ Û XEBATÊN WERGERA KURDÎ

TEZA LÎSANS A BILIND

AMADEKAR

YUSUF TAŞTAN

ŞÊWIRMEND

Dr. Öğr. Üyesi MEHMET METİN BARLIK

WAN - 2019



T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dr. Öğr. Üyesi Mehmet Metin BARLIK danışmanlığında, Yusuf TAŞTAN tarafından hazırlanan “**Dîroka Wergerê û Xebatên Wergera Kurdî**” adlı bu çalışma, **25/06/2019** tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Dr. Öğr. Üyesi Mehmet Metin BARLIK

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Kemal KAYA

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza:

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.

26/06/2019
Prof. Dr. Murat DEMİREL
Enstitü Müdürü

Teza Lîsansa Bilind

Yusuf TAŞTAN

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

Hezîran, 2019

DÎROKA WERGERÊ Û XEBATÊN WERGERA KURDÎ

KURTE

Werger ji bo têkiliya mirovan hewldaneke gelekî girîng e. Piştî ku têkiliyên mirovan zêde bûn bi taybetî piştî metnên olî derketin holê û li nav netewên cuda cuda belav bûn û cudahiya zimên ji bo ragihandinê bû asteng. Ji ber vê mirov ketin nav hewldana jihevîfêmkirinê. Bi vî hawî vê hewldanê jî hewcedariya wergerê derxist holê û hewldanên wergerandinê derketin holê. Van hewldanan heta nîveka sedsala bîstan bi awayekî derzanistî, piştî nîveka sedsala bîstan bi awayekî zanistî heta roja îro hatine. Ji bo kurdî jî li gor dem, şert û mercan hewcedariya wergerê çêbûye û çî kurdan çî biyaniyan xwe avêtine bextê wergerê û ji kurdî ji bo zimanên biyanî û ji zimanekî biyanî ji bo kurdî werger kirine. Bi vî awayî hem nasnameyê wergeran ji bo kurdî derketiye holê hem jî paşxaneyê nivîsa kurdî bi xebatên wergerê hatiye dagirtin. Di vê xebatê de hewldanên wergerê him jê hêla dîroka wergerê ve him jî ji hêla pêşketina teoriyê ve hat nirxandin. Em li pey bersiva “Him li Rojavayê Cîhanê him jî li Rojhilatanavîn xebatên wergerê çawa derketin û bi pêş ketin?” ketin û me hewl da ku demên krîtîk ên xebatên wergerê diyar bikin. Dîsa xebatên wergerê yê kurdolojiyê hatin nirxandin û ji destpêkê heta çareka ewil ya sedsala 20’an xebatên wergerê yê kurdî hatin analîzkirin. Mebesta vê xebatê ew e ku paşeroja wergerê, pêşketina teoriya wergerê, xebatên wergernasiyê û xebatên wergera kurdîbi zimanê kurdî û bi mêjîyekî kurdî li ber çavan bînin raxistin.

Peyvên Sereke: Werger, Dîroka Wergerê, Wergera kurdî, Teoriya Wergerê, Wergernasî.

Yüksek Lisans Tezi

Yusuf TAŞTAN

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Haziran, 2019

ÇEVİRİ TARİHİ VE KÜRTÇE ÇEVİRİ ÇALIŞMALARI

ÖZET

Çeviri insanlar arasındaki iletişim için önemli bir etkinliktir. İnsan ilişkilerinin artmasıyla özellikle dini metinlerin ortaya çıkması ve dinlerin farklı milletler arasında yayılmasıyla dil farklılığı problem haline geldi. Bu durum beraberinde çeviri gerekliliğini ortaya çıkardı ve böylece çeviri etkinliği sonrasında çeviri sorunsallığı ortaya çıktı. Çeviri sorunsallığı yirminci yüzyılın ortalarına kadar bilimsellikten uzak bir şekilde ilerledi, fakat yirminci yüzyılın ortalarından sonra bilimsel bir boyut kazandı ve günümüze kadar geldi. Bu tarihsel süreçte Kürtçe yazını da zamana, sosyal ve siyasal süreçlere göre çeviri pratiğinden nasibini almıştır. Her ne kadar dünyadaki çeviri akımlarının ortaya çıkış tarihi ve tarzıyla paralellik göstermese de, Kürtçe yazınının çevirisi tarihin sayfalarında yerini almıştır. Bu çalışmada da çeviri hem tarihi açıdan hem de gelişimi ve geçirdiği süreçler açısından değerlendirildi. Çevirinin hem Batı'da hem Doğu'daki gelişimi ve çeviri açısından kritik olan dönemler analiz edildi. Ayrıca Kürtçe çeviri çalışmaları ve Kürtçe çeviri çalışmalarının dönüm noktası sayılabilecek kritik dönemler değerlendirildi. Bu çalışmayla amaç, çevirinin tarihsel gelişimi ve çeviri sorunsallığı üzerine çalışmaların gelişimini, Kürtçe çeviri çalışmaları Kürt Dili ile ve Kürtçe bir mantıkla sunmaktır.

Anahtar Kelimeler: Çeviri, Çeviri Tarihi, Kürtçe Çeviri, Çeviri Teorisi, Çeviribilim.

M.Sc. Thesis

Yusuf TAŞTAN

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY

INSTITUTE OF LIVING LANGUAGE

June, 2019

THE HISTORY OF TRANSLATION AND KURDISH TRANSLATION STUDIES

ABSTRACT

Translation is an important activity for communication between people. With the increase of human relations, especially with the emergence of religious texts and the spread of religions among different nations, the diversity of language has become a problem. This situation brought about the necessity of translation and then the pain point of translation emerged after the translation activity. The pain point of translation progressed apart from scientific until the mid-twentieth century, but after the mid-twentieth century it gained a scientific dimension and survived to the present day. In this historical process, the Kurdish literature has effected from the practice of translation according to time, social and political processes. Although it does not show parallelism with the date and style of the emergence of translation movements in the world, the translation of the Kurdish writing has taken its place on the pages of history. In this study, the translation was evaluated both in terms of its history and its development and processes. The development of translation in both the West and the Middle East and the critical periods in terms of translation were analyzed. In addition, Kurdish translation studies and critical periods that could be considered as the turning points of Kurdish translation studies were evaluated. to present the works in Kurdish language and in Kurdish logic.

Keywords: Translation, History of Translation, Kurdish Translation, Translation Theory, Translation Science.

Naverok

KURTE	I
ÖZET.....	II
ABSTRACT	III
KURTEBÊJE	VI
PÊŞGOTIN	VII
DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	3
1. LI CÎHANÊ PÊŞKETINA KARÊ WERGERÊ	3
1.1. JI DESTPÊKÊ HETA SEDSALA 20'Î WERGER	3
1.1.1. Ji Destpêkê Heta Sedsala 20'î Pratîka Wergerê.....	5
1.1.1.1. Li Rojavayê Cîhanê Pêşketina Pratîka Wergerê.....	5
1.1.1.2. Li Rojhilatê Pêşketina Pratîka Wergerê	8
1.1.1.2.1. Di Dema Osmaniyan De Xebatên Wergerê.....	9
1.1.2. Pêşketina Teoriya Wergerê	10
1.1.2.1. Ji Destpêkê Heta Sedsala 20'î Pêşketina Teoriya Wergerê.....	10
1.1.2.2. Xebatên Teoriya Wergerê li Rojhilatê.....	19
1.2. DI SEDSALA 20'Î DE PÊŞKETINA WERGERÊ	23
BEŞA DUYAN	27
2. DI KURDOLOJIYÊ DE PÊŞKETINA PRATÎKA WERGERÊ	27
2.1. Ji Destpêkê Heta Sedsala 20'î Wergera Kurdî.....	27
2.1.1. Di Kurdolojiyê de Hewldanên Beriya Wergerê	30
2.1.1.1. Amadekirina Ferheng û Pirtûkên Rêzimanê Yên Kurdî.....	30
2.1.1.2. Di Kurdolojiyê de Xebatên Wergerê.....	33
2.1.1.2.1. Wergera Ji Zimanên Biyanî Ji Bo Kurdî Ji Mêj Heta Sedsala 20'î	33
2.1.1.2.1.1. Xebatên Serdema Mîrekiya Erdelanê	33
2.1.1.2.1.2. Wergerên Kurdnasên Rojavayî.....	34
2.1.1.2.1.3. Wergerên Dîndarên Xiristyanî û Îslamî.....	36
2.1.1.2.1.3.1. Xebatên Dîndarên (Mîsyoner) Xirîstyanî.....	37
2.1.1.2.1.3.2. Wergera Metnên Îslamî.....	45
2.1.1.2.2. Wergera Ji Kurdî Ji Bo Zimanên Biyanî Ji Mêj Heta Sedsala 20'î	47

2.2. Di Serdema Nû De Xebatên Wergerê.....	55
2.2.1. Wergerên Ji Zimanê Biyanî Ji Bo Zimanê Kurdî Di Serdema Nû De ..	56
2.2.1.1. Wergera Di Nav Rûpelên Çapameniya Kurdî De	56
2.2.1.1.2. Wergerên Încîlê	57
2.2.1.1.3. Xebatên Wergerê Li Kurdistanê Îraqê.....	60
2.2.1.1.3.1. Du Gavên Girîng Di Pêşketina Bizava Wergera Kurdî De	60
2.2.1.1.3.2. Wergera Şanoyan.....	62
2.2.2. Wergera Ji Kurdî Ji Bo Zimanên Biyanî Di Serdema Nû De	63
2.2.2.2.1. Hînerê Zimanê Kurdî Rehbera Zimanê Herdu Kurdî: Kurmancî- Babanî.....	65
1.1.2.2.2. Werger Li Ermenîstana Sovyetê Di Salên 1920'î De.....	66
NIRXANDIN	67
ENCAM	74
ÇAVKANÎ	76

KURTEBÊJE

ABS	American Bible Society
BFBS	British and Foreign Bible Society
BZ	Beriya Zayînê
PZ	Piştî Zayînê
H.	Hicrî
M.	Mîladî
HWD.	Her wekî din
ÎNG.	Îngîlîzî
ELM.	Elmanî
S.	Sahîfe,rûpel

PÊŞGOTIN

Werger wekî amûra navbeynkar ya çand û zimanan e. Belku meriv dikare bêje nameya navbera zimanan e. Her ku însanan ji hev fehm nekirine xwe avêtine bextê wergerê û werger bûye amûra sereke ya têkiliyê. Piştî ku însanan nivîs pêş xist, bêguman wergerê rola xwe di warê nivîsê de jî leyîst û wergera nivîsê derket holê. Meriv dikare bêje dîroka wergera nivîsê jî bi qasî dîroka nivîsê kevn e. Di vê xebatê de em jî li pey rabirdûya wergera nivîskî ketin ku ka di rabirdûyê de li cîhanê û di nav kurdan de wergera nivîsê çawa derketiye û çawa bi pêş ketiye. Me rabirdûya wergerê li ser du beşan nirxand. Di beşa yekê de em li ser pêşketina wergerê ya li cîhanê, bi taybetî li Rojava û Rojhilata Navîn; di beşa duyan de jî em li ser xebatên wergera kurdî sekinîn. Me bi vê yekê xwest ku em rabirdûya xebatên wergera raxin ber çavan û têkiliya pêvajoya xebatên wergerê yên cîhanê û yên kurdî binirxînin.

Dema meriv li ser dîroka wergera kurdî lêdikole, meriv bi piranî di nav rûpelên xebatên edebiyatê de rastî çend agahiyên biçûk ên li ser xebatên wergerê tê. Dema em li ser mijara xebata xwe xebitîn, em zêde rastî xebatên hem li ser wergera kurdî, hem jî wergera cîhanê yên bi kurdî nehatin. Bêguman, divê em bînin ziman ku ev rewşa ku em behs dikin ji bo lîteratura kurmançî ya li Tirkîyê ye. Girîniya vê xebata me jî ew e ku me xebatên wergera kurdî û pêşketina wergerê ya li Cîhanê bi zimanê kurdî û bi zaravayê kurmançî anîye zimên û têkiliya piroseya her du qonaxan daye ber hev.

Ji bo vê xebatê me ji çavkaniyên tirkî, kurdî û îngîlîzî sûd wergirtin. Ji bo xebatên kurdî me ji Pirtûkxaneya Zanîngeha Silêmaniyê, Pirtûkxaneya Zanîngeha Cambridge'ê ya onlîne û gelek pirtûk û kovar û gotar û malperên kurdî sûd wergirtin.

Di pêvajoya amadekirina vê xebatê de, di serî de ji ber pişgiriya wê, ji hevjinê xwe Habibe YİĞİT TAŞTAN re; ji bo parvekirina nîşe û xebatên wî û keda wî ya ji bo pêşketina vê xebatê ji Mesut ARSLAN re; ji bo alîkariya wî ya giranbuha ya ji bo çavkaniyên bi kurdiya zaravayê soranî, ji Sabir ABDULLAHIZAD re; ji bo alîkarî û nirxandinên wî yên ji bo tezê ji şêwirmendê xwe Dr.Mehmet Metin BARLIK re spas dikim.

Yusuf TAŞTAN

DESTPÊK

Werger ji bo têtîliya mirovan hewldaneke gelekî girîng e. Piştî ku têtîliyên mirovan zêde bûn bi taybetî piştî metnên olî derketin holê û li nav netewên cuda cuda belav bûn cudahiya zimên ji bo ragihandinê bû asteng, ji ber vê mirov ketin nav hewldana jihevîfêmkirinê. Bi vî hawî vê hewldanê jî hewcedariya wergerê derxist û hewldanên wergerandinê derketin holê. Van hewldanan heta nêveka sedsala bîstan bi awayekî derzanistî, piştî nêveka sedsala bîstan bi awayekî zanistî heta roja îro hatine. Di vê xebatê de me ev hewldanên wergerê ji alî pêşketina dîrokî ve analîz kirin. Em li pey bersiva pirsê “Li Cîhanê xebatên wergerê çawa derketin û bi pêş ketin?” ketin û me demên krîtîk ên xebatên wergerê diyarkirin. Wekî din me destpêka wergera kurdî û pêşketina wergera kurdî di çarçoveya xebatên ku me xwe gihandinê de pêşkêş kir. Di serî de me ji destpêkê heya sedsala bîstî rabirdûya wergerê nirxand ku werger çawa derketiye û li cîhanê çawa bi pêş ketiye. Me ji serdemên antîk heya sedsala bîstî li Rojavayê pêşketina xebatên wergerê û pêşketina teoriya wergerê nirxand. Pişt re em li ser pêvajoya hem pratîka wergerê, hem teoriya wergerê ya li Rojhilata Navîn sekinîn. Bêguman sedsala 20’î ji bo wergerê bûye dema pêşketin û guherînên gelek mezin. Me xebatên li ser wergerê yê sedsala 20’an raxist ber çavan û proseya wergerê ya heya îro hatiye, nirxand. Bi taybetî avabûna wergernasiyê û pêşketina wê hat nirxandin.

Di beşa duyem de em li ser xebatên wergerê yê nivîsa kurdî sekinîn. Ewîl me xebatên wergera nivîsa kurdî yê ji mêj heya sedsala bîstî nirxandin pişt re jî xebatên ji destpêka sedsala 20’î heya 1930’î hatine kirin, nirxandin. Her çiqas ne xebatên wergerê bin jî, ji ber ku gavên ewil yê ji bo wergerê ne me agahiyên derheqê ferhengên ku hatine amadekirin de jî dan.

Me xebatên wergera kurdî yê heya sedsala 20’î di bi du awayan nirxand:

1. Wergerên Ji Zimanên Biyanî Ji Bo Kurdî

Ew jî di bin sê sernavan de nirxand:

a. Xebatên Serdema Mîrekiya Erdelanê

b. Xebatên Mîsyoner û Rojhilatnasan

c. Wergera Metnên Olî

2. Wergerên Ji Kurdî Ji Bo Zimanên Biyanî

Xebatên ji despêka sedsala 20'î heya 1930'î me wek wergerên Serdema Nû bi nav kir û ew jî di bin van sernavan de nixand:

1. Wergerên Ji Zimanên Biyanî Ji Bo Kurdî

a. Wergera Di Nav Rûpelên Çapameniyê De

b. Wergerên Încîlê

c. Xebatên Li Kurdistana Îraqê

2. Wergerên Ji Zimanê Kurdî Ji Bo Zimanên Biyanî

Me di vê xebatê de xebatên wergera kurdî yê ji mêj heya 1930'î nixandin. Ji ber ku piştî avabûna Komara Tirkiyê, li Tirkiyê ji binî ve nivîsa kurdî qedexe bû û li wir xebatên kurdî rawestiyan. Paralelî Tirkiyê, desthilata farisan jî li seranserê Îranê kurdî qedexe kir. Li Suriyê jî di vê serdemê de rola rewşenbîriya kurdan bi pêşengiya Bedirxaniyan li ser piştî ekola çapameniyê bû. Li Îraqê jî piştî îngîlîz ji Îraqê vekîşyan û 1932'an de Qiraliyeta Îraqê ava bû. Li wir hêj Qiraliyetê avanebûyî ji ber polîtîqayên siyasî xebatên li ser kurdî pir kêmbibûn. Piştî avabûna Qiraliyetê ji bo demeke dirêj xebatên kurdî rawestiyan. Ji ber vê yekê me xebata xwe bi sala 1930'î sînor kir.

BEŞA YEKEM

1. LI CÎHANÊ PÊŞKETINA KARÊ WERGERÊ

1.1. JI DESTPÊKÊ HETA SEDSALA 20'Î WERGER

Xebatên wergerê kombîna pratîk û teoriyê ne. Di vê çarçoveyê de dema mirov berê xwe dide dîroka pratîka wergerê mirov dikare bêje bi qasî dîroka mirovahiyê kevn e. Lê li gor dîroka nivîskî pratîkên ewil ên wergerê beriya mîladê der û dora salên 3000'î hatine kirin. Li gor çavkaniyên nivîskî, di wan salan de li Misirê wergêrên bi awayekî devkî werger kirine hebûne. Li gor agahiyên arkeolog didin 4500 sal berî niha li ser tabletên sumerîyan hin peyv bi zimanê sumerî-ebraîteyî hatine nivîsîn (Aksoy, 2002, s. 14). Dîsa peymaneke duzimanî ku di navbera hîfîtî û firewnên Misirê de hatiye destnîşankirin wekî wergera nivîskî ya ewil têqebûl kirin (Göktaş, 2005, s. 51-62).

Dema mirov berê xwe dide paşeroja wergerê, nêrînên li ser wergerê yê bingehîn cara ewil di serdema Antîk a Yewnanî û Romyayî de derketine holê û van nêrînan her tim bandora xwe li ser nêrînên pey xwe jî kirine û heta hin ji wan nêrînan hêj tên nîqaşkirin (Yıldırımçakar, 2016, s. 8) û hêj tên bikaranîn. Wergerên ewil, wergerên, çî metnên olî û çî edebî, ji ber kêmasiyên zimanê jêder û zimanê armanç peyv bi peyv hatine kirin. Ev şêwaz ne xwediyê feraseteke pêşketî a ziman e û zêde zêde metna jêder mezin kiriye. Têgihîştina van wergeran pir dijwar e. Lê li gor wegêr ev dijwarî ne ji ber kêmasiyên wî ne, tenê ji ber pîroziya metna jêder e. Ji ber heyraniya li hember metna jêder metnên wergerê yê ku zêde nehatine fêmkirin derketine holê (Kızıltan, 2000, s. 75).

Heta nivê sedsala 20'an, teoriya wergerê di navbera nîqaşên li ser “wergera peyv bi peyv”, “wergera wate bi wate” (azad) û “wergera sadiq” de fetisî ku paşeroja wê digihêje Cîcero (sedsala 1'ê BZ) û Hieronymus (dawiya sedsala 4'an PZ). Cicero tîne zimên ku wî, ne wek wergêrekî, weke xetîbekî form û fikr parastine lê bi zimanê ku em bikar tînin îfade kirine, bi vî şiklî hewceyî wergera peyv bi peyv nedîtiye lê dîsa jî stîl û hêza zimên jî parastiye (Munday, 2001, s. 19). Vê nîqaşa wergerê ya li ser “wergera peyv bi peyv”, “wergera wate bi wate / wergera azad” bingeha teoriya wergernasiyê avakir ku yek ji nîqaşên wergerê ya girîng e û heta îro jî hatiye. Herwiha van nîqaşan di bizavên wergera rojhilatê de jî dewam kirine. Li cem ereban

bi taybetî di serdema Ebbasiyan de, wergerên berhemên zanistî û felsefî yên yewnanî ji bo erebî, ku gelek caran jî bi rêya suryaniyê dihate kirin (Munday, 2001, s. 20). Avakirina Beytul Hîkme û xebatên ku li wir hatin kirin, bi xwe re ekolek ava kir. Wê ekolê tenê karê wergerê nekir, kesên wek el-Cahiz, el-Curcanî û es-Safedî li ser pirsgirêkên wergerê sekinîn û nîqaş kirin û li pey çareseriyên geriyên.

Martin Luther dema ku Peymana Kevn û ya Nû ji yewnanî wergerande ser elmanî ya herêmî, wî hezar û sed sal piştî Hieronymus bi heman teknîkê ango bi awayê azad wergerand. Luther dibêje, divê li dayikeke li malê, zarokên li kûçeyan, mirovekî ji rêzê yê li sûkê bê pirsîn, li devê wan bê nihêrîn ka çawa dipeyîvin, li gor wê wergerê bê kirin; bi vî awayî ew ê têbigihêjin û bibînin ku tu bi wan re bi elmanî diaxivî (Munday, 2001, s. 22). Ji fikrên Luther û yên Cicero û Hieronymus tê fehm kirin ku hêj wan deman, bi awayekî ji rêzê be jî, nîqaş li ser terza wergerê çebûne ku gelo werger rasterast yan serbest bê kirin. Di salên 1980'an de Friedrich Schleiermacher, nakeve nav nîqaşên li ser "wergera rasterast an a serbest" û pirseke nehatî kirin dike û dibêje "Gelo meriv çawa hem nivîskarê zimanê jêder û hem xwendevanê zimanê armanc nêzîkî hev bike?" Ji bo vê meselê Schleiermacher du rêyan dide ber wergêr ku ev herdu rê jî ji binî ve ji hev cudane û dibêje ew ê yan nivîskar aciz neke û xwendevan ber bi bikişîne nivîskêr; yan jî wê xwendevan aciz neke û nivîskar ber bi xwendevan bikişîne. Armanc ew e ku heta ku pêkan be xwendevan û wergêr nêzî hev bin. Lê bi tu awayî wê bi temamî negihîjin hev. Schleiermacher, tercîha xwe ji bo vê yekê dike ku xwendevan ber bi nivîskar dibe (Hornby, 2006, s. 8).

Piştî sedsala bîstanê di bi teorî û metodên nû derketin holê û têgeha "wergernasî" yê derket holê û li ser teoriyên lînguîstîk bû ava bû. Di vê serdemê de werger wekî dîsîplîneke serbixwe hate binavkirin pêşveçûnên girîng tê de çêbûn, nêzîktêdayînên çandî bêtir di qada wergernasiyê de xuya bûn; ji ber van pêşveçûn û guherînan jî werger ji sedsala beriya xwê cudatir hate pênasekirin (Yıldırımçakar, 2016, s. 12).

1.1.1. Ji Destpêkê Heta Sedsala 20'î Pratîka Wergerê

1.1.1.1. Li Rojavayê Cîhanê Pêşketina Pratîka Wergerê

Her çiqas dîroka wergerê bi qasî dîroka mirovahiyê kevn be jî li gor dîroka nivîskî pratîka ewil beriya mîladê der û dora salên 3000'î hatine kirin. Li gor çavkaniyên nivîskî di wan salan de li Misirê wergêrên bi awayekî devkî werger kirine hebûne. Dîsa li gor xebatên arkeolojîk 4500 sal berî niha tabletên sumerîyan ku li ser peyvên bi zimanê sumerî-ebraîteyî hatine nivîsîn hene (Aksoy, 2002, s. 14). Peymaneke duzimanî ku di navbera Hîtîti û firewnên Misirî de hatiye destnîşankirin wekî wergera nivîskî ya ewil tê qebûl kirin (Göktaş, 2005, s. 53).

Wergerên nivîskî yê herî kevn ên Rojavayê yê Ahîda Kevn in. Wê demê desthilatdarê Misirê dibîne ku xelk êdî nikare Ahîda Kevn bi zimanê orijînal bixwîne, dixwaze wê wergerî grekî bike. Li Îskenderiyê bi 70 wergerî vî karî pêk tîne (Aydoğan, 2002, s. 117). Ew metin hemî ji îbranî ji bo yewnanî hatine wergerandin. Lê di dîroka wergerê de wergerên bi rêk û pêk, ewil di dema Romayîyan de çêbûne (Aksoy, 2002, s. 14). Di serdema Romayê de mirov dibîne ku ji yewnanî him metnên pîroz him jî metnên edebî ji bo latînî hatine wergerandin. Edebiyata Romayê di bin bandora edebiyata yewnanan de pêş ketiye. Romayîyan ziman û çanda yewnanîyan di ser edebiyata xwe re girtine û bi rêya wergerê, çand û zimanê yewnanan jê girtine. Bi vê yekê romayîyan gelek dewlemendiyên yewnanan naskirine û edebiyata xwe bi pêş xistine.

Bizava wergera romayîyan bi wergera Odessia'yê dest pê kiriye. Koleyê bi navê Livius Andronicus bi awayekî fermî ji bo vê wergerê hatiye peywirdarkirin. Piştî kesên wek Cicero, Horace, Quintilian giringiya wergerê ferq kirine û grîngî dane wergerê û li ser pirsgerêkên wergerê şîrove kirine û pê re serê xwe eşandine. Wê demê kesên karê wergerê kirine di heman demê de li ser pirsgerêkên wergerê jî nêrînên xwe anîne zimên (Tunalı, 2006, s. 4,5). Lê ji van kesan yê herî zêde bondor li dîroka wergerê kiriye bêguman Cicero ye (Yücel, 2016, s. 48). Nivîsên ku Cicero (B.Z. 106-43) û Horatius li ser wergerê nivîsîne, wek xebatên ewil yê teoriya wergerê tîne qebûl kirin (Bassnett, 2002, s. 50). Cicero li hember wergera 'peyv bi peyv' derdikeve û teoriya 'wergera azad' (freie Übersetzung) bi pêş dixê. Du armancên 'wergera azad' hene. Ya yekem wergêr divê ji metna jêder sîd wergire û

berê xwe bide îmkânê zimanê xwe û wan bi kar bîne. Ya duyem, divê metna jêder çawa bandorê li xwendevanê xwe dike divê metna armanc jî mîna wê bandorê li ser xwendevanê xwe bike (Kızıltan, 2000, s. 76-77). Ev nîqaş bi şêwe û têgehên cuda cuda di Serdema Navîn, Ronesans, Rewşenbîriyê û Romantîk de jî hatine nîqaşkirin û ev nîqaş heta roja îroyîn hatine. Her çiqas di Serdema Antîk de bingeha teoriya wergerê hatibe avêtin jî mirov nikare bêje teoriyeke total (sehî) derxistine holê. Romayîyan bi bizava wergerê nîrxên edebiyata yewnanan derbasî zimanê xwe kirine û ew kirine perçeyê edebiyata xwe. Bi vê yekê xwestine zimanê xwe yî paşvemayî û qaba, bînin asta zimanekî edebî û zimanê xwe dewlemend bikin. Di serê vê bizavê de dema wergera berhemên yewnanî hatiye kirin, wergêr ji hêla teşe û naverokê ve girêdayî zimanê jêder dimînin lê piştî demekê dixwazin ji hêla estetîk û teşe ve metneke bi ser metna yewnanî re biafirînin. Bi vê nêrînê wergêrên romayîyan xwe ne li hember metna jêder, xwe li hember xwendevanê armanc berpirsyar hîskirine. Lê ev nêrînên ku me heta niha anîn zimên tenê nêrînên ji bo wergera metnên edebî ne. Ji bo metnên zanistî û dokumentên fermî werger peyv bi peyv kirine (Tunalı, 2006, s. 18-19).

Wergera romayîyan demeke dirêj bi vî hawî devam kiriye ta ku ola îsevî derdikeve holê. Nêrînên nû piştî derketina ola îsevî derdikevin. Bi belavbûna ola îsevî, ji bo peyama Xwedê belav bibe hewcedarî bi wergerê hatiye dîtin û rola wergerê zêde bûye û karê wergêran him zêde û him jî giran bûye. Cara ewil Încîl ji hêla St. Jerome ve 384'an de hatiye wergerandin û St. Jerome li ser rêça Cicero çûye û xwestiye li gor wetayê wergerê bike. Lê di mijara wergera Încîlê de ji destpêkê nîqaşên hatine kirin ku ka gelo wergêr ê wateyê karibe bide an na û guherînên ku çêbin gelo wê gotinên Xwedê buguherînin (Aksoy, 2002, s. 15).

Hieronymus ku di warê wergerê de li ser rêça Cicero çûye û gotiye divê wateya metnê were wergerandin ji bo metnên pîroz xwedî nêrîneke berevajî ye. Dibêje ji ber ku metnên olî di xwe de sirrekî dihewînin, divê peyv bi peyv wergera wan çê be, çimkî wergêr nikare wateya rastîn ya metnên olî bide. Lê vê nêrînê bivênevê bandora xwe heya sedsala 20'î jî li ser wergera metnên edebî û yên din jî kiriye (Tunalı, 2006, s. 19).

Piştî geşedanên romayiyan heta Serdema Navîn ji hêla wergerê ve bêdengiyek heye. Di vê navberê de li Rojhilatê geşedanek heye. Li Bexdayê bi navê Beytul Hikme (Mala Zanistê) navendeke wergerê tê avakirin û li wir ji zimanên biyanî ji bo erebî werger tên kirin. Ev werger di dema Dewleta Endulusan de digihîjin Rojava û li Ewropayê belav dibin. Ewropî wan berheman werdigerînin zimanê xwe û dema dest bi avakirina zanîngehan dikin wan berheman li wir didin xwendin. Di sedsala 15'an de piştî ku Gutenberg çapê bipêş dixê ev berhem digihîjin girseyên mezin.¹

Di Serdema Navîn (476-1453) de xebatên Nicoles d'Oresme yê wergerê gelek girîng in. Bi pêşengiya wî gelek berhemên klasîk hatine wergerandin. Wergerên ku di sedsalên 14 û 15'an de hatine kirin pirahî ji bo pêşxistina zimên bûne. Di sedsala 15'an de bi taybetî nivîskarên gireko-latîn hatine keşîfkirin û berhemên wan hatine wergerandin (Göktaş, 2005). Leonardo Bruni(1370-1444) di vê serdemê de li ser teoriya 'wergera metnên edebî' serê xwe êşandiye û ev teorî bi pêş xistiye (Kızıltan, 2000). Wê demê nivîskar li ser xwezaya zimên hizirîne û xwestine nivîskarên berê fêhm bikin û şeweya wan û ferqa neybera wan şîrove bikin (Göktaş, 2005, s. 53). Dema John Wycliffe di navbera 1380-1384 'an de wergera Încîlê ya îngîlîzî dike, dixwaze wergereke ku herkes bikare fêmbike pêk bîne (Aksoy, 2002).

Di sedsala 16. de bi wergera Încîlê, Martîn Luther ji bo wergerê serdemeke nû dide destpêkirin. Încîl ji latînî û yewnanî ji bo gelek zimanên Ewropî hatine wergerandin û gelek metnên romayî û yewnanan jî hatine wergerandin. Di vê serdemê de werger vedigere karekî çandî û zîhnî û dema werger kirine carinan peyvin ji metnê derxistine carinan jî lê zêde kirine. Bi îcada matbaayê rewşa wergera Încîlê diguhere. William Tyndale dixwaze Doletê fransîz ê ku ji hêla Depre ve wek teorîsyenê ewil tê qebûlkirin, di 1540'î de peyva wergerê bi kar anîye, nêrînen xwe yê li ser rêbazên bingehîn ên wergera girêdayî eslê metnê derbasî ser nivîsê kirine û di xebata xwe ya bi navê "La maniere de bien traduire une langue en autre" de rêbazên wergera baş rêz kirine (Göktaş, 2005, s. 53).

Di sedsala 17'an de kesê herî zêde derdikeve pêş Martîn Opitz(1597-1639) e.Li gorî wî armanca wergerê pêşxistina zimanê dayikê ye. Di vê serdemê de zimanê

¹http://ceviribilim.com/?page_id=1496 (Dîrok: 10.03.2017)

elmanî bi saya wergeran ji hêla ziman û peyvnan ve pêş dikeve. Di sedsala 18'an de di Serdema Ronakbîriyê de zimanên herêmî bi pêş dikevin. Zimanên herêmî badoreke mezin li ser pêşketina gelan dikin. Êdî herkes dikare xwe bigihîne pirtûkan û bi rihetî dikare bixwîne û jê fêm bike. Ji ber vê yekê, werger zêdetir ji bo zimanên herêmî hatine kirin. Di sedsala 19'an de êdî her netewek dibe xwedan zimanekî pêşketî û wergerê ji bo zimanê xwe dike. Serdema Romantîk ji bo wergerê serdemeke gelekî sûdewar e. Hem zêde werger tên kirin û hem jî li ser wergerê zêde nîqaş tên kirin. Di vê serdemê de ji xeynî metnên edebî metnên zanistî jî tên wergerandin.

Dema meriv tê sedsala 20'an, bi pêşketina sanayiyê û avabûna saziyên navneteweyî hewcedariya wergerê zêdetir derketiye holê û li her qada jiyane belav dibe. Di vê sedsalê de bi taybetî xebatên teoriyê zêde dibin. Bi xebatên wergerê dixwazin metneke eynî metna jêder di zimanê armanc de biafirînin û berê xwe dane vê yekê (Göktaş, 2005, s. 56).

1.1.1.2. Li Rojhilatê Pêşketina Pratîka Wergerê

Di vekolînan de li Mezopotamiyayê tabletên aîdî beriya zayînê 4500'î bi nivîsa bizmarî bi sumerî û eblaiteyî hatine dîtin. Van lêkolînan daye xuyakirin ku paşeroja wergerê li Mezopotamiyayê gelekî kevn e (Aksoy, 2002, s. 14). Di wê demê de kesên serkarwan ku hevdiîtinên ji bo kar kirine hebûne û navê 'Diragomane' li wan kirine. Wan kesan bi du sê zimanan zanibûne û karê wergerê kirine. Dema meriv berê xwe dide salên 2000'î yê beriya zayînê meriv rastî ciyê bazirganî û pîrzimaniyê, Babilê tê. Li vir meriv rastî ferhengên bi sumerî û aqadî yê bi duzimanî tê. Tabletên bi hîttî û misirîya kevn ên salên 1200 B.Z. û kevrên Rosseta yê salên 200'î B.Z. di derheqê serdema xwe de gelek tiştan zelal dikin.²

Dema Îskenderê Mezin B.Z. 331'ê de diçe Misir, Şam û Îraqê û wan deran bi dest dixwe, ziman û çanda yewnanan jî bi xwe re dibe wan deran. B.Z. di sala 332'yan de piştî li Îskenderiyê Dibistana Îskenderiyê ava dibe, ew der dibe navenda zanyarî û çandê. Yewnanî li wir dibe zimanê çîna reveber û burokrasiyê, gel jî rojane zaravayên zimanê aramî bi kar tînin. Yek ji wan zaravayan jî zaravayê Ruhayê (Urfa) bû ku piştî demekê li herêmê belav dibe ku jê re zimanê suryanî dihat gotin. Pêşengên wergêrên suryanî li Dibistana Îskenderiyê hînî yewnanî dibûn. Navendeke

²http://ceviribilim.com/?page_id=1496 (Dîrok: 22.03.2017)

wergêrên suryanî jî Nisêbîn bû. Piştî di sala 336'an de Nisêbîn dikeve destê persan wergêr direvin Ruhayê û li wir xebatên xwe didomînin. Li vir ji xeynî metnên olî û dîrokî metnên li ser mantiqê jî ji yewnanî werdigerînin suryanîyî. Dîsa li Dibistana Gundîsabûrê ku îro ew der dikeve aliyê başûrê rojavayê Îranê, wergêrên suryanî xebatên xwe meşandine. Li wir gelek zana û hekîmên suryanî, hîndî, faris û cihû li wir xebat kirine û gelek wergerên farisî, yewnanî, hîndî û suryanîyî kirine. Ev navend di sedsala 7'an de piştî destpêka bizava wergera erebî di sedsalên 8-9'an de jî xebatên xwe didomînin (Suçin, 2012, s. 22-24).

Di sedsala 7'an de ereb û cihû jî dikevin nav hewldanên wergerê û ji zimanê sanskirîtî (hîndiya kevn), farisî, yewnanî gelek berhemên zanistî wergerandine erebî. Bi van wergeran xebatên zanistî li Îran û Erebiştanê zêde bûne. Di sala 830'î de li Bexdayê bi navê Beytul Hîkme navendeke wergerê hatiye avakirin. Li Beytul Hîkme gelek berhem ji yewnanî, farisî, hîndî û îbranî wergerandine ser erebî. Di sedsala 8'an de pistî ku Emeviyan, Îspanya bi dest xistin, ev şaristanî gihîşt Îspanyayê. Di sedsala 12'an de piştî ku îspanyolan bajarê Toledoyê bi dest xistin ev berhem, wergerandin latînî û zimanên herêmî û bi vî hawî ev zanist gihîşt Rojava jî.³

1.1.1.2.1. Di Dema Osmaniyan De Xebatên Wergerê

Piştî sedsala 12'an xebatên wergerê di nav mislimanan de kêr dibe û ev rewş heta sedsala 18'an dewam dike. Di vê navberê de di dema Fatih Siltan Mehmet û Kanûnî de li medreseyan dersên fen, tip û felsefeyê hatine dayîn û berhemên erebî û farisî hatine wergerandin û li medreseyan wek ders dane xwendin. Lê piştî demekê ev ders li medreseyan radibin û bi vî hawî ev xebat jî radiwestin. Di sedsala 16'an de dewletên wek Venedîk, Habsbûrg û Fransayê ku bi Osmaniyan re têkiliyên bazirganî danîne, ji bo wergerê dibistanên xwe ava kirine. Di sala 1754'an de li Viyanayê, Akademiya Zanista Rojhilatê avabûye. Fransa di sedsala 17'an de li Stenbolê, "Dil Oğlanları Okulu" vekirîye û ev dibistan heta sala 1831'ê didome. Li Fransayê di 1895'an de Akademiya Zimanên Rojhilatê yê Zindî ava dibe. Piştî sedsala 18'an Dewleta Osmanî berê xwe dide Rojavayê û ji bo pirsgerêkên xwe çareser bike dixwaze Rojavayê nas bike. Ji ber vê yekê, di gelek hêlan de gelek werger ji bo zimanê osmanî tên kirin. Di Dewra Laleyan de werger zêde dibe û di dibistanên

³http://ceviribilim.com/?page_id=1496 (Dîrok: 25.03.2018)

leşkerî de, mamosteyên macar û fransiz dixebitin. Van mamosteyan, perwerde bi rêya wergerê daye. Di sala 1821'ê de li Dewleta Osmanî 'Tercüme Odası'(Wargeha Wergerê) ava bûye û gelek kesên grîng li wir gihîştine. Heta sala 1871'ê berdewam kiriye. Piştî îlankirina Fermana Tanzîmatê (1839) xebatên reformê ku bi Mehmûdê II dest pê kiribû zêde dibe û di gelek warên zanistê de werger tînin kirin. Bi îlana Tanzîmatê ji Rojavayê berhemên cur bi cur ên wek çîrok, roman û şano tînin wergerandin.⁴

1.1.2. Pêşketina Teoriya Wergerê

1.1.2.1. Ji Destpêkê Heta Sedsala 20'î Pêşketina Teoriya Wergerê

Di Tewratê de behsa hebûna zimanên cuda cuda û girêdayî vê yekê behsa hewcedariya wergerê bi Çîroka Kela Babîlê hatiye kirin. Li gor vê çîrokê piştî Tofanê însan ji rê derketine û ji bo ku xwe bigihînin ezmanan biryara çêkirina qûleyekê dane û bi hev re dest bi avakirina qûleyê kirine. Xwedê jî ji ber vê însan ceza dike, zimanê wan tevlihev dike bi vî şiklî ew ji zimanê hev fêm nakin û wan li ser rûyê dinê belav dike. Bi domana demê re ziman û çandên cuda derdikevin. Ev behs di Tewratê de wiha hatiye zimên:

Pêşiyê hemî însanên li ser rûyê dinê bi heman zimanî dipeyivîn, heman gotin bi kar dianîn. Dema koç dikirin li herêma Şînarê deştek dîtin û li wir bi cî bûn. Ji hev re gotin "Werin em kerpîçan çêkin û wan bipêjin." Ji dêvla kêvir kerpîç, ji dêvla xercî zift bi kar anîn. Paşê gotin "Em ji xwe re bajarekî ava bikin. Em qûleyeke ku bigihêje ezmanan çêkin û nav bidin da ku em li ser rûyê dinê belav nebin."

Xweda ji bo ku bajêr û qûleya însanan bibîne daket xwarê. Got "Li gor ku ev heman zimanî diaxivin û bûne yek û vê yekê dikin, tu astengî li ber van nîn e, ev çî bixwazin dê wê bikin. Em biçin xwarê zimanê wan têkilhev bikin da ku ji hev fehm nekin." Bi vî hawî Xweda ew li ser rûyê dinê belav kirin û avakirina bajêr da sekinandin. Ji ber vê ji bajêr re Babîl hat gotin. Çimkî Xweda zimanê hemî însanan li wir têkilhev dike û wan li çar aliyê dinê belav dike (Kitabi Mukaddes-Eski ve Yeni Ahit, Bab 11, 2005).

⁴http://ceviribilim.com/?page_id=1496 (Dîrok: 25.03.2018)

Her çiqas efsane be jî, meriv dibîne ku meseleya cudahiya zimanan her tim ji însên re bûye mereq. Bi qasî cudahiya zimanan, naveroka zimanên din jî ji însanan re bûye mereq. Bi vê mebestê însanan berê dane wergerê.

Dema mirov berê xwe dide dîrokê mirov dibîne ku kesên ewil li ser wergerê fikirîne, serê xwe pê re êşandine û xwestine sazûmaniyekê pêk bînin Romayî ne. Kesên wek Cicero û Horatius ji bo ku zimanê xwe pêş bixin, ku ev di heman demê de armanca romayîyan a wergerê ye, ji yewnananî gelek berhem wergerandine. Ew kes li ser tarza wergerê sekinîne û li bersiva pirsê ‘Gelo divê werger ‘peyv bi peyv’ an li gor wateyê bê kirin?’ gerîne (Kızıltan, 2000, s. 77-78) û werger di çarçoveya wergera helbestê de nirxandine (Aksoy, 2002, s. 14). Li Rojavayê Cîhanê ewil werger bi wergera Încîlê dest pê dibe. Wergerên Încîlê ewil bi tirsê ku dê lefzê Xwedê biguhere an neguhere hatine kirin. Ji ber vê, bi endîşeya şeweyê çêbûne (Aksoy, 2002, s. 15). Ji ber vê yekê ev werger zêde nehatine fêmkirin. Piştî demekê wergerên Încîlê yê ku gel jî jê fêmkir, tên kirin. Pratîkên wergerê yê cuda cuda bûne sedem ku wergerên hatine kirin bînin nirxandin û şewaza wergerê bê diyarkirin.

Zimanê Têkûz (mukemel) î ku nîşaneyê çanda pêşketî ye ji Yewnana Antîk heya sedsala 16’an yewnanî, piştî latînî bû, piştî vê sedsalê ev rol ewil kete ser frensî û piştî îngîlîzî. Di dema Ronasansê de piştî ku her neteweyî di hemî qadên jiyandê de zimanê xwe yê dayikê bikaranîn, rola wergerê zêdetir bû. Bi taybetî wergera Încîlê ya ji bo zimanên cuda cuda, werger zêdetir derxist pêş. Di vê serdema me de bi taybetî pêşketina teknolojiyê û komînikasyonê têkiliya navbera însanan zêde kiriye û insan êdî hêsantir xwe digihînin her agahiyê. Bi vê neyê ev yek bi xwe re zêde zêde hewcedariya wergerê derdixe. Di salên dawî de hewldanên wergera otomatîk derketine, ji bo wergerê bername hatine amadekirin lê hêj ev cureyê wergerê pir serkeftî nîn e. Di nîveka sedsala 20’î de bi pêşketinên civakî werger bû beşeke zanistî û beşa ‘Zanista Wergerê / Wergernasî’ ava bû. Her çiqas ‘Zanista Wergerê / Wergernasî’ wek beşeke nû bê qebûlkirin jî vekolînan daye xuyakirin ku pişgirikên wergerê hêj di Serdema Antîk de hatine veçirandin (Kızıltan, 2000, s. 73).

Dema meriv berê xwe dide çavkaniyan meriv dibîne ku tenê werger nehatine kirin, insan li ser pêkhatina wergerê jî sekinîne. Dema werger kirine bi pişgîrêkan re

rû bi rû mane û ketine nav hewldanên çareseriyê û ev çareseriyên xwe anîne zimên û ew parastine û ketine nav hewldana şîrovekirina çareseriyên xwe.

Wergerên ewil ji ber kêmasiyên zimanê jêder û zimanê armanc ‘peyv bi peyv’ hatine kirin. Di vê wergerê de mantalîteyeke wergerê ya pêşketî nîn e. Ev werger zêde nehatine fêmkirin. Wergerên Încîlê yên ewil ji bo elmanî û îngîlîzî hatine kirin bi vî hawî hatine kirin. Kesên bi vî awayî werger kirine bi awayekî hişk girêdayî metna jêder mane. Metna jêder pîroz dîtine û heta xeletiyên nivîsê yên metna jêder jî bi wê xeletiyê wergerandine. Kesên wergera ‘peyv bi peyv’ê bikar anîne ferq nexistine navbera ‘gotin’ û ‘naverokê’. Piştî demekê kesên hakimî zimên û hunerên zimên derketine û ev herdu diyarde ji hev cuda kirine. Mijara metnê fêmkirine û ev metin bi hunerên zimên wergerandine. Ev yek ji bo her du zimanan jî hakîmiyetekê dixwaze. Wergêr encax bi vê hakîmiyetê dikare biryar bide ka naveroka ‘metna armanc’ û ‘metna jêder’ hevdu digire an nagire. Ev nêrîn demeke dirêj ji bo teoriya wergerê dibe bingeh. Li gor vê nêrînê metna biyanî / metna jêder, amûrek e ji bo pêşketina zimanê dayikê, werger jî riya gihiştina vê amûrê ye (Kızıltan, 2000, s. 74).

Ji hêla teoriya wergerê ve fikr û ramanên Cicero(B.Z. 106-43) wek nêrînên ewil ên teoriya wergerê tên qebûlkirin (Ece, 2007, s. 51). Cicero li hember wergera ‘peyv bi peyv’ derdikeve û teoriya ‘wergera azad’ (freie Übersetzung) bi pêş dixê. Li gor Cicero, wergêr afirandina berhemeke hunerî ya aidê xwe ji xwe re dike armanc. Ev berhem senteza ‘naverok’ û ‘gotin’ê ye. ‘mijar’ û ‘hewana (repertuar) fikrê’, ‘pêkanîn’, ‘afrînerî’ bêyî ku ji metna jêder dûrkeve tê wergerandin. Terza zimanê metna jêder li ber çav tê girtin û li gor derfetên zimanê armanc jî formê zimên tê sererastkirin. Cara yekem Ciceroferqa ‘gotin’ û ‘naverok’ê sistematîze dike. Ew berê wergêr dide metna armancî û dibêje dema wergera hunerên vegotinê û şeweyê tê kirin divê wergêr berê xwe bide zimanê armancî û ji nîmetên wî zimanî sûd wergire. Wî nêzîkatiya xwe ya wergerê wiha aniye zimên:

Ez hizir, teşe ango fîguran, bi awayê ku li kurmê (xûy xeyset) me bê werdigerînim zimanekî (Kızıltan, 2000, s. 76).

Ew bi awayekî tund li hember wergera mota mot derketiye û wî li hember vê yekê teoriya ‘wergera azad’ (freie Übersetzung-serbest çeviri) bi pêş xistiye ku du armancên ‘wergera azad’ hene. Ya yekem wergêr ê ji metna çavkanî sûd wergire û

berê xwe bide îmkânên zimanê xwe û wan bi kar bîne. Ya duyem, metna çavkanî çawa bandorê li xwendevanê xwe dike divê metna armancî jî mîna wê bandorê li ser xwendevanê xwe bike (Kızıltan, 2000, s. 77). Armanca wî ne ew e ku ji zimanê jêder dûrkeve ew dixwaze li gor hest û uslûba zimanê jêder taybetiyên metna jêder ên herî xurt derxe. Wî xwestiye wergêr ji nav sînoren peyvê ên teng xilas bike û uslûb û hêza derbirînê ya peyvê biparêze. Van nêrînên Cicero heta sedsala 20'an jî rê nîşanî wergêran daye.

Piştî Cicero kesên wek Quintilian, Hieronymus û Plinius fikra 'wergera azad' diparêzin û wê bi pêş dixin. Quintilian 'wergêr' û 'watedayîn'ê (paraphrase) ji hev vediqetîne. Li gor wî 'watedayîn' karê wan newêrekan e ku ew ji qalîteya metna jêder ditirsin. Ev tişt uslûba metnê duguherîne. Li gor wî hemî hêmanên uslûbê û mijar ji bo ku edebiyata herêmî dewlemend bike tên wergirtin. Ziman û derbirîna şêwazê jî li zimanê herêmî tê gurivandin. Êdî ji dêvla kopîkirinê di wergerê de reqabet derdikeve; divê armanc ne metneke di asta metna jêder de be, heta jê bê divê metna armanc ji metna jêder serkeftîtir be. Wergêr divê zimanê jêder ji xwe re wek amûrekê bi kar bîne û bi vegotinên nû zimanê dayîkê pêş bixe. Lê divê sînorekî wê jî hebe. Bi taybetî di nivê ewil ê sedsala 18'an de 'wergera azad' gelekî bandora xwe nîşan dide. Bi vê ferasetê gelên Ewropayê ketine nav hewldanên pêşxistina zimanê xwe.

Pliniusê Ciwan (P.Z. 61-113) pêşniyar dike ku wergêr ewil metna jêder perçe perçe bike û piştê ji van perçeyan metneke nû û resen biafirîne. Dijwariyên ku derkevin holê jî wê sûdewar bin û bi vî hawî wergera ji zimanê dayîkê ji bo zimanê biyanî jî wê hêsantir bike.

Hieronymusê ku 400 salî piştî Cicero wergera Încîlê ji bo latînî kiriye jî bi hişmendiya 'wergera azad' wergerên xwe kirine û li ser tarza xwe wiha gotiye:

Ji xeynî metnên pîroz- çimkî di wan de rêza peyvan bile bi serê xwe sirrek e- ji dêvla ku peyv bi peyv wergerînim ez wateyê neqil dikim (Kızıltan, 2000, s. 78).

Ew ji bo wergerê şêweyê metnê diyar dike û li ser fonksiyona metna jêder ya di çanda armanc de disekine. Ev tişt şêwaza wergerê diyar dikin. Hieronymus ji bo wergerê behsa du şêwazan dike:

1. Verbume verbo - peyv bi peyv

2. Sensum ezprimere de sensu - wergera wateyê

Wî ji bo wergera Încîlê şêwaza ‘peyv bi peyv’ê bi kar aniye. Ji bo metnên ne olî jî şêwaza ‘wergera wateyê’ bi kar aniye.

Leonardo Burunî (1370-1444) Teoriya Wergera Edebî bi pêş dixwe. Dixwaze zimanê hunerî yê Serdema Antîk ji nû ve keşif bike. Armanca wî ew e ku dixwaze hemî taybetmendiyên metna jêder - wateya peyvê, hunera peyvê, şêwaz - biparêze; Wergêr divê hakimî herdu zimanan be. Beriya ku werger bê kirin divê wergêr hemî berhemên nivîskar bixwîne û şirove bike. Şêwaz bi qasî naverokê girîng e. Humanîstên frensîz jî nêzî Burunî fikirîne. Lê wan hewl daye ku sedemên pîrsgirêkên ‘wergera sadîq’ diyar bikin. Nicolas von Wyle (1410-1478) ku bi wergerên xwe yê ku ji humanîstên îtalyayî kirine navdar e, şêwaza xwe ya wergerê bi gotina xwe ya ‘li dewsa her peyvê peyvek’ê tîne zimên. Wî xwestiye teybetiyên latînî biparêze û elmanî jî bişibîne latînî, wergerên xwe jî li gor vî esasî kirine. Heta şaşiyên nivîsê jî veguhezandiye (Kızıltan, 2000, s. 81). Etienne Doletê (1509-1546) ê frensî ku di dîroka teoriya wergerê de li ser wergergerê ewil wî teoriyek afirandiye (Aksoy, 2002, s. 16), dibêje divê wergêr hemî derfetên zimanê zikmakî bikar bîne, peyvên nû biafirîne û wan bi baldarî bikar bîne ku karibe metneke nêzî metna jêder biafirîne (Kızıltan, 2000, s. 82). Wî di nivîsa xwe ya bi navê ‘How to translate Well From One Language Into Another (Ji zimanekî ji bo zimanekî dîtir Wergera Baş Çawa Çêdibe)’ de ji bo wergêr pênc xalan pêşniyar dike:

1. Her çiqas wergêr di warê şirovekirina xalên nayên fêmkirin de azad be jî wateya ku nivîskêr qesta kiriye baş fêm bike.

2. Divê zimanê jêder û zimanê armanc baş bizanibe.

3. Divê peyv bi peyv wernegerîne.

4. Divê di wergera xwe de cî bide gotinên rojane.

5. Ji bo derba peyvê rast bê dayîn divê rê û rêbazekî ji bo hîlbijartina peyvên û rêzêkirina wan diyar bike (Aksoy, 2002, s. 16).

Li gor Pasquier û Peletier ên ku li ser teoriyên Dolet serê xwe dêşînin û teoriya wî bi pêş dixin, wergera berhemên divê dem demî ji nû ve bê kirin çimkî

werger ji ber ku di nav şertû mercên dema xwe de tîr kirin û li gor derfetên zimanê wê demê tê kirin hewceyî nûkirinê dibin. Wan xwestiye di gel cudahiya navbera zimanan bi wêrekî nêzî metna jêder bibin lê di ferqa wê yekê de jî bibin ku dê metna jêder û metna armanc bi tu awayî weke hev nebin (Kızıltan, 2000, s. 82).

Nêrînên Dolet ji hêla George Chapman ve jî tîr pêjirandin û di pêşgotina wergera Îlyadayê de (1598) ji bo kesên wergêr van pêşniyaran dike:

1. Divê peyv bi peyv wergerê nekin.

2. Xwe bigihînin asta ruhê metna jêder.

3. Wergereke qels nekin, beriya wergerê, bi awayekî ciddî vekolînin zanistî bikin (Aksoy, 2002, s. 16-17).

Di dema Ronasansê de gelek ziman êdî ji hêla burokrasî, dîplomasî, hiqûq, felsefe, huner û edebiyatê ve pêş dikevin û tîr xwe dikin. Ev yek jî rola wergerê zêde dike. Martin Lutherê (1483-1546) ku bi piranî ji hêla wergerê ve li ser rêça Hieronymus diçe, kêmasî û pirsgerêkên wî diyar dike û feraseta xwe ya wergerê jî wiha tîr zimên: “Piştî ku te mijara metnê fêm kir, peyv bi xwe rêz dibin.” Li gor Luther ji bo ku wergereke baş bê kirin, divê wergêr ruhê metnê hîs bike, zimanekî li gor rîtm û melodiya temamê metna jêder biafirîne (Radegundis, 2013, s. 25). Wergereke girêdayî peyvan metna armanc dijwar dike û xwendevan biyaniyê vê metnê ye. Çimkî ew metin ‘ne tarza axaftina wî’ ye (Kızıltan, 2000, s. 84). Dîsa di gotineke xwe ya din de Luther wiha dibêje:

Beriya ku mirov wergerê bike divê mirov ewil ji zarokên kuçeyê û kesên li bazaran bipirse li axaftina wan binêre û piştê wergerê bike (Radegundis, 2013, s. 25).

Piştî Luther demeke dirêj xebatên li ser pirsgerêkên wergerê stewriyek heye. Di sedsala 17. de hêdî hêdî dîsa li ser pirsgerêkên wergerê hin hewldan çê dibin (Kızıltan, 2000, s. 85). Piştî nîveka vê sedsalê wergera klasîkan zêde dibe û di wergera nabea îngîlîzî û frensî de jî hilberînek çêdibe. Ji bo wergera klasîkan her ku diçe ji dêvla şewaza teqlîdê feraseta wergereke ku him ruh, him jî şeweya berhemê pê re hebe belav dibe (Aksoy, 2002, s. 17). Wê demê John Dryden (1631-1700) di

gotara xwe ya bi navê “On Translation (Li ser Wergerê)” de wergerê bi sê awayan disînifîne:

1. Wergera peyv bi peyv
2. Wergera Wateyê
3. Wergera Teqlîdî

Li gor Dryden terza ‘wergera azad’ terza herî rast e (Aksoy, 2002, s. 17-18). Li gor wî di wergerê de tiştê girîng ew e ku asta nivîskar û wergêr a afrîneriyê wek hev be û wergêr divê kesayeta nivîskar bide der, ji vê kesayetê qest; taybetiyên nivîskariyê, şêwaz û amûrên şêwazê û afrînerî ye. Dryden bi kurtasî feraseta xwe ya wergerê wiha tîne zimên:

Ziman cila wateyê ye, ev cil divê bi tu awayî kirêt nesekine, fireh an jî teng nesekine divê bi her awayî lê were (Kızıltan, 2001).

Feraseta wergerê ya sedsala 18. ji ya Dryden zêde jî cudatir nîn e. Di vê serdemê de werger, li ser ecibandinê xwe ava dike. Bi vî hawî di wergerê de girîngiya afrîneriyê derdikeve û wergêr dikeve nav hewldana afirandina şêwe û awayên ku bên ecibandin. Alexandre Pope (1688-1744) ê ku wê demê bi wergera Îlyadayê ya ji bo îngîlîzî navdar e, dibêje ji ber ku armanca nivîskêr ew e ku xwe bide xwendin divê wergêr jî karibe bi wergera xwe wî nivîskarî bide xwendin.

Ber bi dawiya sedsala 18. Aleksander Tytler di berhema xwe ya bi navê ‘The Principle of Translation (Rêgezên Wergerê)’ de van rêbazan diyar dike:

1. Divê werger, fikra metna jêder wekî ya metna orîjînal bide.
2. Hêjayî û şêwaza wergerê divê wek metna jêder be.
3. Divê herikbarî û fesîhbûna wergerê û ya metna orîjînal eynî be (Tytler, 1907).

Christian Wolff (1679-1754) fikra zimanê gerdûnê tîne zimên. Li gor wî ‘Dijwariya wergerê ji ber cudahiya rêza peyvan e ne ji ber cudahiya peyvan e. Rista fikirînê û rista peyvan dema ku li hev were pîrsgirêk ji holê radibe. Johan Christoph Gottsched (1700-1766) jî bo wergêr 5 qûralan datîne:

1. Hakîmiyeta zimên

2. Ne peyv bi peyv, li gor wateyê
3. Metna armanc li zimanê armanc xerîb neyê û ciyê xwe bigire.
4. Heta ku jê were divê hunerên peyvan bên parastin.
5. Perçekirin û guhertin bi tenê di hevokên dijwar de bê kirin.

Georg Venzky (1704-1757) wergerê wek amûra fêmkirina metna jêder dinirxîne. Heke werger baş hatibe kirin dikare bikeve şûna metna jêder jî. Heke îcab bike ji bo fêmkirinê mirov dikare nezmê bi teşeyê nesrê jî wergerîne. Venzky wergerê bi 5 awayan disinifîne:

1. Wergera Xwezayî
2. Wergera Azad
3. Wergera berfirehkirî û kêmkirî
4. Wergera bêqusûr ku bi jêrenotan hatiye kirin

Dîsa li ser wergerê jî hin xalên girîng diyar kirine:

1. Peyvên metna jêder bê şîrove û bi awayekî zelal bên dayîn
2. Hatina cem hev a peyv û biwêjan divê li hev bê
3. Werger divê zelal be û bê fêmkirin

4. Divê zimanê wergerê xwerû be. Yanî divê modeya wê derbas nebe, çêker nebe û herêmkî nebe.

5. Cihên neyên fêmkirin divê bi jêrenotan bê ravekirin (Kızıltan, 2001, s. 44).

Johann Jacob Breitinger (1701-1776) li teoriya Gottsched 'lihevhatina teşeyê zêde dike û dibêje 'Werger çiqasî nêzî metna jêder be ewqas hêja ye ji ber vê divê wergêr ji hêla teşe, fikir û naverokê ve ji metna jêder dûr nekeve. Divê ev hêman neguherin tenê îşaret (peyv) buguherin. Novalis (1772-1801) tu ferqê naxe navbera berhem û wergera wê heta li gor wî werger zêdetir bi nirx e. Kesê ku wergera metna edebî dike wergêrê wergêra e. Çimkî dikare hem fikrên xwe û hem jî yên nivîskar bi hev re di metna armanc de bîne zimên. Xwegihandina bêqusûriyê heta hatayê wê pêk neyê û wê her tim di navbera metna jêder û wergera wê de ferqê hebe. Novalis wergerê bi sê awayan dinirxîne:

1. Wergera Mîfîk: Ev cure werger ji ber ku ne metna jêder, awayê wê yî îdeal dide nîşandan vê wergerê wekî asta herî bilind ya wergerê dinirxîne. Novalîs dibêje di kesekî de dema ku ruhekî şairane û ruhekî felsefî li hev hat wê demê digihîje asta Wergera Mîfîk.

2. Wergera Rêzimanî: Ji bo vê wergerê hunereke analîtîk û mantiqekî zanistî divê û divê wergêr ji hêla zanînê ve têr û tije be.

3. Wergera Guhrîner: Wergêrê vê wergerê bike divê hunermend be û wateya giştî ya nav metnê li ku derê çawa hewce bike divê wisa bidê.

Novalîs nêrînê xwe yên li ser vî cureyê wergerê jî wiha tîne zimên “Heke min ruhê nivîskar fêhm kiribe, şêwaza nivîskar xera nekiribe û di gelek ciyan de karibim guhertinan çêbikim nexwe min nivîskar nas kiriye.”

August Wilhelm Schlegel zêdetir li ser wergerên Shakspeare ên ji bo Elmanî hatine kirin sekiniye û bingeha teoriya xwe jî ji van wergeran girtiye. Schlegel taybetmendiyên wergêr wiha diyar dike:

1. Divê hîsiyata têgihîştina metna jêder bi wergêr re hebe. Wergera sadiq encax bi hawî pêkan e.

2. Wergêr divê hakimî her du zimanan be û têr û tije be, ev têr û tije bûn ji toeriyê zêdetir ji pratîkê were.

3. Divê wergêr zimên ji nav jiyane hîn be, yan na ne pêkane hewa û tiniya zimên wergerîne (Kızıltan, 2001, s. 59).

Teoriya wergerê bi Breitinger, Herder û Romantîkan gihîştîye bingeheke fîlolojîk. Li seranserê sedsala 19. nêrînên li ser wergerê di çarçoveyêke fîlolojîk de hatine nirxandin. Heta sedsala 20 tenê wergera pirtûkên pîroz û berhemên hunerî wek karekî ciddî dihatin dîtin ji ber vê yekê zêde cî nedidane şîroveyên teorîk lê Schleiermacher sînoren wergerê fireh dike û di bin sernavê ‘neqil’ê de dabeş dike.

Beriya Friedrich Schleiermacher (1768-1834) di metnên pîroz de ji ber sirra rêza peyvan wergera peyv bi peyv hatiye kirin, di metnên edebî de jî li hember nivîskar sedeqeteke îdeal çêbûye û teorî di vê çarçoveyê de bi pêş ketine. Schleiermacher di 24’ê Hezîrana 1813’an de di Akademiya Qiraliyetê ya Berlînê de di gotara xwe de, rêbazên ji bo çareseriyê pirsgerêkên ku di proseya wergerandina

Platon de pê re rû bi rû dimîne, parve dike. Di gotarê de dibêje ku werger pêvajoya têgihîştin û neqilkirinê ye û ev pêvajoya neqlê tenê di navbera du zimanên cuda de nabe, di navbera devokan de û ji bo metnên kevn yên eynî zimanî jî pêkan e.

Ew neqla navbera du zimanan li gor cureyê metnê dike du beş:

1. Wegera metnên ne edebî (Dîlmaçî): Wegereke mekanîk û hêsane çimkî wateya her peyvê şênber e û yek wateya wê heye.

2. Wegera metnên edebî (Wergêrî): Afrîneriyekê dixwaze û wergereke dijwar e divê wergêr bi vê zehmetiyê bihise û li gor wê wergerê bike û divê ruhê metna jêder di metna armanc de nîşan bide. Schleiermacher dibêje girseya armanc a karê wergerê kesên wêjehez û xwende ne. Ji ber vê di wergerê de ji nû ve afirandinê an jî Elmanîkirinê red dike. Divê metna armanc wek metneke herêmî neyê xwendin. Berevajî vê, zimanê metna jêder heta ku mirov karibe divê biparêze. Divê ne zimanê axaftinê û ji rêzê ;divê zimanekî bişibe zimanê jêder û bişibe zimanekî biyanî ango ‘şêwaza biyanîkirinê’ bê bikaranîn (Kızıltan, 2001, s. 60,61).

Li gor Wilhelm von Humboldt (1767-1835) zimanê her netewî şiklê ruhê wî ye şênber e. Ruhê wî zimanê wî ye, zimanê wî jî ruhê wî ye. Ji bo hînbûna zimanekî divê mirov di nav çanda wî zimanî de mezin be û feraseta wî zimanî bigire û ruhê wî di xwe de bihewîne. Lê dîsa jî her çiqas wergêr bi vî hawî gihîştibe jî, wergereke têkûz wê nebe û ev pirsgirêk ê her dewam bike ango ‘nepêkniya wergerê’ wê hebe. Li gor wî qesta metna jêder wê her tim di nava metna jêder de bimîne. Divê metna armanc ‘biyanîbûna xwe’ bide xuyakirin. Ulrich von Wilamowitz (1848-1931) dibêje divê wergêr li pey tîpan nekeve û armanca wî ne wergerandina peyv û hevokan be, divê hestê metnê têbigihêje û wan neqil bike. Ulrich wiha dibêje ya rast ew e ku divê herfan bidin aliyekî li pey ruh bikevin, ne ku peyv û hevokan wergerînin, hestê fêhm bikin û wê neqil bikin. Divê cil bê guhertin, yê navê bimîne. Wegera serkeftî ya şikil guhertî ye. Bi awayekî zelaltir ‘ruh dimîne lê beden duguhere, wegera rast şikil diguhere (Kızıltan, 2001, s. 64).

1.1.2.2. Xebatên Teoriya Wergerê li Rojhilatê

Wekî ku me berê jî behs kir di dîroka ereban de ji hêla wêje û wergerê ve dema herî navdar dema xelîfetiya Emevî û Ebasiyan e. Di dema Emeviyan de xebatên wergerê bi neviyê Muaviye Xalid bîn Yezîd bi taybetî bi wergerên berhemên

tibê dest pê dikin û pêş dikevin. Di dema Ebasiyan de xebatên wergerê di du serdeman de herî zêde pêş dikevin. Serdema ewil dema xelîfe Mensûr e ku wê çaxê berhemên felsefe, astronomî, tip, matematîk, ziman û edebiyatê hatine wergerandin û xelîfe Mensûr wan berhemên di pirtûkxaneyên bi navê Xezînetul Hîkme de dide berhevkerin. Serdema duyan dema xelîfe Memûn e ku wê demê bi navê Beytul Hîkme (Mala Zanistê) warê zanistê tê avakirin (Kaya, 1992, s. 89). Li Beytul Hîkmeyê gelek berhem ji yewnanî, farisî, hîndî û îbranî wergerandine erebî. Di sedsala 8'an de pistî ku Emeviyan, Îspanya bi dest xistin ev şaristanî gihîşt Îspanyayê. Di sedsala 12'an de piştî ku Îspanyolan bajarê Toledo bi dest xistin ev berhem wergerandin latînî û zimanên herêmî û bi vî hawî ev zanist gihîşt rojhilatê jî.

⁵Mirov dikare bi rihetî bêje ku di wê serdemê de sedema pêşketina wergerê Quran bû ku bi saya Quranê zimanê erebî bû zimanê nivîskî lê helbet tenê sedem ne ev bû rola mozayîka erdnîgariya îslamê jî zêde bû. Li vê erdnîgariyê him gelek zimanên cuda dihatin axaftin û him jî bazirganiyeke xurt li wir dihat kirin ku vê jî rê li ber têkiyên cur bi cur ve dikir. Vê yekê bandoreke zêde li ser danûstanên zimên dikir. Bi derketin û pêşketina îslamiyetê, ji ber ku li ser vê erdnîgariyê hem çanda yewnanan a Rojavayê, hem jî çanda fars, hînd, suryanî û misirê ya Rojhilatê dijiya, erebî bû zimanê danûstandinê û zimanê hevpar yê wan netewan (Demircioğlu, 2013, s. 745).

Dema mirov di vê çarçoveyê de lê dinêre meriv dibîne ku aliyê teorîk a wergera ereban wekî senteza çanda wergera yewnan, fars û hîndan derdikeve pêşberî me. Bi vî hawî li nav şaristaniya îslamê, heke meriv behsa Teoriya Wergera Rojhilatê bike, divê meriv cudahiyên teorîk an jî nivteorîk û bi taybetî cudahî û nakokiyên ku derketine, di çarçoveya çerxa têkiliyên yewnan, ereb, fars, hînd, suryan, misirê de binirxîne. Dîsa bi taybetî bi firehbûna sînorên Romayê warên çand û zanistê yên wekî Îskenderiye, Herran, Antaqya û Nisêbînê, bûn wargehên zanyarên ku ji Rojavayê koçkirî. Bê guman ev yek îhtîmala ku bandora wan a li ser wergêrên ji bo erebî û suryanî werger dikirin xurt dike û dîsa îhtîmala ku ev wergêr ji pîrsgirêkên wergerê û binavkirina pêrsgirêkên wergerê yên rojavayê haydar bin jî xurt dike. Divê bi eynî şêweyî bandora fars û hîndan neyê jibîrkin.

⁵http://ceviribilim.com/?page_id=1496 (Dîrok: 28.03.2018)

Li rojhilatê di mijara teoriya wergerê de di sed sala 9'an de navê Ebu Osman Amr bîn Bahr el-Cahiz derdikeve pêş. Cahiz ji felsefeyê heta zanistên xwezayê di gelek waran de berhem dane. Fikr û ramanên xwe yên li ser wergerê di berhema xwe ya li ser zoolojîyê ya bi navê Kîtabul Hayewan de anîne zimên. Li gor Mehmet Hakkı Suçîn, Cahiz ji wan du kesan e ku di çanda wergera ereban de wergêrî nekirine lê fikr û ramanên xwe li ser wergerê anîne zimên. Cahiz di Kîtabul Hayewanê de fikrên xwe zêdetir di cildê yekê de di bin serenivîsên “Dijwariyên wergera erebî”, “Qiymeta wergerê”, “Şertên wergêriyê” û “wergera pirtûkên olî” de pêşkêş dike. Li gor Cahiz wergêr divê zimanê jêder û zimanê armanc biqasî hev bizanibe û divê gotinên ku werdigerin biqasî yên berhema jêder zelal bin û bîrên fêmkirin. Dîsa divê wergêr biqasî nivîskarê metna jêder di mijara metna jêder de xwedî zanebûn be. Cahiz pirsgirêkên wergerê li gor çavdêriyên xwe yên li ser pratîkên wergerê nixandî kirine û li gor wî wergera helbest û metnên olî ya bi awayê menzûmê ne pêkan e. Ango li gor wî wergera helbestê ne pêkane. Estetîka metna jêder û ahenga helbestî û çûşa helbestê bi wergerê wenda dibe û ew yek nayê dayîn. Wezin û qalibê helbestê bi wergerê xera dibin (Sarıkaya, 2013, s. 141). Cahiz ji bo wergera metnên olî jî dibêje ji ber ku ew metnên metnên îlahî ne divê mirov bi şik nêzî wan wergeran be. Ji bo wergêrê metnên olî jî wesfan tîne zimên û dibêje heke wergêrê van metnan eqîdeya tewhîdê bizanibe tenê wê demê mirov dikare wî wek zana qebûl bike û bêje ew kes dikare wateya rastîn ya metna jêder (metna olî) tê bigihêje. Wekî din dîsa Cahiz ji bo wesfên wergêr dibêje ku wergêr divê ji edet û toreyên dema nivîsîna metnê haydar be û derheqê têkilî û danûstandinên wê demê de xwedî agahî be. Di wergerê de hem teşe û hem jî mehneyê girîng dibîne û ji bo wergêr jî zanebûneke xurt ferz dike.

Yek ji teorisyenê wê demê jî Huneyn bîn Îshaq e. Huneyn di heman demê de wergêrî jî kiriye. Di sed sala 9'an de ji bo wergerên tib û felsefeyê yên ji yewnanî ji bo erebî hatine kirin kedeke mezin daye. Bi wergerên xwe yên tibê, hem termînolojiya tibê ya erebî pêşxistiye û hem jî tîba yewnanan li erdnîgariya hukmê erebî lê heyî daye nasandin (Katipoğlu & Kutluer, 1998). Li gor Huneyn di navbera qalîteya weger û temen û tecrubeya wergêr de têkiliyek heye. Ji bo wî hakimiyeta wergêr a li ser mijara metnê girîng e lê biqasî wê tecrubeya wergêr jî girîng e. Serkeftina wergerê bi berawirdkirina metna jêder û metna armanc nixandiye. Li gor

agahiyên Cemal Demircioğlu ji Bekir Karlığa radigihîne Huneyn di wergerê de tenê neketiye pey ku ji peyvan re wateyekê bibîne, zêdetir bala xwe daye ser wergerandina wateya hevokê (Demircioğlu, 2013, s. 750). Heta wergêrên sedsala 6. yên ku berhemên Arîsto û Galen wergerandine ser suryanî, ji ber ku zêde sadiqî metna jêder mane û metin fêhm nekirine rexne kirine. Huneyn di rexneyên xwe de têgehên wek “wergerên xerab”, “wergerên fena”, “wergerên ne hêjayî pesnê”, “wergerên pir xerab” û “wergerên nayên fêmkirin” bi kar anîne (Tanrıverdi, 2007, s. 105).

Dema mirov tê sedsala 14. di vê serdemê de navê Ebu Safa Salahuddîn Xelîl bîn Aybek Ebdullah es-Safedî derdikeve pêş. Safedî behsa du şêwazên veguhezîne dike. Şêwaza yekem a peyv bi peyv e ku di Beytul Hikmeyê de hin berhemên yewnanî ji bo erebî hatine wergerandin, bi vê şêwazê wergerîne. Safedî ev şêwaz ji du hêlan ve seqet dîtiye. A yekem li hember her peyva yewnanî peyveke erebî nayê dîtî ji ber vê di metna armanc de cî dane gelek peyvên yewnanî. Ya duyem bi vê şêwazê mecazên zimanê jêder di zimanê armanc de baş nayê dayîn. Wergerên Huneyn jî nirxandine û gotiye wergerên wî yên tib, mantiq, xweza û olî hewceyî sererastkirinê nakin lê ji ber ku matematîk nizanibûye ev wergerên wî hewceyî sererastkirinê ne (Demircioğlu, 2013, s. 746).

Wergêrekî din ê ku bi nêrînên xwe yên li ser wergerê tê nasîn Ebdulqahir el-Curcanî ye. Li gor wî di jwariya wergera di navbera du zimanên cuda li aliyekî, di zimanekî de ne pêkane ku mirov nesîr an jî menzûmekê bi şêwaz û têgehên cuda ji sedî sed îfade bike. Ew qebûl dike ku hemwateyên peyvan hene lê hemwateya metneke ku ji gotinên qalibî pêkhatî red dike (Sarıkaya, 2013, s. 17). Ji ber ku fikrên kesên beriya Curcanî yên wek Cahiz û Sîrafî nehatin nirxandin kesên li pey wan hatin ew jî li hember fikr û ramanên wan derneketin û bi feraseta “dijwarbûna wergerê” gihêştin. Bi vê ferasetê hemçaxên Curcanî jî li hember Curcanî derneketin. Lê Curcanî ne di wê baweriyê de bû ku werger ne pêkan e û divê mirov dest jê berde. Li gorî wî ji dêvla vê divê teorî bîn avakirin (Sarıkaya, 2013, s. 14).

1.2. DI SEDSALA 20'Î DE PÊŞKETINA WERGERÊ

Di navbera salên 1900-1930'an de nêrînên li ser wergerê yên grîng ji nava alema nivîs û fikir û hermenîtika germenan derketine. Li gor wê demê ziman ne wek têgeheke ragihandinê, wekî esasê tesewira fikr û rastiyê ye. Di vê çarçoveyê de werger, wekî vegotin an jî şîroveya ku ji nû ve tê avakirin û ji bo zimanekî biyanî tê vediguhistin hatiye nirxandin. Li gor zanayên wê demê Schleiermacher û Bolt, werger qabîliyeta afrîneriyê ye ku bi xêra serê rê û rêbazên wê û fonksiyonên wê yên çandî û civakî rê li ber avabûna netewan û wêje û zimanan vedibe (Venuti, 2008, s. 87).

Di destpêka sedsala bîstemîn de ev fikir bi feraseta tevgera modernîst dîsa hatin nirxandin. Tiştê girîng a ku modernîzmê nîqaş dikir ew bû ku otonomiya wergerê, li gor rastiyên wergerê statuya wergerê, beşeke girêdayî xebatên wateyî lê wek beşeke serbixwe werger. Walter Benjamîn di gotara xwe ya 1923'an "The task of the Translator"ê de îda dike ku divê armanca wergerê ne ew be ku qesta metna orîjînal bi xwendevên bide fêmkirin an jî agahiyên nav metnê bi xwendevên bide zanîn. Ev tişt nîşaneyên wergerên ne baş in. Belê, werger ji orîjînalê cuda ye lê bi wê ve girêdayî ye jî û li pey bi destxistina wê orîjînalîyê ye. Dîsa teorîstekê wê demê yê nêzî xeta germenan Ezra Pound, ji bo xweseriya wergerê dibêje ku metneke wergeriyayî pêkane ku wek şîrove be, wek helbesta biyanî bê nivîsandin û ji taybetiyên lînguîstîk pêk bê (Ghanooni, 2012, s. 75).

Di dawîya salên 1930'î werger bi norm û armancên xwe yên xweser êdî wek beşeke cuda ya lînguîstîkê û wek cureyekî nivîsê yî cuda tê dîtin. Jose Ortega y Gasset di nivîsa xwe ya bi navê "The Misery and the Splendor of Translation"ê de li ser girîngiya çanda wergerê ya Germenan radiweste. Bi peyva 'Misery' qesta Ortega nepêkaniya karê wergera navbera du zimanan e, çimkî di navbera zimanan de tenê cudahiyên lînguîstîk tune ne, di heman demê de cudahiyên çandî û hişî jî hene. Bi peyva "splendour" jî qesta wî serkeftina li hember cudahiyên zimanan e. Bi vî hawî xwendevanê wergerê ji qalibên wî/wê yên lînguîstîk derdikeve û dikeve nav qalibên lînguîstîk yên nivîskarê biyanî (Ghanooni, 2012, s. 78).

Teoriyên wergerê yên ku di salên 1950-60'an de derketin bingeha xwe ji lînguîstîkê digirtin, yanê wergêr bêtir li ser pratîka wergerê disekînin ku çawa dikare

peyvay, biwêjan, hevokan hwd. di zimanekî din de bîne zimên. Jean Paul Vinay û Jean Darbelnet di pirtûka xwe ya Stylistique comparée du français et du l'anglais de li ser cudahiyan di navbera wergera frensî û îngîlîzî de fikrên anîn zimên. Her çiqas fikrên wan li ser wergera îngîlîzî û frensî bûn jî tesîra fikrên wan ji wê mezintir bû û ew nêrînên ku wan pêşkêş kirin di wergerê de bi salan hatin bikaranîn û hê jî tîb bikaranîn. Vinay û Darbelnet du stratejiyan bi navê wergera dîrekt û wergera oblîk pêşkêş dike ku meriv dikare wergera dîrekt wekî wergera rasterast ya din jî wekî wergera azad bibîne. Ev herdu stratejî jî heft metotan dihewîne: Deynkirin/qerckirin (borrowing), teqlîd (calque), wergera rasterast (literal), transpozîsyon, modulasyon, hemtayîtî û adaptasyon (Yıldırımçakar, 2016, s. 20).

Xebatên din ku li ser wergernasiyê, wê demê derketin pêş jî yê Eugene Nida bûn ku gramera generatif “generative transformational grammar” ya Chomsky wekî bingeha xebatên xwe bikar anî û nêrînên xwe di pirtûka xwe ya bi navê “Toward a Science of Translating” berhev kiriye (Aksoy, 2002, s. 22). Herwiha Nîda yekem kes e ku peyva zanistê (science) ji bo wergerê bikar aniye (Yıldırımçakar, 2016, s. 20). Wî têgeha “dynamic equivalence” afirand û li gor vê ,werger wek ‘berhemberiya herî nêzî eslê’ bi nav kir (Aksoy, 2002). Peyva Almanî “Übersetzungswissenschaft” jî dîsa wê demê derket û ji bo wergernasiyê hat bikaranîn. Heta 1970’î nîqaş li ser nav, danasîn û teorîyan wergerê bûn ku bingeha wan lengûîstîk bû. Piştî vê maweyê êdî ev zanist hêdî hêdî dibe zanistekê serbixwe û bendên xwe yê bi zimanzaniyê ve jî sist dike bêyî ku lap jê biqete (Yıldırımçakar, 2016, s. 20).

Piştî salên 1970’î komek zanyarên ciwan ên ku li hember nêrînên hişk ên li ser wergerê derdiketin, bi pêşengiya James Holmes xwestin nêrînên objektîf û nû bi pêş bixin. Holmesê di xebata xwe ya bi navê “The Name and Nature of Translation Studies / Nav û Xwezaya Wergernasiyê” de cara ewil têgeha “translation studies” “lêkolînên wergerê / wergernasi” di sala 1972’an de bi kar anî. Holmes navê wergernasiyê (translation studies) li vê zanistê kir ku niha jî ev zanist bi vî navî di cîhanê de tê naskirin. Wî bi vê xebatê çarçoveya wergernasiyê diyar kir ku ka çi dikeve nav vê pênaseyê. Jixwe piştî wî jî çarçoveya wergernasiyê hêj berfirehtir bû û wergeriya awayekî înterdîsîplîner. James Holmes nexşeyek çêkir û diyar kir ka wergernasî di nav xwe de çi dihewîne. Wê demê nîqaş li ser bikaranîna nav jî derket ka ji bo wergernasiyê kîjan navî bikar bînin. Di îngîlîzî de peyva “translatology”

derket pêş; li hember vê di zimanên din de, di fransî de “translatologie” û di îspanyolî de “traductologie” derketin. Peyva translatology ya îngîlîzî guherî bû “translation studies” piştî demekî. Hindî dem derbas bû ev rastiya derket ku wekî di gelek qadên din de îngîlîzî çawa zora zimanan dibe, “bi peyva translation studies” jî dîsa zora zimanên din dibe û bêtir tê bikaranîn di mijarên wergerê de û ji bo wergerê (Yıldırımçakar, 2016).

Di salên 1980’î de Translation Studies/Wergernasî ya Susan Bassnett hat weşandin. Di pirtûka wê de binbeşên cuda yên lêkolînên wergerê hatin kom kirin; bi lînguîstîk, rexnegeriya wêjeyê û felsefeyê wergerê wek beşeke cuda ji nû ve jîn da. Di heman demê de pirsgerêkên danûstandinên cross-cultural bal kişandin û ketin rojevê. Bassnett ji nêrînên dîrokî sûd werdigirt û wê ji stratejiyên pratîk ên têkildarî rewşên spesîfîk ên çandî û civakî fêhm kiribû. Lê tişta ku herî zêde Bassnett li ser disekinî xweseriya nisbî ya metna wergeryayî bû (Venuti, 2004, s. 221).

Di van salan de werger wek formeke nivîsê ya serbixwe, ji metna jêder cuda dihat dîtin û ev metin bi awayekî resen di zimanê armanc de dihatin nivîsîn. Meseleya hemtayıtiyê ya ku di deh salên berî de gelekî navdar bû, êdî hukmê wê nema bû. William Frawly konseptê hemtayıtiyê red kir û got werger formeke danûstandinê ye, ferq tenê hebûna agahiyan e, ji ber vê li gor rastiyên xwe û bi qaîde û standardên xwe werger, qodek e her çiqas ew pêkhatiyên zanyariyên bingehîn û pîvanên hedefê bin jî. Di Salên 1990’î de yekbûna ekol û konseptên nû ku bingeha xwe ji xebatên Kanadayî yên li ser werger û zayendê û teoriyên wergerê yên postkolonîal digirin, bi şexsiyetê navdar ê wek Spivak; û li Amerîkayê Lawrence Venuti bi analîzên xwe yên li ser xebatên çandî derdikevin pêş (Munday, 2001, s. 14).

Di deh salên dawî yên sedsala bîstana de bi xêra serê belavbûna weşanên zanistî û bernameyên perwerdekirina wergêran a li çar aliyê dinê, wergernasî wek dîsîplîneke bi temamî cuda xwe bi xwe ava bû. Pirtûkeke dersê jî ku ji bo xwendekaran metodolojiyên/rê û rêbazên lêkolînê pêşkêş dikir derket (Venuti, The Translation Studies Reader, 2004, s. 326). Di vî deh salî de lêkolînên wergerê bi têklikeviya teoriyan û bi metodolojiyên deh salên berî domiya û trendên ku dîsîplînên wek polîsîstem, skopos û poststructuralism û pêşketinên lînguîstîk, edebî û

teoriyên çandî (postkolonyalizm, zayendîtî, globalizasyon) hatin şopandin (Venuti, 2004, s. 325).



BEŞA DUYAN

2. DI KURDOLOJIYÊ DE PÊŞKETINA PRATÎKA WERGERÊ

2.1. Ji Destpêkê Heta Sedsala 20'î Wergera Kurdî

Kadri Yıldırım, destpêka wergera kurdî heta sedsala nehemîn a piştî zayîne dibe. Li gor agahiyên ku Kadri Yıldırım dide, zanayê keldanî Îbnî Wehşîye li goristana xiristiyanan a li Bexdayê, du pirtûkên kurdî ku bi alfabeya Masî Sûratî dîbîne û ji van yekê werdigerîne erebî (Yıldırım, 2013, s. 28).

Li gor ku Ferhad Pîrbal radigihîne, agahiyên li ser wergera kurdî cara ewil em ji pirtûka filozofê yewnanî Xenophon a bi navê Anabasis, hîn dibin. Dema Xenophon kardoxan ziyaret dike ji leşkerên yewnanî daxwaz dike ku bi alîkariya wergêrekî bi wan re biaxive. Wergêrek tê dîtin û bi kardoxan re diaxive. Kardoxî ji Xenophon daxwaza rawestandina şer dikin û dixwazin ku êdî leşkerên yewnanî ji nav wan vekişin, êdî malên wan neşewitînin. Ev serpêhatiyên Xenophon bi me didin zanîn ku kardoxî wê demê bi zimanê xwe axivîne û kesên bi kardoxî û zimanên din jî zanîne hebûne û ji bo ragihandinê hatine bikaranîn (Pîrbal, 2002, s. 11). Wekî din di Sefernameya Evliya Çelebî de metnên ewil ji kurdî wergerandine tirkî cî girtine û lûxatçeyêke kurdî - tirkî cî girtiye û qismekî vê lûxatçeyê bi zaravayê soranî ye, qismê din jî bi zaravayên cur bi cur in (Bruinessen, 1985, s. 21).

Dema em li dîroka wergera kurdî mêze dikin, xuya dike ku metna ewil a ji kurdî wergeriyaye, straneke ku ji hêla Ewliya Çelebî ve hatiye wergerandin e. Ewliya derheqê wateya stranê ya tirkî de zêde nîşe negirtine û gotiye heke min hemî wergerandîba tirkî min ê belasebep çîroka xwe dirêj bikira, ji ber vê hemî wernegerandiye. Lê hemî nebe jî hin peyv û biwêjên stranê di lûxatçeya kurdî de şîrove dike.

Çûme Cizîrê, kelek berdanê

Çû Xabûrê, xîvet vedanê

Ayayaya oyoyoyo oyoyoyoyo

Eman murûwet ezîz im, bo çî kelendû?

Eman murûwet ezîz im, bo çî kelendû?

Şa murûwetî, şa murûwetî, biroyî, biroyî, biroyî

Eman murûwet ezîz im, bo çî kelendû?

Eman murûwet ezîz im, bo çî kelendû ?

Îro du roj e mekan dûr e, xûb xûb

Îro du roje mekan dûr e, xûb xûb

Bejnîk zirav e, xal zahûr e, xûb xûb

Bejnîk zirav e, xal zahûr e, xûb xûb

Îşev çî şev e, şevêkî darî, xûb xûb

Cehfîn terîş e, baran dibarê, xûb xûb

Ayayaya oyoyoyo oyoyoyoyo

Eman murûwet ezîz im, bo çî kelendû? (Bruinessen, 1985, s. 21).

Evliya Çelebî dîsa behs dike ku di dema siltanê Osmanî, Muradê IV. de behsa kurdekî Diyarbekirî yê bi navê Qeweçî Zade dike ku wî 20 ziman zanibûne. Dibêje dema balyozên awusturî, polonî, çekî, frensîû rûsî hatine wî ji bo wan pir bi rihetî wergêrî kiriye.

Ji hêla wergerê ve dema meriv berê xwe dide lîteratura kurdî kesê ku herî ewil li ser wergerê xwe êşandiye Xanay Qubadî ye û wek wergêrê ewil yê kurdan tê zanîn. Xanay Qubadî (1672- 1754) helbest û epîkên biyanî (farisî) wergerandine kurdî. Wergera wî ya ku wek wergera herî serkeftî tê dîtin Xusrev û Sîrîn'a Nîzamî Gencewî ye.⁶

Gava yekem ya hewldana wergerê, ferhenga Nûbara Biçûkan (erebî-kurdî) e ku ji aliyê Ehmedê Xanî (1650-1706) ve di 1682-83'de ji bo zarok hînî erebî bibin, hatiye nivîsîn. Di vê ferhengê de îfadeyên (phrase) erebî ku wergeriyane kurdî hene. Ferhengeke îtalî-kurdî ji aliyê Maurizio Garzoniyê îtalyan ve di 1787'an de hatiye nivîsîn. Di pirtûka xwe de, Garzoni hevok, îfade û gotarên kurdî wergerandine îtalî. Lêkolînek jî li ser kurdên Îranê û xaldekan ji aliyê Peter Lerch ve bi zimanê rûsî li Petersburgê di 1856-58'an de hatiye nivîsîn. Beşa sêyan ya lêkolînê ferhengeke

⁶ <http://www.kurdishacademy.org/?q=node/540> (Dîrok: 25.06.2017)

kurmancî-rûsî û zazakî-rûsî ye. Misyonerekî Emerîkî ku demekê li Hekariyê jiyaye, di 1872'an de pirtûkeke rêzimanî çap kiriye û ferhengeke biçûk a kurdî - îngilîzî xistiye nav pirtûkê.⁷

Piştî nivê sedesala 19'an û pêve, alimên misilman ên kurd dest bi wergera tekstên dînî ji bo kurdî kirine. Sultan Muzafereddin, dema ku alimên dînî mewludname dinivîsandin û ew weke îlahiyê digotin, xelat pêşkêşî wan dikir. Şêx Huseynî Qazî (1791- 1870) jî li Silêmaniyê di salên 1860'an de mewludnameya Îbnî Hacer Haytemî ya bi erebî werdigerîne kurdî. Hacı Qadrê Koyî jî diyar dike ku Kaka Ahmedî Şêxî Şêx Marufî Nodî (1789- 1885) hin ayetên Quranê û hin tekstên dînî wergerandine kurdî. Gelek ji van wergeran bi zaravayê soranî, bi alfabeya erebî bûn, û ji zimanê erebî têsîr girtibûne.

Piştî hatina mîsyoneran a nav kurdan û bi çêbûna têkiliya gel kurdan, mîsyoneran xwestiye ola mesîhî di nav kurdan de belav bikin û bi vê armancê dikevin nav hewldana wergerandina Încîlê ji bo kurdî. Wegera ewil a Încîlê ji bo kurdî ji hêla misyonerên ermenî ve di sala 1856'an de tê kirin. Wergereke din a Încîlê di sala 1947'an de, bi wergera Kamuran Elî Bedirxan û Thomas Boisê keşeyê Domînîkan, li Beyrûdê, bi tîpên latînî û erebî hatiye weşandin. Wan herwiha berhemeke bi navê Metelokên Hezretî Silêman jî, ji îbranî wergerandiye (Öpengin, 2011, s. 5). Bêguman ji xeynî van wergeran gelek wergerên Încîlê hatine kirin.

Dîsa hin ji wergerên pêşî yê kurdî ji hêla Mela Mehmûdê Bazidî ve, di salên 1858-1859'an de hatine kirin. Wî beşek ji pirtûka Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî, bi sernavê “Tewarîxî Cedîdî Kurdistan” ji farsiyê wergerandiye kurmancî. Dîsa di wan salan de rojhilatnas Peter Lerch di pirtûka xwe de, ya bi navê Forschungen uber die Kurden und die iranischen Nordchaldaer, cih dide wergera kurdî ya hejmareke çîrok û metelokên ji fînlandî û tirkî. Piştî Bazidî, ji bo cara yekem di sala 1931'ê de, Erebe Şemo bi wergera şanoya Koçekê Derewîn a Aleksandr Araratyan nimûneyeke wergereke edebî pêşkêş dike. Celadet Elî Bedirxan çîrokeke bi eslê xwe îngilîzî ji frensî werdigerîne û di sala 1943'an de li Şamê çap dike; Kamiran Elî Bedirxan ji bilî Încîl û metelokên ku hatine behskirin, herwiha, 36 Çarînên Xeyam û gelek sûretên Qurana Pîroz û qedera 700 hedîsî wergerandine û di Hawarê de beş bi beş

⁷ <http://www.kurdishacademy.org/?q=node/540> (Dirok: 10.07.2017)

weşandine. Qedrîcan jî beşine ji romaneke fînlendî bi navê Di Welatê Zembeqê Gewr de di hejmarên Roja Nû de weşandine û çîrokek ji erebî di hejmara 13'an ya Ronahiyê de weşandiye (Öpengin, 2011, s. 5).

2.1.1. Di Kurdolojiyê de Hewldanên Beriya Wergerê

2.1.1.1. Amadekirina Ferheng û Pirtûkên Rêzimanê Yên Kurdî

Beriya pêşketina bizava wergera kurdî, meriv rastî çend ferhengên biyanî-kurdî yan jî kurdî-biyanî tê ku piraniya wan ji hêla rojhilatnasan ve hatine amadekirin. Ev diyarde ku di dawiya sedsala 19'an de tê dîtin bê guman di rêza wergerê de cî nagire belku di çarçoveya zimannasî û lêkolînên ferheng û zaravasiyê de bîr nirxandin. Ferhad Pîrbal ji bo ferhengên ewil ên kurdî dibêje ku deriyê ewil yê wergera kurdî ev ferheng in (Pîrbal, 2002, s. 18).

Ferhengên serî û Pirtûkên Rêzimanê yên kurdî ev in:

1. Nûbihara Biçûkan: Yekemîn ferhenga kurdî Nûbihara Biçûkan e ku ji hêla Ehmedê Xanî (1706-1650) ve di sala 1682-3'yan de hatiye nivîsandin. Ev ferhenga ji hin peyv û komepeyvyan pêk tê bi armanca hînkirina erebî bi zarokan, bi helbestkî hatiye amadekirin.

2. Pirtûka navdar ya keşeyê îtalî, Maurizio Garzonî: Ev pirtûka ku ji 287 rûpelan pêk tê di sala 1787'an de li Romayê hatiye weşandin. Ji kurteyêke rêzimana kurdî û ferhengeke îtalî-kurdî pêk tê. Garzonî hin hevok û gotûbêj û komepeyvên kurdî wergerandine îtalî bi taybetî di rûpelên 62-74 an de. Ev werger ji bo zelalkirina zimanê kurdî ji bo îtalîyan e. Tu grîngiyêke edebî ya vê berhemê nîn e. Di rûpelên 17-18 de navê hejmaran bi kurdî daye, di rûpelên 54-62'an de navê demsal û sal û hefte û endamên laşê mirov daye. Di rûpelên 62-74'an de hin hevok û gotûbêjên rojane yên kurdî dane.

3. Luxetnamey Ehmedî: Ev ferhenga erebî-kurdî (soranî) ji hêla Şêx Ehmedê Nodî ve di sala 1790'î de bi şewaza helbestê hatiye nivîsîn. Di sala 1984'an de ji aliyê Ebdulxaliq Esrî ve li Bexdayê hatiye weşandin (Pîrbal, 2002, s. 19).

4. Ferhenga Kurdî-Tirkî (Kurmanciya Jor): Bi tevahî 42 rûpel e. Bi texmînî di dawiya salên 1700'î de hatibe nivîsîn. Li Bexdayê di Darel Seddam lîl Mextûtat de bi hejmara 19936 hatiye parastin (Pîrbal, 2002, s. 19).⁸

5. Ferhenga Zewahîr Ellûxet: Ji hêla Mela Mihemedê Ciwanroyî ve hatiye amadekirin. Bi farîsî-kurdî (kurmanciya jorîn) ye û ji 73 rûpelan pêk tê. Derûdora sala 1772'yan hatiye nivîsîn. Li Bexdayê di Darul Seddam lîl Mextûtat de bi hejmara 19988 hatiye parastin (Pîrbal, 2002, s. 19).

6. Ferhenga farîsî-kurdî (kurmanciya jorîn): Ji 20 rûpelan pêk tê. Tê texmînkirin ku di destpêka salên 1800'î de hatibe nivîsandin. Li Bexdayê di Darul Seddam lîl Mextûtat de bi hejmara 20518 hatiye parastin (Pîrbal, 2002, s. 19).

7. Rapora Peter Lerch: Ev Lêkolîneke di derbarê kurdên Îranê û Xalidiyên bakûr û bav û kalên wan, bi zimanê rûsî di 1856-1858'an de hatiye nivîsîn. Ev berhem li Peterburgê ye.

8. Ji hêla Elî Ekber Kurdistanî ve di sala 1867'an de bi navê Bedai'ul Luxat ferhengeke kurdî (sorani)-farîsî tê amadekirin. Di sala 1870'yî de ji hêla Nesrullah Kurdistanî ve tê îstînsahkirin (Pîrbal, 2002, s. 20).

9. Aleksandre Jaba di sala 1879'an de ferhengeke kurdî-frensîzî bi navê Dictionaire Kurde –Français amade dîke. Ev ferheng nêzî 15 hezar peyv dihundirîne û wek ferhenga ewil a berfireh tê qebûlkirin.

10. Mîsyonerekî Amerîkî ku navê wî wek C.A.V. derbas dibe, di sala 1872'an de pirtûkeke rêzimanê weşandiye û beşa wê ya duyem ji ferhengeke kurdî-îngîlîz pêk tê (Pîrbal, 2002, s. 20).

11. Di cildê duyan ya Catalogue of The Persian Manuscripts in The British Museum de behsa nusxeyekê dîke ku di 4 rûpelên wê yê ewil de ferhengeke bi zaravayê lekî, di rûpelên 5-7'an de lîsteya hin peyvên devoka Erdelanê û di rûpelên 9 û 10'an de ferhengeke îngîlîzî –kurdî heye (Rieu, 1881, s. 866).

⁸Darel Seddam lîl Mextûtat pirtûkxaneya destxetan a Seddam e ku piştî hilweşîna desthilata Seddam ev pirtûkxane hatiye talankirin û derheqa aqubeta nusxeyên vê pirtûkxaneyê de tu agahî nehat bidestxistin.

12.Li pirtûkxaneyê Zanîngeha Tubingen'ê pirtûkeke bi navê Arabisch-Kurdische Grammatik (Rêzimana erebî-kurdî) heye ku di sala 1701'ê de hatiye nivîsîn û 83 rûpel e û nayê zanîn ku ji hêla kê ve hatiye nivîsîn.⁹

13.Ji hêla Ebul Muhsîn ve di sala 1885'an de li Sînê ferhengeke kurdî(devoka Erdelanê)-farsî ku ji 531 peyvên pêk tê hatiye amadekirin. Ev berhem li Pirtûkxaneyê Neteweyî ya Tehranê tê parastin.¹⁰

14.Di sala 1894'an de ji hêla qaymeqamê Mûtkiyê Yusuf Ziya Efendî ve ferhengeke kurdî- erebî ya bi navê El Hedîyyetu'l Hamîdiyye fî'l Luxetu'l Kurdiyye tê amadekirin. Di ferhengê de 5452 peyvên cî digirin (Mertoğlu, 2013, s. 32-34).

15.Ji aliyê Father Ablahad ve di sedsala 19'an de bi alfabeya suryanî li Amêdiyê bi devoka badînî bi navê Kîtaba d-Tûraş Mamlla Kartwaya (Rêzimana Zimanê Kurdî) berhemeke 172 rûpelî hatiye nivîsîn. Di vê berhemê de Ablahad cî daye listeyeke peyvên bi kurdî-suryanî. Ev pirtûk li Pirtûkxaneyê Bexdayê bi hejmara 18078 hatiye parastin.¹¹

16.Kemal Fuad di xebata xwe ya bi navê Kurdische Handschriften / Destnivîsên Kurdî ya di 1970'yî de amade kiriye de behsa xebata Mehmûd Riza Kandûlayî ya ku di 1902'an de ji bo O. Mann amade kiriye dike. Ev xebata Kandûlayî ferhengeke kurdî (goranî)-farsî ye bi tevahî tê de 750 peyv hene (Pîrbal, 2002, s. 19).

Ev ferhengên ku piraniya wan ji hêla kurdnasên rojavayî ve hatine berhevkirin ji bo damezrandina xebatên wergera kurdî bûne bingehek.

⁹<http://dengukurdemisilman.com/klasik-kurt-edebiyati-i.html>, 2018 (Dîrok: 17.12.2018)

¹⁰<http://dengukurdemisilman.com/klasik-kurt-edebiyati-i.html>, 2018. (Dîrok:17.12.2018)

¹¹<http://dengukurdemisilman.com/klasik-kurt-edebiyati-i.html>, 2018. (Dîrok:17.12.2018)

2.1.1.2. Di Kurdolojiyê de Xebatên Wergerê

2.1.1.2.1. Wegera Ji Zimanên Biyanî Ji Bo Kurdî Ji Mêj Heta Sedsala 20'î

Ferhat Pîrbal, destpêka vê qonaxê dibe sedsala 17'ê piştî zayînê ku di vê qonaxê de wegera helbesta goran derdikeve pêş. Pîrbal vê bizava wergerê ya ji zimanên biyanî ji bo kurdî, bi çar awayan diyar dike:

- Helbestvanê Goran, di sedsala 17'ê de
- Kurdnasên Rojavayî, ji naverasta sedsala 19 pê ve
- Mîsyonerên Xiristiyânî, ji naverasta sedsala 19 pê ve
- Mela û şêx û mutesevifên kurd, ji naverasta sedsala 19 pê ve

Weger li bal kurdan her di destpêkê de, ji zimanê biyanî bûye ji bo zimanê kurdî; bi taybet ji zimanê farsî bo zimanê kurdî çêbûye. Ev jî bi awayekî pir kêr û tek û tûk pêk hatiye. Demeke kêr berdewam kiriye û paşê jî kuta bûye, deqên hatine wergerandin jî tenê helbest bûne. Ev jî tê vê wateyê ku weger bi awayekî pîlankirî çênebû ye; nebûye pirojeyê ronakbîrî (Pîrbal, 2002, s. 25).

2.1.1.2.1.1. Xebatên Serdema Mîrekiya Erdelanê

Di serdema Mîrekiya Erdelanê de wêjeya herêma Erdelanê bi awayekî giştî di bin bandora zimanê farsî de bû. Hin helbestvanên vê demê yê wekî Mestûre, Efser, Rewneq bi zimanê farsî helbest hûnandine. Hin ji wan kesên wek Xanayê Qobadî, Mîrza Şefîê Kendûleyî jî helbestên farsî wergerandine ser zimanê kurdî. Her çiqas ku ev weger di çarçoveya deqên biyanî de qels mane jî, lê bêhna jiyana civaka kurdî zimanê kurdî jê tîn û birola berhemeke xwemalî hene.

Ji wan wergerên vê serdemê a ku wekî wegera herî serkeftî tê dîtin, wergerberhema Nizamîyê Gencewî Xosrew û Şîrîn e. Xanayê Qobadî (1672-1754) ev çîrok ji farsî wergerandiyê kurdî. Hemey Mela Kerîm û Muradê Aweng û Huznîyê Mukiryânî jî ev berhema Xanayê Qobadî çap kirine. Ji bilî wan, Xanayê Qobadî Leyla û Mecnûn û Eskendername yê Nîzamî wergerandine ser kurdî (Pîrbal, 2002, s. 27).

Xanayê Qubadî wergereke wisa nekiriye ku malik bi malik li gor Nizamî çûbe. Lê belê naverok ji Nîzamî girtiye û bi awayekî ku bixwe jê hez kiriye dariştiye. Lê li gel vê yekê jî, li pir ciyan peyv bi peyv malikên wî wergerandine.

Kêy tazê golê xezan nedîdê	کای تازه گل خزان رسیده
Reftê zê cehan cehan nedîdê	رفته ز جهان جهان ندیده
Nizam	نظامی

Wat ey teze gul xezan resîde	وات ئه ی تازه گۆل خهزان رسیده
Ne cîhan liway cîhan nedîde	نه جیهان لوی جیهان نه دیده
Xanayê Qubadî	خانای قوبادی
	(Pîrbal, 2002, s. 31)

Her wiha Xanayê Qubadî weke yekem wergêrê kurd tê naskirin û yekem nivîskarê kurd e ku çîrok û helbestên biyanî (ji farsiyê) wergerandine kurdî. Li gor ku Ferhad Pîrbal qal dike di vê serdemê de hin wergerên din jî hatine kirin lê heta roja îroyîn nehatine (Pîrbal, 2002, s. 31).

2.1.1.2.1.2. Wergerên Kurdnasên Rojavayî

Ji nîveka sedsala 19'an pê ve kurdnasên rojavayî hewl dane ku kurdan teşwîqî nivîsînê, bi teybetî ji bo karê wergerê ji zimanên biyanî ji bo zimanê kurdî bikin. Pîraniya kurdnasên rojavayî rûsî, frensî, elmanî, îtaliyanî û brîtanî bûn. Hin ji wan zanayên pispor û yên din jî dîplomat û siyasetmedar bûn. Armanca wan ya sereke naskirina gelê kurd bû da ku bi wî awayî berjewendiyên xwe yî bazirganî û siyasî bi cî bînin. Bi taybetî bi rêya alimên kurd hewl dane ku ji kurdî wergeran bikin da ku bi wî awayî bikaribin ziman û zarava û ciyawaziyên kurdan nasbikin. Ev werger di nîvê sedsala 19'ê de û bi hewldana qonsolê Rûsyayê yê Erziromê Alexandre Jaba û bi serpereştiya Mela Mehmûdê Bazidî, ji bo kurdîyê hatine wergerandin û li Pirtûkxaneya Lenîngradê tînin parastin.

Ev dest nivîs ev in:

2.1.1.2.1.2.1. Darrul Mecalîs: Ferhad Pîrbal dema behsa vê berhemê dike, berhemê di nav destnivîsa Kurd 49 de dide nîşandan û dibêje ku ev komek çîrokên neteweyî ne ku ji aliyê Mûsayê Hekarî ve di naverasta sedsala 19'ê de ji farisiyê ji bo kurdî hatiye wergerandin. Çîrokên wek Şîrîn û Ferhad ,Yusuf û Zuleyxa, Zûhakî Paşa, Rustem, Newşêrwan û Darewan, Bûkguestina Cengîz Xan ku bi xetê Mela Mehmûdê Bazîdî hatine nivîsîn (Pîrbal, 2002, s. 32). Lê Mustafa Öztürk, vê berhemê di nav destnivîsa Kurd 40 û Kurd 41 de dide nîşan û kopyayên du rûpelên Kurd 40 û du rûpelên Kurd 41'ê pêşkêş dike. Li gor agahiyên Öztürk dide di destnivîsa Kurd 49'ê de jî bi sernavê Kilamê Kîçan komek stranên kurdî hene.

Wekî ku li jor jî hat behskirin, li gorî Pîrbal ev çîrok ji farisî ji bo kurdî ji hêla Mela Mûsa ve hatine wergerandin (Pîrbal, 2002, s. 32) lê Öztürk wexta behsa vê berhemê dike dibêje ev çîrokên kurdî yê gelêrî ne ku ji hêla Mela Mûsayê Hekarî ve hatine berhevkirin (Öztürk, 2017, s. 128). Hem Pîrbal û hem jî Öztürk ev îddayên xwe nesipartine tu derê.

2.1.1.2.1.2.2. Hikayetên Farisî û Wergerên Wan, Destnivîsa “kurd 43”: Tê de 84 hikayetên netewî û folklorî hene û di nivê sedsala 19'an de ji hêla Mela Mehmûdê Bazîdî ve ji farisî ji bo kurdî hatine wergerandin û ji hêla Alexandre Jaba ve jî wergera ji bo frensî hatiye kirin û bi kurdiya latînî hatiye nivîsîn û li gel têbiniyên Jaba yê bi frensî hatine weşandin (Pîrbal, 2002, s. 32).

Ji bo vê berhemê li tu ciyê nusxeyê nav an sernav nehatiye destnîşankirin. Gelo Bazîdî van çîrokana ji berhemeke farisî wergirtîye yan jî ji xwe re ji edebiyata farisî berhovoka çîrokan dirust kiriye, ev yek ne kifş e. Ev çîrokana berê bi halê orjînal yanî bi farsî hatine nivîsandin. Bazîdî wergera van çîrokan a kurmancî nivîsandiye û pişt re A. Jaba jî li kêleka wergera kurmancî tîpguhêziya wan a latînî nivîsandiye. Her wiha A. Jaba wergera frensî jî li kêleka metnê farisî nivîsandiye. Li gorî vî halî, her rûpel wekî du sitûnan hatiye bikaranîn. Di rûpelên rastê de wergera Bazîdî ya kurmancî û tîpguhêziya A. Jaba li nik hev cî digirin. Di rûpelên çepê de jî metnê farisî û wergera A. Jaba ya frensî li nik hev in (Öztürk, 2018, s. 37).

2.1.1.2.1.2.2. Wergera Hikayetên Farisî, Destnivîsa “kurd 42”: Ev destnivîs wergera çîrokên gelêrî yê farisî ne ku ji hêla Mela Mehmûdê Bazîdî ve ji bo kurdî,

zaravayê kurmançî, hatine wergerandin. Naveroka vê destnivîsê û destnivîsa Kurd 43'ê yê ye.

2.1.1.2.1.2.3. Wergera Çîroka Leyla û Mecnûn bi hejmara “kurd 31”: Ev destnivîs wergera Leyla û Mecnûna Fuzûlî ye. Werger, her çiqasî wergera berhemeke helbestkî be jî Mela Mehmûdê Bazidî di salên 1857-1858'an de bi pexşankî nivîsiye, riste bi riste û beş bi beş girêdayî metna jêder maye (Öztürk, 2017, s. 113).

Serenivîsa berhemê wiha hatiye lêkirin:

Kîtabê Tercumeyê Leyla Mecnûn Tirkî bi Zimanê Ekrad û Kurmançî Fî 1274 (Öztürk, 2017, s. 27).

2.1.1.2.1.2.4. Destnivîsa “D447”: Wergereke pexşanî ya Îskendernameya Nîzamî Gencewî ye ku di sala 1191'ê de hatiye nivîsîn. Rûdenko dibêje ku kesekî bi navê Şehnezer di sala 1856'an de li Erziromê ew wergerandiye ser kurmançiya jorîn (Pîrbal, 2002, s. 33).

2.1.1.2.1.2.5. Destnivîsa “kurd37”: Ev destnivîs wergera Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsiye, ji farisî ji bo kurdî ji hêla Mela Mehmûdê Bazidî ve hatiye wergerandin. Navê wê Tewrîxê Qedîmê Kurdistan we Tercumeyê Şerefname Lîsanê Farisî bi Zimanê Kurdî ye. Ev destnivîs di sala 1858'an de hatiye wergerandin (Öztürk, 2017, s. 122-123). Rûdenko di sala 1986'an de bi pêşgotinekê li Moskovê weşandiye (Pîrbal, 2002, s. 34).

2.1.1.2.1.2.6. Destnivîsa “B.3971”: Ev destnivîs wergera Gulistana Se'dî Şîrazî (1184-1292) ye ku di sala 1257'an de hatiye nivîsîn û di sala 1857'an de ji bo kurdî hatiye wergerandin. Wergera wê ya kurdî pexşan e (Pîrbal, 2002, s. 34).

2.1.1.2.1.3. Wergerên Dîndarên Xiristyanî û Îslamî

Ev bizav ji naverasta sedsala 19'ê dest pê dibe û heya çarêka yekem a sedsala 20'ê jî dewam dibe. Çalakiya wergerkirinê, li bal wan erkdar û xebatkaran, armançeke din a dînî û siyasî hebûye. Ev armanç bi du awayan derdikeve pêşberî me:

Armanca yekê ya mîsyonerên xiristyanî ne ku xwestine ola îsevî di nav kurdan de belav bikin. Ji ber vê jî Încîl û hin pirtûkên din yê li ser ola îsevî wergerandine zimanê kurdî. Armanca duyan ya mela û şêx û pêşengên olî yê îslamê

ne, ku xwestine ola îslamê bi zimanê kurdî ferî kurdan bikin. Ji ber vê jî mewlûdanme û nivîsên li ser ferziyetên îslamî wergerandine kurdî.

2.1.1.2.1.3.1. Xebatên Dîndarên (Mîsyoner) Xirîstyanî

Ferhad Pîrbal destpêka vê bizavê nîveka sedsala 19'an nîşan dike û dibêje ji naverasta sedsala 19'an pê ve, destpêkeke nû ya bizava wergerê di wêjeya kurdî de derdikeve holê. Ew jî wergerandina Încîl û pirtûkên dînî yên xiristiyaniyan in (Pîrbal, 2002, s. 36). Mesût Serfiraz destpêka vê bizavê heta 1787'an dibe ku ev sala çapbûna kitêba Maurizio Garzoni ya bi navê Grammatica E Vocabolario Della Lingua Kurda ye. Çimkî Garzoni bi xwe jî mîsyonerek e û di dawiya vê pirtûkê de cî daye wergera ji bo kurdî ya du duayên xiristyanî (Serfiraz M. , 2015, s. 200).

Meriv dikare vê hewldanê wek bizava mîsyoneran bi nav bike. Ji ber ku çavkaniyên dîrokî dişelmînin ku mîsyonerên rojavayî, keşe û patrîkên ermenî yên Kurdistanê, bi awayekî eşkere li pişt van proje û xebatan bûne ango çîna ku werger ji bo zimanê kurdî kirine kesên biyanî ne. Di nava wan de jî herî zêde ermenan propagandaya dînî xiristyanî dikir û hevkarîy a wan dikirin.

Dema mîsyoneran piyê xwe avêtin Kurdistanê, berê xwe dan eşîrên xiristyanî ên Kurdistanê. Di nava wan de jî herî zêde û herî hêsantir, eşîrên ermenî yên ortadoks ketine bin bandora wan. Di navbera mîsyonerên xiristyanî û şexsiyetên dînî yên ermenî de têkilî û hevkarîyeke xurt ji bo wergerandina Încîl û pirtûkên dînî yên Xiristyanî ji bo kurdî hebû. Mîsyoneran ji bo vê armancê sûd ji patrîk û keşe û ronakbîrên ermenî yên Kurdistanê werdigirt. Ji ber ku piraniya keşe û patrîk û ronakbîrên ermenî yên Kurdistanê xwedî hêz û roleke mezin bûn. Kurdî dizanin û dikaribûn karê wergerê ji bo kurdî bikin. Ermen ji hemî netewên rojhilatê zêdetir nêzîkî kurdan bûn, cîranê hevdu bûn, ji hêla dîrokî û civakî û olî ve xizmantî û têkiliyeke kevînar hebûn û ji hêla siyasî ve jî hevê û hevçarenûs bûn (Pîrbal, 2002, s. 37).

2.1.1.2.1.3.1.1. Încîl Xudeê Me Îsa El Mesîh e Nivîsandin Bi Destê Madteos

Ev yekemîn wergera Încîlê ya bi kurdî ye ku ji aliyê BFBS'ê ve hatiye weşandin, bi tîpên ermenî ye. Di pirtûkê de tenê Încîla Madteos cih digire. Wergêrê

wê kesekî bi navê Stepan e ku li Diyarbekirê ji bo mîsyonerên Amerikî xebitiye. Ev Încîl di sala 1856'an de li Stenbolê çap bûye û 112 rûpel e.

Nusxeya wê bi vê navnîşanê li pirtûkxaneya Cambridge'ê tê parastin: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.509.1.E56.1

2.1.1.2.1.3.1.2. Încîl Xudeê Me Îsa El Mesîh e Nivîsandin Bi Destê Madteos Marqos Luqa û Yanna

BFBS'ê 1857'an de her çar Încîlan bi hev re werdigerîne û li Stenbolê, li Çapxaneya Kayol çap dike. Ev werger, yekem werger e ku çar cureyên Încîlê bi hev re ji bo kurdî hatine wergerkirin. Încîla ku sala 1857'an de hatiye wergerandin, ji zimanê yewnanî ji bo zaravayê kurmancî ye û bi alfabeya ermenî hatiye weşandin. Ev çap 398 rûpel e û ji aliyê mîsyonerên xiristiyanî yê ermen ve hatiye belavkirin. Navê pirtûkê jî, bi zaravayê kurmancî û bi alfabeya ermenî ye. Di vê pirtûka navborî de tu pêşgotin nîn e. Naveroka Încîlê li rûpela yekem a pirtûkê dest pê dike. Beşa Madteos ji rûpela 1'ê heta 112'an, beşa Marqos ji rûpela 113'an heta 184'an, beşa Luqas ji rûpela 185'an heta 307, beşa Yannaji rûpela 308'an heta 398'an e.

Beriya vê Încîlê, berhemek nîne ku bi şewaza pirtûkeke weşandî, ji zimanekî biyanî wergeriyabe kurdî. Ev jî tê wê wateyê ku di dîroka pêşketina bizavên wergera kurdî de û di warê lêkolîn û berhevkarîyê yê zimanzaniyê de ev pirtûk xwedan roleke pir grîng e. Grîngiya sereke ya vê Încîlê ew e ku piştî çîrokên Mele Mehmûdê Bazidî yek ji mînakên despêkê ya pexşana kurdî ye ku bi sernavê Mem û Zîn di sala 1856'an de hatiye nivîsandin. Ji hêla zimanzaniyê ve jî (hevoksazî û peyv sazî), her wiha ji hêla pêşketina nivîsa bi kurdî û geşekirina asta pexşana kurdî ve jî pir girîng e.

2.1.1.2.1.3.1.3. Aypenaran Alifbe Cuz Kurmancî û Ermenî

Pirtûka sêyem e ku ji hêla mîsyoneran ve ji bo zimanê kurdî hatiye wergerandin Alfabêceya Kurmancî û Ermenî ye ku li Stenbolê, di sala 1860'î de bi zaravayê kurmancî, bi alfabeya ermenî hatiye weşandin û belavkirin. Çapa duyem ya vê pirtûkê jî di sala 1861'ê de hatiye çapkirin.

Ferhad Pirbal dema behsa vê berhemê dike, di destê wî de tenê çapa duyem ya vê berhemê heye û xuya ye ku wî xwe negihandiye çapa yekem a vê berhemê û dibêje her wekî ku di pirtûkê de jî hatiye nivîsandin, ev pirtûk çapa duyê ye, diyar e

ku çapa yekemîn a pirtûkê çend salan beriya 1861'ê hatiye belavkirin. Pirbal di wê baweriyê de ye ku çapa yekem a vê pirtûkê beriya wergera Încîla 1857'an hatiye kirin, vê îddaya xwe jî dispêrîne vê yekê ku ji bo hînkirina Încîlê, ermenan xwestine zarokên kurdan ewil hînê alfabe û xwendin û nivîsandinê bikin (Pîrbal, 2002, s. 45-46).

Ziyattin Yıldırımçakar jî di teza xwe ya lîsansa bilind de agahiyên derheqê vê berhemê de ji Mesut Serfiraz û Ferhad Pirbal digire û li jêrenotê dibêje ku Pirbal dîroka çapa vê berhemê wek 1861 nîşan daye (Yıldırımçakar, 2016, s. 49).

Berhema ku Serfiraz behs dike çapa yekem ya vê berhemê ye, ya Pirbal behs dike jî çapa duyem ya berhemê ye. Çapa yekem di 1860'î de, ya duyem di 1861'î de hatiye kirin.

Ferhad Pîrbal çapa duyem bi berfirehî wiha dide nasîn (Pîrbal, 2002, s. 42-44):

Serenavê berhemê bi ermenî û kurdî hatiye nivîsandin. Li bin serenavê pirtûkê jî, tenê bi zimanê ermenî hatiye nivîsandin. Di vê pirtûkê de hin zanyarî di derbarê dîne xiristiyanî de ji bo zarokan yê li Kurdistanê hene. Paşê jî, dîsa bi ermenî wiha nivîsiye:

Ev pirtûk bi hevkarîya wan kesan hatiye amadekirin:

1. Matyos ermeniyan li Êçmiyazînê
2. Patrîkê Ūrşelîmê, Bavê Hovan Tû
3. Bavê Hankût Siyelo, ku ew jî patrîk e
4. Patrîkê Stenbolê, Bavê Serkesî (34)

Paşê bi kurdî nivîsîne:

Çapa Duyem

1861

Xelatiya Stenbol

Weşanxaneya Heyva Nû

Li ser bergê wê wêneyê jinek û du zarokên perî ku her yek li aliyekî rûniştî ne, di nîvekê de hatine kişandin. Pirtûk 56 rûpel e û tê de 42 wêne hene. Pirtûk bi zimanê kurdî ye û ermenî ye. Her rûpelek li ser du stûnan hatiye dabeşkirin. Stûnek bi zimanê kurdî û yê din bi zimanê ermenî ye. Eşkere ye ku nivîskarên ermen di destpêkê de pirtûk bi ermenî nivîsandine paşê jî wergerandine kurdî. Hemû pirtûk ji tekstên biçûk û curbicur pêk tên. Tekstên kurdî û ermenî hemî ji bo berawirdkirinê berdest in.

Di rûpela yekem de pêşgotineke bi zimanê kurdî heye. Di xeta yekê de wiha hatiye nivîsandin:

Ev elîfba hate çêkirin ji bo zarokên kurdistanê.

Di vê pêşgotinê de behsa naveroka pirtûkê dike. Rûpela duyê: Heman pêşgotin û behseyeke bi zimanê ermenî.

Rûpela Sêyê: Nîgareke beder e di derbarê dibistan, mamoste, xwendekaran de. Dibistan û xwendinê li pêş çarê xwendekaran şirîn dike.

Rûpelên 4-7: Li hemberî her dengêkî kurdî tîpeke ermenî hatiye danandin. Bi zimanê ermenî qala guncavbûna alfabeya ermenî ji bo kurdî kiriye. Hewl hatiye dayîn ku nivîsîn û xwendina zimanê kurdî têkeve qalibê alfabeya ermenî û vê şunde kurdî bi alfabeya ermenî bê nivîsandin.

Rûpelên 8-12: Çend ders û rahênanên pratîkî ne, ku di derbarê çespandin û bicîkirina alfabeya ermenî ji bo zimanê kurdî û nivîsandina bi kurdî

Rûpela 13: Li ser du beşan hatiye dabeşkirin, her beşek jî li ser du stûnan dabeş bûye. Stûnek peyvên kurdî ne ku wateya wan di stûna hember de bi ermenî hatiye nivîsandin êdî ferhengeke kurdî-ermenî ya biçûk e. Hemî bi hev re 180 peyvên kurdî – ermenî ne. Peyvên wê jî her wekî ku di sernavê pirtûkê de hatiye destnîşankirin peyvên yek kîteyî ne. Mînak: Ez, ax, em, av, paç, tal, kal.

Rûpelên 14-15: Ferhengeke kurdî-ermenî ya piçûk e û 104 peyvên li xwe digire. Peyvên wê jî peyvên yek kîteyî yên kurdî ne ku li hember peyvên du kîteyî yên ermenî hatine danan.

Rûpelên 15-17: Bi heman awayî ferhengeke biçûk a kurdî-ermenî ye. Peyvên du kîteyî yên kurdî ne ku li hember peyvên du kîteyî yên ermenî hatine nivîsandin.

Rûpela 18: Di vê rûpelê de peyvên sê kîteyî û peyvên du kîteyî yên ermenî hene Meriv dikare bêje ferhengeke kurdî-ermenî a biçûk e.

Rûpela 19'an: Peyvên 4 kîteyî yên kurmançî û peyvên 2kîteyî yên ermenî ne. Ferhengeke hevokên birgeyî ya kurdî- ermenî ye. Hemî 44 hevokên kurdî ermenî ye.

Rûpel 20-24: Li ser du stûnan hatiye dabeşkirin. Li serê her stûnê bi kurdî û ermenî hatiye nivîsandin. Vêca di beşa sernavên stûna kurdî "bastmaxane" hatiye nivîsandin ango weşanxane. Li ser stûna ermenî jî heman tişt hatiye nivîsandin. Bi kurdî û ermenî qala girîngiya weşanxaneyê ji bo pêşketina jiyana mirovan û civakê dike.

Rûpel 25:Li ser vê rûpelê dua hene. Rûpel li ser du stûnan hatiye dabeşkirin. Di stûna yekem de bi zimanê kurdî deqê nimêjê hatiye nivîsandin ku Xiristiyanî her sibehê dikin. Di stûna duyem de heman nimêj bi zimanê ermenî li hemberî zimanê kurdî hatiye nivîsîn.

Rûpel 26-29: Peyvên ku rojane tên bikaranîn, bi ermenî hatine nivîsandin. Rûpel li ser du beşan hatiye dabeşkirin. Her beşek li ser du stûnan dabeş dibe. Ferhengeke biçûk ya kurdî-ermenî ye. Bi kurtî di vê ferhengê de navê gelek nebat, xwarin, firinde, jîndar û babetên xwezayî hatiye nivîsandin.

Rûpela 30-33: Ferhengeke kurdî-ermenî ye ji du stûnan pêk tê. Tenê ji bo hejmaran hatiye veqetandin.

Rûpel 34-54: Du gotarên ji heşt beşan pêk tên hene. Li du stûnên li hemberî hev yek bi kurdî û yek bi ermenî ye. Di derbarê dîroka Ermenîstanê û girîngiya dîne xiristiyanî de agahî dide.

Rûpel 55:Li ser vê rûpelê helbestek heye. Di stûna yekem de bi kurdî û di stûna duyê de jî bi ermenî heman helbest hatiye nivîsandin.

Dema meriv çapa yekem a ku li ber destê me heye, û vê çapa duyem a ku Pîrbal daye nasandin, dide ber hev ji hêla naverokê ferqa navberê de nîne. Ferhad Pîrbal vê wergerê wek yekem pirtûka zarokan a dibistanê dinirxîne û wiha dewam dike:

Yekem pirtûka nirxandina dîne xiristiyanî ya bi kurdî ye. Pirtûka yekemîn e ku dîrok bi zimanê kurdî nivîsandibe. Yekemîn pirtûka kurdî ya bi

wêne ye. Yekemîn hewldana nivîsandina bi zimanê kurdî ye. Hemî nivîsên nava vê pirtûkê li ser du stûnan hatine nivîsîn. Li ser stûnekê kurdiya tekstê, li ser stûna din jî ermenkîya tekstê hatiye nivîsandin. Her wiha ev pirtûk ferhenga yekem a ermenkî-kurdî ye û di meseleya wergerê de pir girîng e. Di ferhengê de zêdetirî 300 peyv û têgehên kurdî-ermenkî tê de hene. Wateya wan bi her du zimanan jî hatiye zelalkirin.

Ev pirtûk yekem hewl e ku teksta wergerkirî, di heman rûpêlê de, di stûnekê de li kêleka teksta jêgirtî hatibe danan. Ev kar pirtir harikariya xwendekaran dike ku bikaribin liberhevdanînekê ji bo her du tekstan bikin. AlfaBeCe ya kurmancî û ermenî pexşaneke xurt û spehî ya kurdiya naverast ya salên sedala borî. Nivîskarên vê pirtûkê di gotarên wergerandî de qala grîngiya weşanxaneyê ji bo kurdan kirine. Bi zimanekî hêsan behsa rola weşanxaneyê û zanistê di pêşketina çîrok û hizra mirovan kirine. Ev jî ji bo wê demê gelek zor bûye. Grîngiya vê pirtûkê ji hêla rêziman û têgeh sazî, peyvsazî û hevoksaziyê, her wisa ji hêla pêşketina nivîsîna bi zimanê kurdî û geşedana nivîsandina pexşana kurdî pir grîng e. (Pîrbal, 2002, s. 49)

Mesut Serfiraz behsa pitûkeke din a bi vê terzê dike ku ew jî bi tîpên ermenî di 1868'an de li New Yorkê çap bûye. Navê kitêbê Tasakirkê Kurmancî an jî Dasagirkê Kurmancî ye, Tasakirk an jî Dasagirk, tê wateya kitêba dersê ku îngilîz dibêjin textbook. Ev kitêb jî aliyê American Tract Society ve hatiye weşandin (Serfiraz M. , 2015, s. 208).

2.1.1.2.1.3.1.4. Peymanê No Ê Xoîyê Me Îsa El Mesîh

Ev Încîla ku ji aliyê ABS'ê ve hatiye weşandin û bi tîpên ermenî ye. Ev werger jî hêla ermenekê ku li Diyarbekirê ji bo mîsyonerên Amerîkayê dixebitî yê bi navê Stepan ve hatiye wergerandin û ji hêla J.G.Bliss ve liçapxaneyê A. H. Boyacyan li Stenbolê û di sala 1872'an de çap bûye. Di vê wergerê de hemû beşên Peymana Nû, wekî her çar Încîl, Xebatên Resûlan, Nameyên Şandî cih digirin.

Nusxeya wê bi vê navnîşanê li pirtûkxaneyê Cambridgê tê parastin:
University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.509.1.E72.1

2.1.1.2.1.3.1.5. Yerbaranê Bi Kurmancî

Ev pirtûkeke îlahiyan e ku bi îngilîzî jê re hymn-book tê gotin. Ev pirtûka wergera hin îlahiyên xiristiyanî ne ku bi tîpên ermenî bi kurmancî hatiye nivîsîn. Li gor ku Mesut Serfiraz qal dike ev pirtûk li cem Zakarya Mildanoğlu heye û Mildanoğlu qismek jê, ji Serfiraz re şandiye (Serfiraz M. , 2015, s. 209-210). Ev werger di sala 1880'î de li Xarpêtê li Çapaxaneya Kallaca de hatiye çapkirin û 111 rûpel e.

2.1.1.2.1.3.1.6. Încîla Rabbê Me yî Hisus Kristos Ku Madteos Nivîsî

Ev Încîla Matta ji aliyê ABS'ê ve di sala 1891'ê li Stenbolê, li çapaxaneya A.H. Boyacıyan çap bûye û hatiye weşandin û bi kurmancî bi tîpên ermenî hatiye nivîsîn. Li ser bergê wê, bi tirkîya osmanî "Ma'ârif-i 'Umûmiye Nezâret-i Celîlesinin 27 Rebî'û'l-evvel 309 ve 19 Teşrîn-i evvel 307 târîhli ve 693 numaroli ruhsâtnâmesiyle neşr olunmuşdur. Mesârifî Amerika Baybıl Şirketi tarafından tesvîd olunarak tab' olunmuşdur." nivîsiye. Ev werger 148 rûpel e.

Nusxeya wê bi navnîşana Cambridge University, B: University Library: Order in Anderson Room, H.X : BSS.509.1.E91.1; BSS.509.1.E91.2. li Pirtûkxaneya Cambridge'ê ye.

2.1.1.2.1.3.1.7. Încîla St. John Bi Kurdiya Kirmanşahê

Ev werger ji hêla kesekî fars ê bi navê Mîrza Yahya Xan ve ji bo kurdî, devoka kirmanşahî, hatiye kirin. Li çapaxaneya Henry Martyn Memorial Press'ê ji hêla BFBS'ê ve di sala 1894'an de li bajarê Îranê Culfa'yê hatiye weşandin û 161 rûpel e.

Nusxeyên wê bi van navnîşanan li pirtûkxaneya Cambridge'ê tên parastin:

1. University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.509.2.E94.2

2. University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.509.2.E94.3

3. University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.509.2.E94.1

2.1.1.2.1.3.1.8. Wergera Çend Beşên Încîlê û Peymana Nû û Çend Peymanên Din Bi Alfabeya Suryanî

Ferhad Pîrbal derheqê vê wergerê de van agahiyan dide ku li gor lêkolîneke Êsame Nexşebendî û Cemîl Rûfaîl zimanê kurdî di sedsala 19'an de bi alfabe û xetê

suryanî hatiye nivîsandin. Ji bo peyîtandina vê rastiyê jî lêkolînerên navborî, di pirtûkxaneyê Alasar de destnivîsek peyda kirine û babetek di derbarê wê de nivîsîne. Di hejmarên 14-15'an yê Kovara Mecellet Beynu Nehreyn de Yusuf Hubî, sernivîskarê kovarê, amaje bi vê çendê kiriye ku ji bîlî vê destnivîsê, du destnivîsên din jî (di heman mijarê de) bi zimanê kurdî bi xetê suryanî li pirtûkxaneyê Dr. Elrehban hatine parastin û hejmarên 305 û 306 jê re hatine destnîşankirin. Destnivîsa yekemîn, rêzimana suryanî û kurdî ye, her wiha wergera çend beşên Peymana Nû û çend sûretên bi suryanî ne û 17 rûpel e. Di 1888'an de li Eradnê ji hêla Êlya Hemo El-Elqoşî ve hatiye nivîsîn (Pîrbal, 2002, s. 50).

Ya duyemîn, rêzimana kurdî tevî wergera çend beşên Încîlê ne ku herdu bi tevahî 18 rûpel in. Her wiha çend nameyên Marpols û ferhengek ku herdu 7 rûpel in, bi destê keşe Ebilhed hatiye nivîsîn. Ev wek pirtûka berê ye. Lêbelê çend dîpnot lê hatine zêdekirin (Pîrbal, 2002, s. 51).

2.1.1.2.1.3.1.9. Çar Curyên Încîlê Bi Kurdiya Kirmanşahê

Ev werger ji hêla W. St. Clair Tisdall ve bi alîkariya Mîrza Îsmâîl ji bo devoka Kirmanşahê hatine wergerandin û di sala 1900'î de li Londonê hatine çapkirin.

2.1.1.2.1.3.1.10. Încîla St. Matthew Bi Kurdiya Kirmanşahê

Ev werger ji hêla W. St. Clair Tisdall ve bi alîkariya Mîrza Îsmâîl ji bo devoka Kirmanşahê hatiye wergerandin û di sala 1900'î de ji aliyê BFBS'ê ve li Londonê hatiye çapkirin. Di sala 1900'î de çar beşên Încîlê ji hêla W. St. Clair Tisdall ve bi alîkariya Mîrza Îsmâîl hatine wergerandin û çapkirin, ev jî yek ji wan beşan e.

Navnîşana nusxeya wê ya li pirtûkxaneyê Cambridge'ê: University Library
Order in Rare Books Room BSS.509.2.F00.2

2.1.1.2.1.3.1.11. Încîla St. Luke Bi Kurdiya Kirmanşahê

Ev werger ji hêla W. St. Clair Tisdall ve bi alîkariya Mîrza Îsmâîl ji bo devoka Kirmanşahê hatiye wergerandin û di sala 1900'î de ji aliyê BFBS'ê ve li Londonê hatiye çapkirin. Di sala 1900'î de çar beşên Încîlê ji hêla W. St. Clair Tisdall ve bi alîkariya Mîrza Îsmâîl hatine wergerandin û çapkirin, ev jî yek ji wan beşan e.

Navnîşana nusxeya wê ya li pirtûkxaneya Cambridge'ê: University Library
Order in Rare Books Room BSS.509.2.F00.3

2.1.1.2.1.3.1.12. Încîla St. John Bi Kurdiya Kirmanşahê

Ev werger ji hêla W. St. Clair Tisdall ve bi alîkariya Mîrza Îsmâil ji bo devoka Kirmanşahê hatiye wergerandin û di sala 1900'î de ji aliyê BFBS'ê li Londonê hatiye çapkirin. Ev ji wergereke nû zêdetir, wergereke ku 1894'an de hatiye kirin û di 1900'î de hatiye revîzekirin.

Navnîşana nusxeyên wê yê li pirtûkxaneya Cambridge'ê:

1.University Library Order in Rare Books Room BSS.509.2.F00.4

2.University Library Order in Rare Books Room BSS.509.2.F00.5

2.1.1.2.1.3.2. Wergera Metnên Îslamî

Di sedsala 19'an de di pratîka wergerê de xebatên mela û şêx û mutesewifên kurd jî xuya dikin. Ji hêla van kesan ve gelek babetên dînî ji bo kurdî tîn wergerandin. Pîrê van wergeran, wergerên eqîdename û mî'racname û mewludnameyan in.

Ji bilî mewlûdname û bawerînameyan Hecî Qadirê Koyî amaje bi vê çendê dike ku Kake Hemedê Kurê Şêx Marifê Nûdê (1789-1855) hin ji ayetên Quranê û textên dînî yê girêdayî şerîetê wergerandiye ser zimanê kurdî, zaravayê soranî.

Kes namawe be xeyrî Kake Hemed

Şeyxî me'rûf û alîmî erşed

Çake êsta de kat le bû kurdan

Tercemey şer'î û ayetî Quran (Pîrbal, 2002, s. 59).

Lê bele ev wergerên Kake Hemedê Şêx heya niha nehatine dîtin. Di heman serdemê de ev berhemên îslamî yê li jêr jî tîn dîtin ku ji aliye melayên kurd ve ji zimanê erebî û farisî ji bo kurdî hatine wergerandin.

2.1.1.2.1.3.2.1. Wergera Camî Wehdet

Ev destnivîs di pirtûkxaneya Darul Seddam lîl Mextûtat de bi hejmara 21609 hatine parastin. Di vê destnivîsa kurdî (kurmancî) de li kêleka wergera helbestên

farisî, hin şerh jî hatine pêşkêşkirin. Ne diyare ku ev werger ji hela kê ve û li ku dere û kengê hatine wergerandin (Pîrbal, 2002, s. 59).

2.1.1.2.1.3.2.2. Wergera Şerh El Tesrîf

Navê nivîskar an wergêr ne diyar e bi zimanê kurdî behsa tesrîfa(rêzimana) zimanê erebî dike. Nivîskar behsa wê çendê dike ku ji bo nivîsîna wê pirtûkê sûd ji birayê xwe Hiseyn Pîrxidir Şahoyî wer girtiye. Beşa destpêkê a vê pirtûkê tesrîfa nivîskarê ereb El Zencanî (sedsala 13'ê zayînî) ye, 64 rûpele. Diyar nîn e ku kengê hatiye wergerandin. Di heman sedsalê de nivîskarek ku nayê zanîn ku kê ye, di sedsala 19'ê de çirokehelbesta Fethî Xeyberî ji zimanê farisî bi heman şêwaza helbestê wergerandiye kurdiyê, zaraveyê goranî. Ev pirtûk 110 rupel e (Pîrbal, 2002, s. 62).

2.1.1.2.1.3.2.3. Wergera Mî'racnameya Nivîskarê Erebi Mela Necmeddîn El Xîfî

Ev berhem ji hêla Şêx Ebdurrehman Qeredaxî (di sedsala 19'ê de jiyaye) ve hatiye wergerandin, ku çîrok behsa geşta şevê ya pêxember (sxs) ji Mekkeyê ji bo mizgefta Eqsa li Qudsê û hilkeşana ji bo esmanan dike. Mînak:

Dema fexrê alemê serwerê ewladê Adem Hz. Resulullah di hucreya Îsmail de di nava du zilaman de xwe dirêjkiriye ji nişkave Hz. Cibraîl li sere sîngê wî yê mûbarek heya navika wî şeq kir... (Pîrbal, 2002, s. 62).

2.1.1.2.1.3.2.4. Wergera Temcume Deqa'îq El Exbar: Ev berhem ji erebiyê ji bo kurdî, hewramî, hatiye wergerandin. Ne diyar e ku kê wergerandiye. Di sala 1902'ê de ji nû ve hatiye nivîsîn. Ev pirtûk 121 rûpel e. Sernavê pirtûkê yê erebî ev e: Deqaîq El Exbar Fî Zikr el Cinnet We El Nar / Li ser Zikrê Cenet û Cehnemê Meseleyên Gring ku Îmam Ebdurrehîm bîn Ehmed wergerandiye erebî lê ji kîjan zimanê hatiye wergerandin ne diyar e. Nusxeyeke din jî heye ku 87 rûpel e (Pîrbal, 2002, s. 63).

2.1.1.2.1.3.2.5. Türkçeden Kurd Lisanna Mütercem İlmihaldir

Ev berhem Îlmîhalek e ku li gor mezhebê henîfî, ji bo zarokan, bi tirkî û kurdî di sala 1891'ê de hatiye nivîsîn. 45 rûpelên ewil li rûpelên rastê tirkiya osmanî li rûpelên çepê kurdiya tekstê hatiye nivîsîn û di sê rûpelên dawiyê de jî dua û sûretên Quranê bi erebî hatine nivîsîn. Ev berhem ji hêla mamostê dîrokê yê dibistana

Mamuretulazîz Idadi Mektebî Umer Ferid ve tê wergerandin (Serfiraz M. , 2013, s. 55-60).

2.1.1.2.1.3.2.6. Wergera Zat El-Şîfâ-yî Kurdî Mawsûm Bi Sâlih El-Şîfâ‘a

Berhema siyerê, Zat el-Şîfâ fi Sîret el-Mustafa we el-Xulefa el-Xemse‘ya İbn el-Cezerî (1350-1429) bi awayekî helbestkî ji bo kurdî, zaravayê goranî, hatiye wergerandin. Li Îranê li pirtûkxaneya Ansîklopediya Mezin ya Îslamê de bi hejmarê 1102 qeydkirî ye. Bi tenê yek nusxeyê wê heye û nayê zanîn ka kê û kengê wergerandiye. Bi texmînî tê gotin ku ev berhem aîdê sedsala 18’an an jî 19’an e.¹²

2.1.1.2.1.3.2.7. Wergera Mewlûdnameya Îbnî Hacer Haytemî Ya Şêx Huseynê Qazî

Şêx Huseynê Qazî (1791-1870) li Silêmaniyê di sala 1860’î de mewlûdnameya Îbnî Hacer wergerandiye ser kurdî, zaravayê soranî. Ev werger li hin ciyan pexşankî, li hin ciyan jî helbestkî ye lê zêdetir bi awayê pexşankî wergerandiye. Di serî de ev berhem wek ya Qazî hatiye zanîn, ji hêla Ebdulrezaq Bîmar ve hatiye tesbîtkirin ku ev berhem wergera mewlûdnameya Îbnî Hacer e (Pîrbal, 2002, s. 55-57)

2.1.1.2.1.3.2.8. Wergera Mewlûdnameya Îbnî Hacer Haytemî Ya Celîzade

Mewlûdnameya Îbnî Hacer ji hêla Mela Ebdullahê Hecî Esedê Celîzade ve jî ji bo kurdî hatiye wergerandin. Ev werger wek wergera Qazî bi rêk û pêk nîn e. Celîzade ji wergerandina naverokê zêdetir xwestiye metna armanc bi awayekî serkeftî ava bike ji ber vê guh nedaye wergera peyv bi peyv. Carna metna armanc li gor metna jêder kurt kiriye an jî dirêj kiriye (Pîrbal, 2002, s. 57-59).

2.1.1.2.2. Wergera Ji Kurdî Ji Bo Zimanên Biyanî Ji Mêj Heta Sedsala 20’î

Di dîroka wêjeya kevn a kurdî de ji çend wergerên biçûk ku Sefernameya Ewliya Çelebî (1655) de cî digirin an jî çend rûpelên pedagojîyê yên wergerandî wêdetir heta sedsala 19’an tu xebatên wergerê yên ji kurdî ji bo zimanên biyanî nehatine dîtin (Pîrbal, 2002, s. 132).

¹²<http://dengekurdemisilman.com/klasik-kurt-edebiyati-i.html>, 2018. (20.12.2018)

Di Catalogue of The Turkish Manuscripts in British Museum di beşa History of Kurds de behsa werger Şerefnameya Şerefxan a ji bo tirkî, dibe ku di sala 1699'an de ev werger ji hêla Muhemmed B. Ehmed Beg Mîrza ve hatiye kirin (Rieu, 1888, s. 70).

2.1.1.2.2.1. Wergera Çend Tekstên Şîroveyê Ji Bo Zimanê Îtalî, Berhema Maurizio Garzonî

Xebata kurdnasê îtalî Maurizio Garzonî, 287 rûpel e ku kurteyêke rêzimana kurdî û fergekek îtalî-kurdî tê de ye. Garzonî di pirtûkê de hin hevok û komepeyv wergerandine ser zimanê îtalî, bi taybet di rûpelên 62-74'an de. Ev wergerên wî ji bo zelalkirina rêzimana kurdî ji bo îtalyayîyan hatine kirin.

Her wisa çend tekstên vegotinî (narratîv) di rûpelên 62-74'an de bi şêwaza gotûbêjan di navbera du kesên gundî yên kurd de di vê pirtûkê de hatine belavkirin. Nivîs bi zimanê kurdî, bi devoka kurmancî hatine nivîsîn û her wisa wergera îtalî ya wan jî kiriye. Ev pirtûk di sala 1787'an de li Romayê hatiye weşandin.

2.1.1.2.2.2. Mem û Zîna Mela Mehmûdê Bazidî Ji Bo Zimanê Frensî

Mela Mehmûdê Bazidî çîroka Mem û Zînê "Legende Kurde" bi devoka kurmancî, bi destxetê xwe nivîsiye û piştê ji aliyê Aleksandre Jaba ve hatiye latinîzekirin û wergeriyaye ser zimanê frensî û li Sant Petersburgê di sala 1856'an de hatiye weşandin. Kopyeyêke vê destnivîsê li pirtûkxaneyê Langzo Inalco li Parîsê û her wisa yek jî li namexaneyê Sant Petersburgê li Rûsyayê tên parastin (Pîrbal, 2002, s. 133).

2.1.1.2.2.3. Wergera Mem û Zîna Ehmedê Xanî Ji Bo Tirkî, Ya Ehmed Faîq

Li ser mêjûya xê wergerê nêrînên cuda cuda hene. Nêrîna yekem ya Sırrı Dadaşbilge ye ku dibêje dîroka vê wergerê 1730 ye. Lê Zehra Toska li hember vê yekê derdikeve û dibêje li gor hesabê ebcedê ev yek şaş e, ev berhema di sala H. 1206 / M. 1791-1792'an de hatiye nivîsîn.

Ayhan Tek derheqê mêjûya nivîsa vê wergerê de dibêje ku ev berhema di sala 1856'an de hatiye wergerandin. Tek, vê agahiyê dispêrîne vê yekê ku li dawîya destnivîseke ku berê qet xebat li ser nehatiye kirin, dîroka 1273'yê hîcrî (1856 'ê mîladî) hatiye destnîşankirin û ji ber ku ji xeynî vê, agahiyêke din li ber destê wî nîn

e, bi texmînî dibêje dîroka wergera vê Mem û Zînê wek 1856 diyardike. (Tek, 2015, s. 136). Lê Zehra Toska vê yekê jî red dike û dibêje:

Wergera yekem ku dîroka wê H. 1273 / M. 1856 e, aîdê Nazmî ye. Di hin lêkolînan de ev berhem wekî ya Ehmed Faîq dixuye, lê ev tesbîteke xelet e. Wergêr di berhemê de ji beşa munaca'atê û vir de navê xwe wek Nazmî nivîsiye, qedrê navê Xanî jî girtiye. Em dikarin bibêjin ku Nazmî hin malik hema wekî xwe, hin malik jî biguhertinên biçûk wergerandiye û bi piranî jî serwaya berhema resen bi kar aniyê (Toska, 2015, s. 114).

2.1.1.2.2.4. Gotinên Pêşyan Ji Bo Zimanê Elmanî, Rûsî, Frensî û Tirkî

Pendên pêşyan û gotinên bi nirx yê kurdewarî ne ku ji aliyê Bazidî ve hatiye nivîsîn û Jaba bi ser û ber kiriye û wergerandiye û pêşgotinek jê re nivîsiye. Rûdenko, di sala 1961'ê, bi zimanê Rûsî, di pirtûka "Ev destnûsên ku li Lenîngradê tîst parastin" di rûpela 4'ê de behsa vê pirtûkê dike. Hin ji pendên vê destnivîsê ji aliyê kurdnasê rûs, Peter Lerch ve ji bo zimanên elmanî û rûsî hatine wergerandin û di sala 1857'ê de hatine weşandin. Bazidî bi xwe ev pend di sala 1856'an de ji bo zimanê tirkî wergerandine (Pîrbal, 2002, s. 134).

2.1.1.2.2.5. Çîrokên Ehmed Xan Ji Bo Zimanê Frensî

Ehmed Xan çaremîn mîrê mîrektiya Baban e ku di dawiya sala 1853'ê de serdana Parîsê dike û dibe mêvanê rojhilatnas Chodzko(Xudîzko). Di vê mêvandariyê de, di sala 1854'an de, 10 tekst û çîrokan bi kurdî ji bo Chodzko dinivîse û di sala 1857'an de bi şêwaza namîlkeyek li gel wergera wan a frensî belav dikan (Pîrbal, 2002, s. 134).

2.1.1.2.2.6. Wergera Hin Ji Berhemên Nalî û Şêx Riza û Baba Tahirê Hemedanî Ji Bo Frensî

Di beşa sêyemîn a pirtûka Chodzko de çend tîbiniyên derbarê wêjeya kurdî û her wisa du perçe helbestên kurdî yê Baba Tahirê Hemedanî û çend perçe helbestên wergerandî yê Nalî û Şêx Riza hene. Chodzko qala Nalî dike û dibêje ku Nalî niha (1854) li Şamê dijî. Komê helbestên Ehmedê Xanî ku bi navê Mecmû'e heyê ku çap nebûye (Pîrbal, 2002, s. 134).

2.1.1.2.2.7. Dîroka Kurdistanê Ji Bo Zimanê Firensî (Tewarîxê Cedîdê Kurdistan)

Tewarîxî Cedîdî Kurdistan an jî Kîtabê Tarîxê Cedîdê Kurdistan ya ku Mele Mehmûdê Bazidî di salên 1857-1858'an de nivîsiye û xwestiye bi terza Şerefxan binivîse û bibe berdewama Şerefnameyê. Tê de behsa bûyerên salên 1885-1857'an dike. Jaba wergera wê ji bo firensî kiriye. Ev pirtûka Bazidî bi qasî 1000 rûpelî heye. Ji destpêkekê û 11 rûpelan pêk dihat. Di sala 1855'an de Jaba dema li Erziromê ye destpêka vê destnivîsê ya bi firensî, dişîne ji desteya zaryarên rûsî re ku bê nirxandin. Mixabin heya îro encama vê destnivîsê nayê zanîn (Öztürk, 2017, s. 21).

2.1.1.2.2.8. Wergera Şerefnameyê Ji Bo Firensî

Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî bi navê Tarîxê Qedîmê Kurdistan di sala 1858'an de ji aliyê Bazidî ve ji bo kurmancî hatiye wergerandin. Bazidî hin beş wergerandine û hin beş jî kurt kirine (Öztürk, 2017, s. 21). Pişt re Jaba ew wergerandiye ser zimanê firensî. Pişt re Rûdenko di sala 1986'an de li Moskovê wê çap dike (Pîrbal, 2002, s. 135).

2.1.1.2.2.9. Wergera Durru'l Mecalîs Ji Bo Firensî

Qismê vê berhemê yî ji bo firensî hatiye wergerandin, di nav destnivîs Kurd 41A û 41B yên koleksiyona Jaba de ye. Kurdiya berhemê ji hêla Mela Mûsayê Hekkarî ve hatiye nivîsîn. Destnivîsa 41A 454 rûpel e. Qismekê wê ji berhema resen pêk tê, hin qisim jî ji wergera hin ciyên berhemê pêk tê ku Jaba ji bo firensî werger kiriye. Destnivîsa 41B'yê ji 19 çîrokên pêk tê. Li gor nîşe û xêzên li ser destnivîsê diyar e ku Jaba ji bo wergera wê serêxwe eşandiye (Öztürk, 2017, s. 128).

2.1.1.2.2.10. Wergera Hikayetên Farisî

Ev wergera hin çîrokên farisî yên di nav koleksiyona Jaba de bi navê Kurd42 û Kurd43 hatine qeydkirin ku berê jî me behs kiribû, ji hêla Mela Mehmûdê Bazidî wergerî ser kurdî bibûn. Jaba çend rûpelên pêşîn ên destnivîsa Kurd42'yê wergerandiye ser firensî. Lê Jaba, hemî çîrokên Kurd43'yê ku 84 çîrok in, wergerandine ser firensî (Öztürk, 2017, s. 132-134).

2.1.1.2.2.11. Wergera Leyla û Mecnûna Mela Mehmûdê Bazidî Ji Bo Zimanê Frensî

Mela Mehmûdê Bazidî çîroka Leyla û Mecnûn, Lagende Kurde, bi diyalekta kurmançî bi destxetê xwe di sala 1858'an de nivîsandiye. Piştê ji aliyê Jaba ve hatiye latînîzekirin û ji bo zimanê frensî hatiye wergerandin. Li gel destpêkeke bi zimanê frensî bi pênuşa Jaba di sala 1859'an de hatiye weşandin (Pîrbal, 2002, s. 135).

Kopiyeke vê destnivîsê li pirtûkxaneya Langzo li Parîsê û yek jî li namexaneya Sant Petersburgê li Rûsyayê tê parastin (Pîrbal, 2002, s. 136). Mustafa Öztürk dibêje ku ev çîrok Leyla û Mecnûna Harisê Bedlîsî ye Bazidî bi destnivîsa xwe ji nû ve saz kiriye. Ev werger di nav koleksiyona Jaba de, di destnivîsa Kurd31'de cî digire (Öztürk, 2017, s. 22).

2.1.1.2.2.12. Çîroka Siyabend û Şemsî Ya Mela Mehmûdê Bazidî Ji Bo Zimanê Firensî

Çîroka Siyamend û Şemsî bi diyalekta kurmançî ji hêla Mela Mehmûdê Bazidî ve hatiye nivîsîn û ji hêla Jaba ve ji bo frensî hatiye wergerandin. Tchihatchef (Çixaçiyef) vê destnivîsa kurdî li gel wergera wê ya firensî û awayê wê yî latînîzekirî tevî pêşgotineke firensî di sala 1859'an de weşandiye (Pîrbal, 2002, s. 136).

2.1.1.2.2.13. Wergera Çil çîrokên Mele Mehmûdê Bazidî Bi Navê Camî'iyê Rîsaleyên û Hîkayetan Ji Bo Zimanê Frensî

Mele Mehmûdê Bazidî bi navê Camî'iyê Rîsaleyên û Hîkayetan bi frensî Recueil de Notices et Racîts kourdes çil çîrokên kurdî bi diyalektê kurmançî nivîsiye. Ev berhem di dîroka wêjeya kurdî de yekem komçîroka kurdî ye ku hatiye weşandin. Ev berhem ji hêla Jaba ve ji bi zimanê frensî hatiye wergerandin û wî bi xwe di sala 1860'î de li Sant Petersburgê bi zimanê kurdî û frensî tevî destpêkeke nivîsîye û belav kiriye (Pîrbal, 2002, s. 136).

2.1.1.2.2.14. Wergera Pirtûka Elî Teremoxî Ji Bo Frensî

Navê berhemê yê resen, Serf û Be'dê Usûl Lazimeye Te'lîma Bi Zimanê Kurmançî ye. Ev berhem, pirtûka rêzimanê ya Elî Teremoxî ye ku rêzimana erebî bi kurdî vegotiyê. Mela Mehmûdê Bazidî ev berhem li Hekkariyê ji melayekî bi dest xistiye û bi xetên xwe di sala 1857'an de dîsa nivîsiye. Destpêkek jî derbarê jiyana

dînî û ronakbîrîya nav mizgeftên Kurdistanê yê wê serdemê û şêwaza dersxwendinê de û kurteyek jî derbarê jiyana Elî Teremoxî de nivîsiye (Öztürk, 2017, s. 22).

Jaba kurteyê babetên Teremaxî û destpêka ku Bazidî nivîsîbû wergerandiye frensî û di 17'ê Hezîrana 1858'an de ji bo rojhilatnasê Alman Lernhardt Dûrin dişîne. Piştê di 2'yê Nîsana 1859'an de babetê Elî Teremaxî jê re dişîne ku bi destxetê Bazidî hatiye nivîsîn. Piştê di pirtûka Camî'iyê Rîsaleyan û Hikayetan de ku di sala 1860'î de hatiye weşandin. Jaba kurteya vê pirtûka Elî Teremoxî bi kurdî û firensî belavkir. Destxetê bingehîn yê ku bi xetê Bazidî hatiye nivîsîn jî îro li pirtûkxaneyê Akademiya Zanistî ya Rojhilatnasî ya Lenîngradê tê parastin (Pîrbal, 2002, s. 137).

2.1.1.2.2.15. Destnivîsa Kurd 98: Di vê destnivîsê de, behsa fermanên zimanê kurdî dike û nêzîkî 800 fermanan di hundirîne. Ev destxet ji hêla Mela Mistefa ve di sala 1860'î de li Erziromê hatiye nivîsîn. Jaba deqê vê yê kurdî, ji tîpên erebî veguhestiye tîpên latînî û piştê wergerandiye ser zimanê frensî (Öztürk, 2017, s. 156).

2.1.1.2.2.16. Pirtûkek Di Derbarê Gramera Kurdî (Kurmançî) De Ji Kurdî Ji Bo Frensî

Rûdenko di destpêka wergera rûsî ya Adet û Rusûmetnameyê de dibêje ku Bazidî pirtûkek di derbarê rêzimana kurdî de ya bi navê Rîsaleya Tihfe El Nehlan fî Zemanî El Kurdan nivîsiye. Wî ev pirtûk di sala 1866'an de nivîsiye (Pîrbal, 2002, s. 137).

2.1.1.2.2.17. Wergera Pirtûkeke Zimanzaniyê ya Mele Mehmudê Bazidî Ji Bo Frensî

Nivîskar bi xetê xwe li Erziromê ji bo Aleksandre Jaba nivîsiye. Jaba nivîsa kurdî latînîze kiriye. Piştê di sala 1867'an de wergerandiye zimanê frensî. Pirtûk qala hin hêlên zimanzaniya kurdî dike. Hejmar û navê vê ya di nameyaneya Saltîkof Şîdrîn de kurd 46 e.

2.1.1.2.2.18. Adet û Rusûmetnameyên Ekradiye Ji Bo Frensî û Rûsî

Adet Rusûmetnameyê Ekradiye di sala 1857-1858'an de ji hêla Bazidî ve hatiye nivîsîn. Jaba ew ji bo zimanê frensî wergerandiye. Ev werger di nav koleksiyona Jaba de di destnivîsa Kurd35 de cî digire (Öztürk, 2017, s. 120). Margaret Rûdenko di sala 1963'yan de tevî destpêkeke bi zimanê rûsî weşandiye.

Wergera wê ya ji bo zimanê rûsî jî ji hêla Rûdenko ve hatiye kirin (Pîrbal, 2002, s. 137).

2.1.1.2.2.19. Mem û Zîna Ehmedê Xanî Ji Bo Zimanê Frensî

Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi alfabeya suryanî bi helbestkî ya hejmar 83 li hemberî wê jî wergereke xerab ya erebî heye. Di sala 1885'an de li Musilê hatiye nivîsîn. Li gor Dr. Kemal Fuad profesorê Alman Edward Sachau ev pirtûk parastiye (Pîrbal, 2002, s. 138).

2.1.1.2.2.20. Çîrokên Albert Socin û Eugen Prym Ji Bo Zimanê Elmanî

Zanayê Siwêsrî Profesore beşa Îslamînasiyê yê Zanîngeha Leipzig'ê Albert Socin (1844-1899) bi hevkarîya Eugen Prym, du cild pirtûk bi navê Keşkolî Kurdî di navbera salên 1887-1890'î de li St. Petersburg'ê belav kirin. Gelek çîrokên folklorî û destanên kurdî ligel wergera wan a elmanî tê de hene. Di nava wan çîrokan de ji rûpela 99 heta 271'ê bi taybet bi çîroka Mem û Zînê ye. Piştî wan bi hev re di salên 1898-1901'ê de lêkolîneke zimanzaniyê di derbarê wan tekstan de nivîsîn û belav kirin (Pîrbal, 2002, s. 139).

2.1.1.2.2.21. Wergera Muhebbetî Mem û Zîn A Komkirî Ji Aliyê Hartman Ji Bo Zimanê Elmanî

Mem û Zîn weke pexşan û helbest, bi devoka kurmancî rojhilatnasê elmanî, Martîn Hartman (1851-1919) kom kiriye û ligel çend malikên din yê kurdî di sala 1899'ê dubare nivîsandîye. Niha li Namexaneyê Perwerdaxaneyê Rojhilatnasî a Akademiya Zanistî a Sovyetê li Lenîngradê bi hejmara 132514 tê parastin. Ev çîrok bi helbestê dest pê dike, dibe pexşan û dîsa dibe helbest, bi vî awayî heya ku weke pexşan bi dawî dibe û nêzikî 13 rûpelan e (Pîrbal, 2002, s. 139).

2.1.1.2.2.22. Heşt Destan û 12 Hîkayetên Von Le Coq Ji Bo Zimanê Elmanî

Kurdnasê Elman Albert Von Coq, pirtûkeke du cildî di sala 1903'an de li Berlînê belav kir ku tije textên cur bi cur ên bi zimanê kurdî, devoka kurmancî ne. Cildê yekê 72 rûpel in, cildê duyê jî 118 rûpel e. Nivîskar di bergê yekem de 20 çîrokên kurmancî ne ku bi tîpên erebî û latînî lige wergera elmanî ji rûpela 1'ê heya 72'yê belav kiriye. Divê bê gotin ku hinek weke hikaye binav kiriye û hinek jî wek destan binav kiriye. Di pirtûkê de 8 destan û 12 hikaye hene. Cildê duyê yê vê

pirtûkê transkrîpsiyona çîrok û tekstên kurdî bi tîpên latînî û her wisa ji rûpelên 70 heya 118'an jî ferhengokeke ku ji bo peyvên giran li xwe digire. Ev ferhengok zazakî-kurdî, babanî-elmanî. Ev çîrok û hikayetan ji devê pênc mela û feqiyên gundiyên bakûr hatine wergirtin. Nûbihara Ehmedê Xanî û Mewlûda Nebî ku li gor wî ji aliyê Melayê Bateyî ve hatiye nivîsîn (Pîrbal, 2002, s. 140).

2.1.1.2.2.23. Wergera Beytên Rehman Bekir Ji Bo Zimanê Elmanî

Oskar Mann, kurdnasê Elman di navbera salên 1903-1904 de li kurdistanê bû. Li bajarê Mihabadê û ji devê Rehman Bekir Goyende, çend beyt û çîrokên kurdî weke helbest û pexşan tomar dike û li Berlînê, di sala 1905'an de diweşîne. Beytên wî ev in: Kela Dimdimê, Mem û Zîn, Las û Xezan, Cûlendî, Leşkerî, Zembilfiroş, Nasir û Malmal, Şêx Ferx û Xatû Stî, Koç Osman, Bapîr Axayê Mengorî, Elî Aşiq (Pîrbal, 2002, s. 140).

2.1.1.2.2.24. Wergera Mem û Zînê Ya Abdulaziz Halis

Ev wergera duyem ya Mem û Zînê ye ku di sala 1906'an de ji hêla Abdulaziz Halis ve hatiye wergerandin. Halis, di dibaceya xwe de ku pexşankî nivîsiye, derbarê Xanî û berhema wî de agahiyan dide û dibêje ku, herçiqas li ser terza Fuzûlî çûbe jî Xanî xwediyê şêwazeke xwe ya resen e. Xwe wekî mutercîm û nazim dide naskirin (Toska, 2015, s. 115). Halis di wergerê de mudaxaleyî metnê kiriye, li hin ciyan kurt kiriye li hin ciyan lê zêdekiriye û li hin cihan li gor terza xwe gotin tercîh kirine (Tek, 2015).

2.1.1.2.2.25. Wergera Çend Goraniyên Folklorî Yên Navçeya Kirmanşahê Ji Bo Îngîlîzî

Micerson çend goraniyên folklorî yên navçeya Kirmanşarê A Southern Kurdish Folk Song ji devoka Kirmanşarî wergerandiye ser îngîlîzî û li 1909'an de li Londonê û di kovara Şahane a Komelî Asya de weşandiye. Piştê dubare li Bexdayê di sala 1918'ê de weşandiye (Pîrbal, 2002, s. 141).

2.1.1.2.2.26. Wergera Du Pirtûkên Pîroz Yên Êzdiyan Ji Bo Zimanê Elmanî

Prof. Maximilian Bittner, di sala 1913'an de li Viyanayê herdu pirtûkên pîroz yên êzdiyan bi kurdî, bi erebî û ligel wergera almanî bi navê Die Heiligen Buecher Der Jeziden weşandiye (Pîrbal, 2002, s. 141).

2.1.1.2.2.27. Wegera Çîrokên Navçeya Mêrdînê Ji Bo Elmanî

Hugo Makas di sala 1926'an de li Leningradê çend tekstên kurdî ku ji çîrok, destan û pendên pêşyan yê navçeya Mêrdînê pêk dihatin bi devoka kurmançî, bi navê *Kurdische Texte im Kurdmanji weşandiye* û hin ji wan wergerandiye ser zimanê elmanî (Pîrbal, 2002, s. 141).

2.2. Di Serdema Nû De Xebatên Wergerê

Ferhad Pîrbal gotina “serdema nû” ya wergerê ji sala 1898'ê pêve dide dest pê kirin. Ango li gel derketina yekem rojnameya kurdî *Kurdistanê* (1898-1902) dide dest pê kirin û di nivê sedsala 20'î de bi dawî dike (Pîrbal, 2002, s. 74). Bêguman destpêka çapameniya kurdan di wegera kurdî de serdemeke nû dide destpêkirin. Çimkî avabûna çapameniya kurdan, ji hêla kurdan ve bi hestên netewperwerî pêk hatiye. Wegera vê serdemê wek berê bi hestên olî an jî bi polîtîkayên dewletan û ne bi destê biyaniyan; bi hestên netewperweriya kurd û bi armancên polîtîk û ji hêla kurdan ve, zêdetir jî li ser rûpelên çapameniyê pêk hatiye. Lê di vê serdemê de wegera kurdî ji tenê hêla kurdan ve nehatiye kirin, xebatên mîsyoneran jî dewam kirine û gelek metnên ola xirîstyanî ji bo kurdî hatine wergerandin.

Geşbûna hesta netewî û rizgarîxwaziya kurd a di dawiya sedsala nozdehê û destpêka sedsala 20'î deberê kurdan daye xwendin û ronakbûn û rewşenbîrbûn û rêxistinbûyînê. Avabûna bi dehan rêxistinên siyasî û ronakbîrî û civakî li nava *Kurdistanê* û derveyê *Kurdistanê* jî pêngavek bû ji bo nizêkbûna ruhê şaristaniyeta cîran û Rojavayîyan. Hatina kurdan û rojhilatnasan ji bo welatê kurdan di dawiya sedsala 19'ê de; bi taybetî hatina Brîtanyayîyan ji bo *Kurdistanê* Îraqê di çarêka yekem a sedsala 20'î de ji bo kurdan deriyê tikiliyan bi gelên biyanî re vekiriyê.

Pêşketina tîkiliyan û bilindbûna asta ronakbîriya kurdan bi xwe re afrineriyek jî pêş xist ku damezirandina weşanxaneyên kurdî û serhildana bizava rojnamegeriyê; her wisa avakirina pirtûkxaneyên kurdî û bilindbûna asta xwendinê mîweyên wê afrineriyê ne. Sazbûna tîkiliyên xurt ên şaristanî û çandî ya di navbera kurd û ewropîyan de, anga di navbera wêjeya kurdî û wêjeya ewropî de bi taybet bi rêya Stenbolê pêk hat. Yanî serdema nû ya wêjeya kurdî bi vê çendê tê nasîn ku nivîskar û ronakbîrên kurd tîkiliyêke rasterast bi riya Stenbol û Qahîreyê li gel wêjeya Rojava û

şaristaniyeta Ewropayê danîn. Piştî avabûna vê pêwendiyê hêdî hêdî bandora vê şaristaniyê di çarîka yekê ya sedsala 20'ande derdikeve holê (Pîrbal, 2002, s. 76).

2.2.1. Wergerên Ji Zimanê Biyanî Ji Bo Zimanê Kurdî Di Serdema Nû De

2.2.1.1. Wergera Di Nav Rûpelên Çapameniya Kurdî De

Bêguman despêka vê serdemê, bi weşandina rojname û kovaran dest pê dika ku nimûneyên wergerê ji berhemê zêdetir wergerên nava nimûneyên çapameniyê ne û ew jî zêdetir bi armançeke xwe ya siyasî hebune. Ji ber vê yekê wergera ji bo kurdî nebûye projeyek an jî armançek û ji xwe bi xema dewlemendkirina edebiyatê nehatine kirin.

Ji sala 1908'ê pê ve li Stenbolê komek kovar û rojname bi zimanê kurdî hatin weşandin. Di hin ji wan de jî nivîsên wergerandî hatine weşandin.

2.2.1.1.1. Rojnameya Kurd Te'avûn ve Terakkî

Di Rojnameya Kurd (1908) de ku Pîremêrd sernivîskarê wêbû, ji bilî beyannameya Komeleya Teavun û Terakiyê û wergera helbestekê ji tirkî ji bo kurdî ku di nav nivîseke bi navê Makale-î Hikemiye de derbas dibetu werger tê de nîne. Beyanname ji hêla Pîremêrd (Süleymaniyeli Tewfiq) ve ji bo kurdî hatiye wergerandin (Bozarslan M. E., 1998, s. 57). Hem helbest hem jî wergera wê bê îmze hem ne ango nediyar e ku ji hêla kê ve hatiye nivîsîn û wergerandin (Bozarslan M. E., 1998, s. 204).

2.2.1.1.2. Kovara Rojî Kurd

Di Rojî Kurd (1913) de her çiqas çend nivîs hatibin wergerandin jî werger ji bo kovarê nebûye projeyek. Lê bi hin nivîsan peyama giringiya wergerê hatiye dayîn û hin nivîsên wegerkirî tê de hatine weşandin. Xelîl Xeyalî bi nasnavê X.Mûdanî helbesteke helbestvanê tirk Mehmed Akîf di hejmarê 2'yê de di rûpela 32'yê de ji bo kurdî wergerandiye (Mûdanî, 1913, s. 32). Di rûpela 82'an ya heman hejmarê de ev helbesta Hecî Qadirê Koyî hatiye belavkirin ku derbarê grîngiya wergerê de hatiye nivîsîn. Bi vê helbestê Koyî xwestiyenivîskaran teşwîqî wergerê bike.

Bêgane bi tercumeyî zûbanî

Esrarî kitêbî xelqî zanî (Koyî, 1913).

Gotareke miftiyê Misirê, Şêx Mihemed Abduhu, ji erebî ji bo kurdî hatiye wergerandin di rûpela 17 heta 20'yên hejmara 3'yê de hatiye çapkirin. Ev nivîs ji hêla Xelîl Xeyalî ve kunasnavê M...H... bikaraniye, hatiye wergerandin. (M..., 1913, s. 17-20).

Di gotareke bi zimanê kurdî di rûpela 21'êya hejmara 3'yê de ji kurdan dixwaz hatiye kirin ku ferhengek, pirtûkeke rêzimanê bê amadekirin û grîngiyê bidine wergerê û behsa pêdiviya wergerê dike.

2.2.1.1.3. Hetawî Kurd

Xelîl Xeyalî di hejmara 10'yê ya Hetawî Kurd (1914) de helbesteke şeş çarînî ya Tahir'ul Mewlewî ku bi navê xwe yî piştî qanûna paşnavê Tahîr Olgun (1877-1951) wergerandiye ser kurdî û weşandiye.

2.2.1.1.4. Rojnameya Kurdistan (Stenbol 1917-1918)

Ev rojnameya ku Sureyya Bedirxan sernivîskarê wê bû piraniya sergotaran ji tirkî ji bo kurdî hatine wergerandin. Her wisa hin caran jî hin gotarên tirkî ji bo kurdî hatine wergerandin. Xêncî van çalakîyên wergera kurdî yê destpêkê ku bi taybetî ji aliyê biyanîyan ve hatiye kirin, vê carê Kurdek, Kamûran Elî Bedirxan û keşeyê Dominikan Thomas Bois ku li Musulê dixebitî, li Beyrudê di sala 1947'an de beşa Încîlê Luqa bi tîpên erebî û latînî çap kirin. Dîsa di heman salê de Metelokên Hezrefî Silêman ji Îbranî wergerandine kurdî.

Di heman deme de jî pêwîste amaje bi wê çendê bikin ku hêj şîpela nêrîna klasik a wergerê neqediyaye. Wergera Încîl û tekstên Îslamî hêj berdewam e.

2.2.1.1.2. Wergerên Încîlê

Xebatên mîsyoneran ên li nav kurdan bêguman di vê serdemê de jî berdewam in. Ev werger dîsa wek berê bi armanca belavkirina ola xiristiyanî li nav kurdan, hatine kirin. Me bi rêya pirtûkxaneya Zanîngeha Cambridge'ê xwe gihand piraniya van wergeran. Mesûd Serfiraz jî tevî nusxeyên Cambridge'ê hin nusxeyên din jî dide.

Mesûd Serfiraz navnîşanên van çar wergerên li jêrê, destnîşan dike û li gor agahiyên ku ji Eric M. Nort û Kovara Kurdish Facts and West-Asian Affairs girtine dibêje ev Încîl ji hêla American Bible Society ve bi destê sê ermenên bi navê Amirkhanian, Der Gazarian û Abalahadian hatine wergerandin (Keskîn, 2013, s.

210). Ev her çar wergerên bi alfabeya ermenî hatine nivîsîn tevî navnîşana xwe ya pirtûkxaneyaya Cambridge'ê ev in:

2.2.1.1.2.1. Încîla Rabbê Me Hisos Kristos Ku Marqos Nivîsî:

Di sala 1911'ê de li Stenbolê, li Çapxaneyaya A.H.Boyacyan hatiye çapkirin û 87 rûpel e.

Navnîşan: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS. 509.
1.F.1

2.2.1.1.2.2. Încîla Rabbê Me Hisos Kristos Ku Luqas Nivîsî: Di sala 1911'ê de li Stenbolê, li Çapxaneyaya A.H. Boyacyan hatiye çapkirin û 148 rûpel e. Bi tîpên ermenî hatiye nivîsîn.

Navnîşan: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS. 509.
1. F11.2

2.2.1.1.2.3. Încîla Rabbê Me Hisos Kristos Ku Yanna Nivîsî: Di sala 1911'ê de li Stenbolê, li Çapxaneyaya A.H. Boyacyan hatiye çapkirin û 109 rûpel e. Bi tîpên ermenî hatiye nivîsîn.

Navnîşan: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS. 509.
1.F11.3

2.2.1.1.2.4. Xebatên Resûlan: Di sala 1911'ê de li Stenbolê, li Çapxaneyaya A. H. Boyacyan hatiye çapkirin û 138 rûpel e bi tîpên ermenî hatiye nivîsîn.

Navnîşan: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.509.
1.F11.4

Di salên 1920'î de meriv rastî wergerên Încîlê yê din tê ku nusxeyên sê hebên ji wan li pirtûkxaneyaya Cambridge'ê ne. Entîtuya Parîsê li ser malpera xwe kopiyeyaya van sê wergeran wek PDF belavkiriye.¹³ Ew Încîl tevî navnîşana xwe ya pirtûkxaneyaya Cambridge'ê ev in:

2.2.1.1.2.5. Încîla Îsayê Mesîh Li Ser Nivîsîna Matta:

Li Stenbolê, li çapxaneyaya Agop Matyosyan di sala 1922'an de hatiye weşandin û 104 rûpel e.

¹³<http://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pirtuk=1643>. (Dîrok: 10.02.2019)

Navnîşan: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.
509.1.F22.1

2.2.1.1.2.6. Încîla Îsayê Mesîh Li Ser Nivîsîna Markos:

Li Stenbolê, li çapxaneyê Agop Matyosyan, di sala 1923'an de hatiye çapkirin, ji rûpel 106'ê dest pê dibe û bi rûpela 167 diqede.

Navnîşan: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.509.
1.F22.2

2.2.1.1.2.7. Încîla Îsayê Mesîh Li Ser Nivîsîna Luqa:

Li Stenbolê, li çapxaneyê Agop Matyosyan, di sala 1923'an de hatiye çapkirin, ji 169'ê dest pê dibe û 271 diqede. Ev her sê wergerên Încîlê bi tîpên erebî hatine nivîsîn. Li ser bergê her sêyan jî heman agahî dinivîse:

Ji 'ezmanê eslî yûnanî hatiye tercûme kirin

Ji terefî Civata Kutuba Muqeddesî Emerîkayî

Di çapxaneyê Agop Matyosyan da hatiye çapkirin

Di Istanbûl da

Ji nivîsa li ser bergê jî diyar e ku ji hêla ABS'ê ve li Stenbolê hatiye weşandin. Herçiqas salên çapkirina wan cuda bin jî ji hejmara rûpelên wan tê fêmkirin ku ev Încîl berdewamên hev in. Ferhad pîrbal jî dema behsa van wergeran dibe vê yekê diselmîne (Pîrbal, 2002). Lê ne li ser pirtûkê, ne jî di nava pirtûkê de agahiyek derheqê vê meselê de heye.

Navnîşan: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.

509.1.F22.3

2.2.1.1.2.8. Încîlî Muqeddes Reb û Xilaskiryê Me, Yesu' Îsa

Ev Încîl di 4 nusxeyên serbixwe yên duv hev de hatine belavkirin. Ji zimanê yewnanî hatiye wergerandin: Încîla Markûs 53 rûpel e. Încîla Lukka 94 rûpel e, Încîla Matta 87 rûpel e. Încîla Yuhenna 72 rûpel e. ABS'yê ev Încîl wergerandine û belavkirine. Ev Încîl jî zimanê yewnanî jî bo kurdî bi devoka Mukrî di sala 1919'an

de hatine wergerandin û li New York'ê hatine çapkirin. Nusxeyên van wergeran li pirtûkxaneyaya Cambridge'ê jî hene.

Navnîşana Încîla Markus: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.509.3.F19.3

Navnîşana Încîla Yuhanna: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.509.3.F19.4

Navnîşana Încîla Matta: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.509.3.F19.2

Navnîşana Încîla Luka: University Library Order in Rare Books Reading Room BSS.509.3.F19.4

Ferhad Pîrbal jî behsa van wergeran dike û van agahiyan diselmîne (Pîrbal, 2002, s. 85).

2.2.1.1.3. Xebatên Wergerê Li Kurdistana Îraqê

2.2.1.1.3.1. Du Gavên Girîng Di Pêşketina Bizava Wergera Kurdî De

Gava yekem ew e ku di 12.02.1926'an de, nûnerê bilind yê Brîtaniyayê di nameyeke nihênî de pêşniyarî li serokwezîrê Îraqê dike ku nivîsgeheke wergerê ya kurdî li Bexdayê bê vekirin. Her wisa wergera qanûn û pirtûkên dibistanê jî bi kurdî bîn çêkirin. Di encamê de ev pêşniyaz ji hêla Rêveberiya Giştî ya Perwerdê hat bicîanîn û lijneyeke wergerê hate damezirandin. Ev hewla, di rojnameya Jiyanê de, di hejmara 9'ê di 18'ê Adara 1926'ê de deng vedaye.

Wekî din xwendekarên kurd jî di çarçoveya vê planê de ji derveyî welêt tîn şandin. Bêguman şandina xwendekarên kurd ji bo derveyî welêt bi armanca xwendinê, derfet diafirîne ku ciwanên kurd di pêşerojê de hînî zimanên nû yên rojavayî bibin û wergera wan zimanan ji bo kurdî bikin. Bi wî awayî jî, ji sala 1926'ê pêve hewleke şêlgêrane û fermî ji aliyê hikumetê û nûnerên kurd ve hatiye dayîn. Bi vê armançê zemîn tê amadekirin ji bo wergerê û hînbûna zimanê biyanî zêde dibe û asta xwendinê bilind dibe (Pîrbal, 2002, s. 100).

Gava duyem jî ew e ku roja yekê Hezîrana sala 1928'an, Emîn Zekî Beg bi îmzeya xwe û parlementerê Hewlêrê Ebdulla Muftî, parlementerê Silêmaniyê

Muhemmed Salih û parlementerê Kerkûkê Seîd Wendawî, Îsmâîl Rewandizî û Merûf Ciyawik nivîsek pêşkêşî wezareta perwerdê ya Îraqê kirin. Di vê nivîsê de ev daxwaz kirine:

1. Komeleyek bê avakirin ji bo afirandin û wergerandina pirtûkên dibistanan ji bo zimanê kurdî û her kesê ku li ser fermana wezareta maarîfê, pirtûkekê bike kurdî bi 500 rûpiyî bê xelatkirin.

2. Gihandina mamosteyan

3. Li herêma Kurdistanê daîreyên maarîfê bîn vekirin û pêwîste ew jî li nîveka herêmê bin.

4. Pêwîste ku li herêmê dibistana darelalemîn bê vekirin

5. Ji bo jinan jî dibistan vebin (Pîrbal, 2002, s. 102).

Di heman demê de di wan salan de, carcaran pirtûkek an jî çend pirtûk hatine wergerandin, bi taybetî pirtûkên wêjeyê û yên dibistanan. Hin ji wan ev in:

Şêx Nûrîyê Şêx Salih di sala 1925'an de çarîneyeke helbestkarê frensî Marî Joseph ji erebiyê werdigerîne kurdî û li weşanxaneya Şaredariya Silêmaniyê bi navê Goranî Kurdî diweşîne. Wergereke din ya Încîlê ye ku ji zimanê erebî ji bo zaravayê Kirmanşanî hatiye wergerandin û di sala 1926'an de li Londonê hatiye weşandin. Di heman salê de komek babet û çîrokên dînî ji aliyê Mîrza Ezîz Zendiye ve, bi navê Îrşad Elmeznebîn, ji zimanê îngîlîzî ji bo kurdî hatiye wergerandin û li Mihabadê hatiye belavkirin (Pîrbal, 2002, s. 102). Huseyn Husnî Mukriyanî di sala 1928'an de li Rewandizê pirtûkeke frensî werdigerîne kurdî û navê Bexêwkirdinî Kirmî Awrêşim (Xwedîkirina Kurmê Hewreşimê) li weşanxaneya Zarî Kurmancî li Rewandizê diweşîne. Mamosteyê Medreseya Rewandizê Ebdulla Elî Hîkmet bi navê Dersên Eşyayan ji bo xwendekarên pola 4 û 5 an wergerandiye û li ser esasê wan ders hatiye dayîn. Wekî, din bi navê Xîweyî Razan pirtûkek hatiye wergerandin. Pirtûk 140 çîrokan li xwe digire. Çîrok bi soranî hatine nivîsîn. Têkilî her çîrokekê wenekek heye. Çîrok ji hêla Mîrza Hesên Kurdistanî ve hatine wergerandin. Ev pirtûk ji bo pola 4 û 5'an e. Di sala 1929'an de Ebdulrehîm Norî pirtûka pola şeşan a bi navê Kitêbî Eşyayî werdigerîne kurdî û diweşîne. Di sala 1930'î de ji aliyê Seîd

Sidqî Kaban ve û bi hevkarîya Seîd Nûrî Berzencî ve çend pirtûkên din jî ji bo kurdî tîen wergerandin (Pîrbal, 2002, s. 103).

Mela Reşîd Bebê Baban, di sala 1920'î de li Stenbolê hedîsên Muslîm û Buxarî wergerandine ser zimanê kurdî. Di destpêka wergerê de wiha nivîsiye:

Ez ku evdekî xizan û gunehkar im bi harikariya Xwedê dest bi wergera Necmeî Elbehreynê dikim. Tam 22 heyv in ku min dest bi wergera Muslim û Buxarî kiriye. Îsal di 12'ê muheremê de ji xwedê re şukir bi dawî bû (Pîrbal, 2002, s. 104).

2.2.1.1.3.2. Wergera Şanoyan

Ji bilî van jî bizava wegera şanogeriye û nîşandana şanoyên wegerandî, bandoreke mezin li ser pêşveçûna bizava wergera kurdî kiriye. Şanoyên ku hatine wergerandin û li Kurdistanê hatine nîşandan li gor salên wan ev in:

Di payîza 1921'ê de nivîsandina xwemalî ya şanoya kurdî ya Mektebekan li Kurdistana Îraqê bi navê Selaheddînê Eyûbî tê pêşkêşkirin. Ev şanoya bi destê Necîb Hedad hatibû nivîsîn, ji pênc perdeyên pexşankî û helbestkî pêk hatibû û ji novela The Talisman a nivîskarê Skotî Walter Scott hatiye wergerandin.

Grûbeke şanoya Misirî bi serpereştiya Beşare Wakîm, li Silêmanî û bajarên din yê Kurdistanê şano li dar xistin. Li gor Ferhad Pîrbal ev şano di 1923'an de ji erebî hatiye wergerandin.

Ferhad Pîrbal, behsa pêşkêşkirina şanoyeke bi navê Cotebira ku di sala 1926'an de ji hêla Teqî El-Dîn Lubnanî ve li Silêmaniyê ku di vê salê de hatiye pêşkêşkirin dîke lê derheqê wergerandina wê şanoyê nake. Ango nabêje ka kê ev şano wergerandiye ku ev şano bi kurdî hatiye pêşkêşkirin. Di 27 û 28'ê Tîrmeha sala 1927'ê de şanoya bi navê Nîron ku ji hêla Muhemmed Lutfî Cem'eyî yê Misirî ve hatibû nivîsîn ji aliyê Fûad Reşîd Bekir ve ji erebî hatiye wergerandin. Grûpa Mektebî Tefzîlî Ehlî ku bi serpereştiya Heqî Elşîblî di sala 1924'an de li Bexdayê hatibû damezirandin li havîna 1929'an de hatibû Hewlêr û Silêmaniyê. Li Hewlêrê 3 şano pêşkêş kirine. Şanoya yekem ya Selaheddîn Eyyûbî ji hêla Necîb Hedad ve, ya duyan Fî Sebîlîllah ku ji aliyê Fransûva Kurbiye ve hatibû nivîsîn û ya sêyem jî Siltan Ebdulhemîd e ku ji aliyê Wedad Îraqî ve hatiye nivîsîn ji hêla Helîm Demos ve

hatine wergerandin. Di meha Adara sala 1930'î de şanoya kurdî ya Mektebeka bi navê Selaheddîn Eyyûbî ji bo cara duyem ji aliyê Lijneya Fen û Temsîl li dibistana Erbîl'ê, bi derhêneriya Ebdulmecîd Hesên dubare hat nîşandan. Wêneyekî vê şanoyê ji aliyê Bedîrxan Elsendî ve di rojnameya Îraqê de hatiye belavkirin. Ev şanoya heta çend rojan hatiye pêşkêşkirin. Ev şano ji hêla Necîb Hedad ve hatiye nivîsîn, ji 5 perdeyên pexşankî û helbestkî pêk hatibû û ji şanoya Ev şano ji hêla Necîb Hedad ve hatiye nivîsîn, ji 5 perdeyên pexşankî û helbestkî pêk hatiye û ji şanoya Le Talisman a nivîskarê Skotlandî Walter Scottî hatiye wergerandin (Pîrbal, 2002, s. 106-109).

2.2.2. Wergera Ji Kurdî Ji Bo Zimanên Biyanî Di Serdema Nû De

Destpêka wergerê ya serdema nû wek ya ji zimanê biyanî ji bo kurdî, ya ji kurdî ji bo zimanên biyanî jî bê guman li ser rûpelên rojname û kovaran dest pê kiriye.

Rojnameya Kurdistanê (1917-1918), ku Sureyya Bedîrxan sernivîskarê wê bû, piraniya sergotarên xwe ji zimanê tirkî wergerandibû ser kurdî. Dîsa hin caran jî ji zimanê kurdî wergerandibûne ser zimanê tirkî. Gotareke bi zimanê kurdî di rûpela 21'ê ya hejmara 3'an de daxwazê dike ku kurd girîngiyê bidine wergerê û dibêje ku pêdiviya me bi wergerê heye. Di nav çapameniya kurdan ya wê demê de kesê werger jî xwe re kiriye xem bêguman yek jê Mihemed Mîhrî ye. Lê Pîremêrd û Xelîl Xeyalî jî di vî warî de xwedan ked in.

Pîremêrd li Stenbolê di Kovara Jînê de (1918-1919) çend helbestên kurdî bi awayekî helbestkî werdigerîne tirkî. Wek mînak malik bi malik helbesta Qurbanî Tozî Rogetim ya Nalî wergerandiye tirkî û di hejmara 6'an a kovara Jînê de belav kiriye. Pîremêrd di heman demê de di kovarên Muhîtê Musewer û Şefqî Sirx de helbest û babetên kurdî wergerandiye ser zimanê tirkî û farsî. Pîremêrd bixwe jî qala vê ezmûna xwe dike. Her wisa çend parçe helbestên din yên kurdî jî di vê serdemê de ji bo farisî hatine wergerandin.

Di kovara Kurdistanê de, bi taybet ji aliyê Muhemed Mîhrî ve hin helbestên klasîk yên kurdî ji bo tirkî hatine wergerandin. Mihemed Mîhrî ev werger li gor plansaziyekê çêkirine. Mîhrî armanca xwe di kovara Jînê de wiha tîne zimên:

KÜRD EDEBİYATINDAN BAZI ÖRNEKLER I

Yukarıdaki başlık, birçok kimselerin gözünde hayrete yol açan ve birtakım beyinlerde fazla bir şaşkınlık yaratan bir cümledir. Çünkü Müslüman milletler ve topluluklar arasında var olan gaflet ve yanıltma ve geleceğe ilişkin üzüntü ve kaygının bulunmayışı yüzünden, bir ırkın yalnız edebiyatı ile dili değil ve fakat aynı zamanda bütün varlığı dahi unutulmuşluk perdesi altında bırakılmıştır. İslâm dünyasının her tarafında perişan olan toplulukların ve ırkların yürek yakıcı hal ve durumları, bu iddianın ispatı için inandırıcı bir kanıt olduğu gibi, Halifeliğin merkezi ve bütün İslâm dünyasının bilim ve kültür kaynağı olan İstanbul kentinde erdemli, bilgili ve Kürdistan'da yıllarca genel hizmetler yerine getiren ve binlerce nüfusu yöneten birçok zatlardan "yahu, Kürd edebiyatı var mı, Kürd dili edebiyata elverişli mi?" gibi ham ve şaşkınlık veren soruları işitmek, yukarıda belirtilenlerin doğruluğunu kanıtlayan kesin bir kanıttır. İşte duacıları da, bu sorulara karşılık Kürd, Goran ve Kurmanc şiveleri üzerine saygıdeğer kimselerin edebiyatından ve halkın şarkılarından birkaç gazel, beyit, stran, goranî, lawje, hayran, lawik ve bêriteleri yazıp çevireceğim ve "Jîn" dergisi sayfalarında sayın okuyuculara sunacağım (Bozarslan M. , 1985).

Mihemed Mîhrî bi vê armancê di bin serenavê "Edebiyat-î Kürdiyeden Ba'zî Numuneler" de di kovarên Jîn û Kurdistanê de pênc nivîsan diweşîne. Di van nivîsan de helbestên Mistefa Begê Kurdî, Nalî, Melayê Cizîrî û stranên gelêrî bi awayekî pexşankî wergerandine ser tirkî. Di sala 1922-1923 ji hêla Mihemed Mîhrî ve bi navê Mukaddîmet-ul Îrfan berhemek hatiye nivîsandin. Di vê berhemê de gotareke bi zimanê tirkî di derbarê ferhengeke kurdî-tirkî-erebî-farisî-frensî de hatiye weşandin. Her wisa behsa zaravayên cur bi cur yên kurdî dike û bi hev re dide berawirdkirin (Pîrbal, 2002, s. 145).

Piştî wan jî helbestvanên nûjen, Mistefa Şewqî hin ji helbestên xwe wergerandiye ser zimanê tirkî û di hejmarên 5-6'an yên vê kovara Kurdistanê de belav kiriye. Bi vî awayî jî dibînin ku wergera wêjeya kurdî bi taybet helbesta kurdî ji bo zimanê tirkî ciheke baş li ser rûpelên kovara Kurdistanê cî girtiye. Ew jî bi vê

armancê pêkhatiye ku nasnameya ronakbîrî û netewî a kurdan li cem xwendevan û ronakbîrên tirk û yên din eşkere bibe û bê selimandin.

Her wisa di nava rûpelên rojnameya Havadîs, rojnameya Şark ve Kürdistan û rojnameya Necmeyê bi zimanên biyanî weşan dikirin, çend babetên wergerandî ji kurdî ji bo zimanên biyanî hatibû kirin (Pîrbal, 2002, s. 147).

2.2.2.2.1. Hîngerê Zimanê Kurdî Rehbera Zimanê Herdu Kurdî: Kurmancî-Babanî

Cemiyeta Hêvî piştî Şerê Cihanê ye Yekem ji nû ve dest bi xebatê dike û di vê dewra duyem de xebata wan a herî mezin Hîngerê Zimanê Kurdî ye. Di 1921'ê de Cemiyeta Hîvîyê Civata Telebeyê Kurdistanê, pirtûkeke bi navê Hînkera Zimanê Kurdî weşandiye ku li Stenbolê û di weşanxaneya Necm-î Îstîqbal de hatiye weşandin. Hînkera Zimanê Kurdî ku 65 rûpel e. Bi tevahî ji 15 dersan pêk tê. Ji bilî dersan 13 rûpel jî ji bo metnên xwendinê hatine veqetandin. Berhem bi kurmancî û soranî û tirkîya osmanî hatiye amadekirin. Di rûpelên 2, 3, 4 de bi herdu zaravayên soranî û kurmancî destpêkeke bi înzaya Hêvî di derbarê pirtûkê de û derbarê hînbûna kurdî de hatiye nivîsandin. Di heman demê de ji bo zimanê tirkî jî hatiye wergerandin. Armanca vê pirtûkê ew bû ku kurdî hîn kurdên tirkîzan bikin. Bi wergera tirkî jî xwestine harîkarî bidin wan kesên ku zimanê xwe nizanin ku zimanê xwe hîn bin (Pîrbal, 2002, s. 147). Ev yek li ser bergê, bi gotina “Kürdce öğrenmek isteyenlere lisân rehberidir. / Ji kesên dixwazin hîn kurdî bibin re rêbera ziman e” hatiye diyarkirin. Wekî ku di destpêkê de jî hatiye diyarkirin, zêdetir armanc hînkirina axaftina kurdî ye, ji ber vê yekê jî grîngî nedane rêziman û rastnivîsê. Wekî ku ji navê wê jî tê fêmkirin pirtûk du zaravayî ye. Di pirtûkê de hemû hevok û nivîs ji bilî tirkîya osmanî, bi kurmancî û babanî /soranî ne. Girîngiyavê kitêbê ev e ku Hîngerê Zimanê Kurdî, yekemîn pirtûka hînkirina zimanê kurdî ye ku ji hêla saziyeke kurdan ve hatiye amadekirin û weşandin. Pirtûk bi “Bir İki Söz/Çend Gotin/Çend Qiseyek” dest pê dike. Paşê jî ders ders dewam dike. Beşa dawî ya pirtûkê “Birkaç Mükâleme / Çend Peyivîn / Çend Qise” ango diyalogên rojane ne. Di rûpelê dawî de jî rastiya xeletiyên çapê hatine rêzkirin. Nivîskar an jî amadekarê Hîngerê Zimanê Kurdî nediyar e. Ji ber ku li ser pirtûkên navê tu kesî tune (Keskin, 2013, s. 163). Ferhad Pîrbal dema behsa vê pirtûkê dike pê re behsa zimanzanî û

hêza wergeriya endamên komelê Fûad Temo, Memdûh Selîm, Muhemed Mihrî û Mistefa Şewqî dike û dixwaze amaje bi vê yekê bike ku ev pirtûk dibe ku ji hêla van kesan ve hatibe amadekirin (Pîrbal, 2002, s. 147).

1.1.2.2.2. Werger Li Ermenîstana Sovyetê Di Salên 1920'î De

Piştî Şoreşa Oktobirê (1917) ya Rûsyayê di jiyana kurdên Soviyetê de guherînên mezin çêbûn. Ermeniyên di çarçoveya qanûnên Ermenîstanê de serbestiya nivîsandinê îlan kir. Di heman demê de bi fermana Lenîn, hukumeta ermenan rê dane kurdan ku bikaribin bi kurdî bixwînin û binivîsin û kurd bi belavok û dibistanên xwe hebin. Bi kurtasî ji sala 1917'an pêve li Ermenîstana Sovyetê girîngiyeke mezin ji bo pêşketina kurdî û belavkirina wêje û nivîsandina kurdî hat dayîn. Nivîskarê ermenî kurdnas Agob Gazariyan Lazo, di sala 1921'ê de li Êçmiyadzînê li nêzikî Rewanê alfabeyeke krîlî ji bo kurdî çêkir. Ev alfabeya di pirtûkeke bi wêne de bi navê Şems de weşand. Pirtûka Şems ji sala 1921'ê pêve li Ermenîstana Sovyetê bû bingeha nivîsandina kurdî. Gelek pirtûk û belavok pê hatin nivîsîn û hatine weşandin. Wekî din gelek dibistanên kurdî yê wekî Dibistana Lazo û Dibistana Dersên Kurdî hatin vekirin. Di wan dibistanan de zimanê kurdî bi alfabeya ermenî dihate xwendin û nivîsîn.

Paşê alfabeyeke latînî ji aliyê Erebe Şemo û Îsaq Maragulov ve ji bo kurdan hate amadekirin û ev alfabe kete şûna alfabeya ermenî. Ji 01.01.1930 pêve ev alfabe bi awayekî fermî hate bikaranîn. Heta dawiya sedsala 20'î 44 dibistanên kurdî li ser axa Yekitiya Sovyetê hatin damezîrandin. Bi qasî ku em ji Ferhad Pîrbal hîndibin, çîroka yekem ya li Ermenîstanê ku wek pirtûk hatiye wergerandin Çîroka Serhatiya Casim e ku Heciyê Cindî û Emînê Evdal ji berhemeke Lazo ya bi ermenî wergerandine kurmancî. Ev çîrok 32 rûpel in û bi tîpên latînî li Rewanê di sala 1931'ê de hatiye weşandin (Pîrbal, 2002, s. 109-111). Ji bilî wê rojnameya Rêya Teze, bandoreke baş li ser bizava wergerê kiriye. Lê ji ber nebûna derfetan, me neşiya di warê vê qonaxê de lêkolîneke berfireh bikin. Lê em bawer in ku bi vekolînan wê cewhera vê qonaxê derkeve holê.

NIRXANDIN

Dema meriv berê xwe dide têgeha peyva wergerê tê dîtin ku werger veguherîna tişt, rewş an jî wateyê ya li ser tişt, rewş an jî wateyeke din e. Yanî tiştê vediguhere ser tiştê din. Ev veguherîn di civakan de bi bûyerên girîng geş dibin û alav didin. Derketina bizavên wergerê jî bi têkiliyên gelan ku hin ji wan ji ber şeran û rewşên siyaysî, hinek ji wan ji ber xela û koç û bazirganiyê çêbûne.

Di dîroka mirovahiyê de çar gavên girîng çê bûne ku bi van gavan debizava wergerê geş bûye û werger pêş ketiye. Gava yekem ew e ku ji 600'ê B.Z. dest pê dike û heta salên 400'î P.Z. dewam dike ku ji sumerî, fenîkeyî û misirî werger ji bo zimanê grekî hatine kirin. Bi van wergeran, daneheva qedîm a beriya wan derbasî nav grekan bûye û bayê zanistê li nav grekan belav bûye. Gava duyem jî geşedana di navbera sedsala 8 û 10'an de ya di nav alema îslamê de ye. Di vê serdemê de misilmanan berhemên ji pehlewîkî, suryankî û grekî ji bo erebî wergerandine û gelek sazî ji bo karê wergerê avakirine. Gava sêyem jî ew e ku di sedsala 12'an de pîştî têkiliyên misilman û xiristyanan bayê zanistê yî nav misilmanan bandor li gelên Rojavayê kiriye û Rojavayîyan berhemên erebî wergerandine ser zimanên Rojavayî ku wê serdemê, bingeha zanista îro avakiriye. Gava çarem avabûna zanista wergernasiyê ya pîstî salên 1970'î ye. Di vê serdemê de ji pratîka wergerê zêdetir teoriya wergerê derdikeve pêş û li ser terz û rê û rêbazên wergerê fikir derdikevin holê. Van her çar gavan jî bandoreke mezin li ser pêşketina zanist û fikrê kirine ku guherînên mezin li ser rûyê cîhanê çêkirine.

Ji van gavan ku ya di wê serdemê de bandor li ser wergera kurdî kiribe bê guman gava duyem a ku di nav misilmanan de geş bûye ye û gava çaran e ku bi kadîbûna cîhanê bandor li her aliyê cîhanê kiriye. Dema meriv berê xwe dide wergera nivîsa kurdî ku mînakên wê di sedala 17'an de derdikevin pêş me, gelo meriv dikare di navbera wê û dîroka wergera cîhanê de têkiliyekê deyne an na?

Li Cîhanê wergerên ewil bi piranî wergera metnên olî ne ku li rojavayê Cîhanê jî wergerê bi wergera Încîlê dest pê kiriye. Wergera kurdî li gorî vê qaîdeyê nebûye. Wekî li jor jî hat qalkirin mînakên ewil ên wergera nivîsa kurdî di sedsala 17'an tînin dîtin ku wergera çend stran û hevokên kurdî ji bo tirkî ne û ji hêla Ewliya Çelebî ve hatine kirin. Pişt re meriv rastî wergerên Xanay Qobadî tê ku wek wergera

ewil a ciddî tên dîtin û ev wergerên edebî ne. Ango kurdan wek Rojavayîyan pirtûka xwe ya pîroz a olî wernegerandine ser zimanê xwe, wergera Quranê nebûye mijara wergera kurdî.

Dema meriv berê xwe dide wergerên gelên cîranê kurdan ên wek tirk û faris ku van gelan jî wek kurdan pişt re ola îslamê qebûl kirine, ji bo hînbûna ola îslamê metn û ayetên pîroz yê olî wergerandine ser zimanê xwe û gelek pratîkên wergerê di nav de çê bûne. Her çiqas dîroka nivîsa kurdî û perwerdeyê di nav kurdan de kevntir be jî werger dereng ketiye nav nivîsa kurdî. Wergeren ewil ên metnên olî rastî sedsala 19'an tên. Belku ev yek ji ber nebûna desthilatdariyeke kurdan a xurt û terza perwerdehiya nav kurda be. Çimkî di medreseyên kurdan de ewil zimanê erebî dihate hînkirin û pişt re ola îslamê ji pirtûkên erebî dihate hînkirin û îxtîmaleke mezin ji ber vê yekê zêde hewceyî wergerê nedîtîbin an jî nebûna desthilatê berê kurdan dabe zimanê desthilatan. Ji xwe beriya qebûlkirina ola îslamê, meriv rastî xebatên kurdan ên wergera nivîskî jî nayê.

Bi kurtasî meriv dikare bêje di dîroka wegera kurdî de, di serî de werger nebûye plan û proje an jî bandor ji bizavên wergera cîhanê negirtiye. Wergerên ewil çê bûne jî bi hewldanên kesane çêbûne ku ew kes jî kesayetên edebî bûne.

Dema meriv berê xwe dide xebatên wergera kurdî, di dîroka wergera kurdî de geşedanên wergerê bi şeş gavên grîng derdikevin holê. Gava yekê ew e ku wergerên dema mîrektiya Erdelanê ne û ji bo wergera kurdî bi cihê xwe yî girîng heye. Ev wergerên hatine kirin, her çiqas kêr bin jî, wergerên edebî ne. Bêguman Xanay Qobadî di vê serdemê de xwedan roleke mezin e. Meriv dikare bêje destpêka wergera kurdî wekî gelên din bi wergera metnên olî dest pê nekiriye, her çiqas piştî demekê rola wergerên olî zêde bibe jî.

Gava duyan, xebatên mîsyoner û kurdnasên Rojava ne di çarçoveya bernameyan de ev xebat hatine kirin. Di sedsala 19'an û serê sedsala 20'î de ji bo xebatên mîsyoneriyê demên gelek grîng in. Di van deman de xebatên mîsyoner gurtir û xurttir in. Sedema vê yekê jî ew e ku di vê demê de kapîtalîzm veguhezî emperyalîzmê û ev kêrî mîsyoneran hat. Çimkî mîsyoneran hem karê xwe yî esas ku belavkirina ola îsevî bû, dikirin hem jî ji bo dewletên Rojava li ser herêmên lêbûn agahyên cografîk, ekonomîk û sosyolojîk û hwd. berhev dikirin û dewletan jî ji hêla

aborî ve pişgiriyeke mezin didan wan. Ji ber vê, divê neyê jibîrkin ku meseleya mîsyoneran ne tenê belavkirina olê bû, bi aliyê xwe yî siyasî, civakî, ekonomîk jî hebû. Ji ber şkestina hêza Dewleta Osmanî û zêdebûna kapîtulasyonan Rojhilata navîn hedefa wan a sereke bû. Amûra mîsyoneran a sereke jî xwendin, nivîsandin û matbaa bû. Biçûna ku derê, derheqê wir de dane berhev dikirin, werger dikirin bi taybetî pitûk û metnên olî werdigerandin zimanê herêmên ku lêne, da ku hem ola xwe bi cî bikin hem jî armancên xwe yên din bînin cî. Xebatên wan ên li ser wergera kurdî jî di çarçoveyê de hatine kirin.

Her çiqas wergerên wan bi vê armancê hatibin kirin jî xebatên wan di nav dîroka wergera kurdî de bi ciyekê xwe yî girîng hene. Belku xebatên wergera kurdî yên bi rêk û pêk ewil ji hêla van kesan ve hatine kirin. Pirrê wergerên wan jî metnên ola îsevî ne. Wergêrên vê bizavê kesên biyanî bûn ku piraniya wan jî rojavayî û xelkê Ewropayê bûn an kurdnas an jî rojhilatnas bûn lê di heman demê de mîsyoner jî bûn û siyasîmedar û erdnîgarnas, dîplomat, qonsol jî bûn. Ji ber ku armanca wan ji wergeran armanceke wêjeyî an hunerî nîn bû û armancên wan ên siyasî û dînî hebûn wergerên wan qels in. Bi qasî ku têra wan bike wergerandine. Werger ji kurdî ji bo zimanên rojavayî yên wek firensî, îtalî, elmanî, îngîlîzî û rûsî hatine kirin. Piraniya wan wergeran di derbarê mijarên weke folklor û zimanzanî û edebiyata neteweyî ya kurdan bûn. Dema meriv van wergeran bi wergerên cîhanê re qiyas dike, ev werger ji hêla rêjeyê ve pir kêmtir in, ji hêla çawaniyê ve jî ne wisa xurt bûne ku têra pêdiviyên ronakbîrî yên serdemê bikin. Ji xwe bandor li ser pêşketina ronakbîriya kurdan jî nekiriye. Belku tenê bandor li çend kesên ku alîkarî dane wan kiribe.

Gava sêyan ya geşbûna wergera kurdî, wergera metnên ewil ên olî yên îslamî rastî sedsala 19'an tînin ku ev werger, wergera mewlûdname û eqîdenameyan e. Taybetmendiyên van wergeran ew in ku wergêrên ku berhem wergerandine ser zimanê kurdî, kurd bûne û bi piranî zilmên dînî yên wek mela, şêx û mutesewwif bûne. Armanca wan ji van wergeran armanceke wêjeyî an jî hunerî nebûye lê belê armanceke wan a olî hebûye ku li nav kurdan bawerî û çanda îslamî belav bikin û xurt bikin. Piraniya pirtûkên hatine wergerandin ji zimanê erebî hatine wergerandin. Di dema wergera wan de jî wergêran pir caran amaje bi wê çendê nekiriye ku ev nivîs werger in; amaje bi çavkaniyan jî nekirine. Ev pirtûkên wergerandî di bin

bandora hevok û peyvên zimanê erebî de ne. Ji bilî mewlûda Melayê Bateyî, ev berhemên wergerandî pirtir li Kurdistana Îraqê belav bûne û piranî ji bo soranî û hemî bi alfabeya erebî hatine wergerandin.

Gava çarem bi avabûna çapameniya kurd destpê dike ku bi werger cara ewil bi armancên polîtîk di nav kurdan de derdikeve. Heta vê serdemê werger bi armancên cuda cuda hatine kirin ku ev armanc ne bi hesteke netewperwerî bûne. Vê carê werger bi hestên netewî hatine kirin, armanc pêşxistin û dewlemendkirina zimanê kurdî ye.

Wergerên vê bizavê li ser rûpelên kovar û rojnameyan dest pê dike û piranî li ser rûpelên kovar û rojnameyan dewam dike. Ev jî ji du helan ve pir girîng e. Ya yekem komek têgehên nû û peyvên nû û kompeyvên nawêze di bin bandora zimanên Rojavayî û cîranan ketin nav zimanê kurdî ya nivîskî û zimanê kurdî dewlemend kir. A duyê jî hestê xwendevan û ronakbîran ê derbarê pêwîstiya haydarbûna ji rewşa ronakbîriya cîran û Ewropîyan xurt kir. Ev yek bi zelalî di wêjeya wê serdemê de reng vedide û dibe bingehek ji bo alagorên ronakbîrî yê dahatûyê. Di vê serdemê de hêj bi gelemperî werger ji bo kurdî qels e. Çimkî werger li ser rûpelên çapameniyê tê kirin. Lê hewldanên wergerê yê Kamûran Elî Bedirxan, Mihemed Mîhrî, Xelîl Xeyalî û Pîremêrd, pir bi qîmet in. Hecî Qadirê Koyî jî bi çend risteyan xwestiye grîngiya fikra wergerê di nav ronakbîr û rewşenbîran de çê bike û berê wan bide wergerê.

Gava pêncan jî ew e ku di sala 1926'an de, bi daxwaza nûnerê bilind yê Brîtanîyayê, bi pişgiriya hukumeta Îraqê nivîsgeheke wergerê ya kurdî li Bexdayê tê vekirin. Wekî din xwendekarên kurd ji bo welatên biyanî tê şandin. Bêguman şandina xwendekarên kurd ji bo derveyî welêt bi armanca xwendinê, derfet diafirîne ku kurd di pêşerojê de hîn zimanên nû yê rojavayî bibin û wergera wan zimanan ji bo kurdî bikin.

Bi wî awayî jî, ji sala 1926'ê pêve hewleke şêlgêrane û fermî ji aliyê hikumetê û nûnerên kurd ve hatiye dayîn. Bi vê armancê ji bo wergerê zemîn hatiye amadekirin û hînbûna zimanê biyanî zêde bûye.

Di Hezîrana sala 1928'an de, Emîn Zekî Beg bi îmzeyaya xwe û parlementerê Hewlêrê Ebdulla Muftî, parlementerê Silêmaniyê Muhemmed Salih, Muhemmed Caf

û parlementerê Kerkûkê Seîd Wendawî nivîsekê pêşkêşî Wezaretê Perwerdehiyê ya Îraqê dikin. Di vê nivîsê de daxwaza perwerdeya kurdî û wergerandina pîrtûkên dibistanan tê kirin. Ev daxwaz bê bersiv namînin û gelek dezgehên kurdî tên vekirin û gelek werger ji bo kurdî çê dibin. Di wan salan de, ji bo pêşxistina perwerda bi kurdî bi taybetî pirtûkên dersan û yên wêjeyî ji bo kurdî tên wergerandin. Meriv dikare bêje ev gava yekê ye ku wegera ji bo kurdî ji aliyê dezgeyekî hukümetekê ve tê destekirin.

Gava Şeşan ew e ku ji destpêka salên 1920'î heya destpêka salên 1930'î bizaveke şanoyê derdikeve û gelek şano ji bo kurdî tên wergerandin û li Kurdistanê Îraqê tên pêşkêşkirin. Ew cara yekem bû ku bi awayekî rêk û pêk şanoyên biyanî werdigerîn ser kurdî û dihatin pêşkêşkirin.

Heta sedsala 19. zimanê kurdî li ciyên ku lê bandora desthilatan kêma bûye, pêş ketiye. Heke em serdema dawî jê derxin, li gor konjektura serdema Osmaniyan, siyaseta desthilata Osmaniyan xwe mecbûrî mudaxaleya zimanê kurdan nedîtiye. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem ku dewleta Osmanî belav bû li her hêleke welêt desthilatîyên Rojavayîyan avabûn. Ji bo dewletan sînorên nû ava kirin û qismekî welatê kurdan xistin nav sînorê Îraqê û li wir jî îngîlîz bûn desthilatdar. Siyaseta îngîlîzan ya li ser zimanê kurdî jî têkildarî konjektura demê bû. Ji ber ku kurdan wê demê hem li hember Tirkiyê hem jî li hember Îraqê daxwaza serxwebûnê dikirin, îngîlîzan jî siyaseta xwe ya li ser zimanê kurdî li ser guherbariya rewşa kurdan a siyasî dikirin. Carinan pêşî li zimên vedikirin carinan jî pêşî li zimanê kurdî digirtin. Nûnerên îngîlîzan yên li welatên kurdan peywirdar bûn, ji bo ku hestên netewî yên kurdan derxin pêş dixwestin û ji Tirkiyê û Îranê dixwestin ku kurdî bikin zimanê nivîsê. Li Îraqê jî nexwest hestên netewî di nav kurdan de belav bibe, çimkî li wir desthilatdarî di destê îngîlîzan de bû. Bi domana demê re konjektur guherî meseleya tayînkirina qedera Musulê serê îngîlîzan dêşand. Vê carê girîngiya kurdan ji bo îngîlîzan zêde bû. Piştî ku hêzên navnetewî Musul bi şertê dayîna hin mafên kurdan, dane Îraqê; hukûmeta îngîlîzan garantiya pêkanîna van şertan da hêzên navnetewî. Bi vê mebestê li nav kurdan rojname, dibistan hatin vekirin û di nivîsên fermî de bikaranîna zimanê kurdî hat teşwîqkirin. Hukûmeta îngîlîzan li ser van gavan li hember hêzên navneteweyî propagandaya xwe kirine.

Piştî ku meseleya Musulê çareser bû îngîlîzan dest ji kurdan kişandin û rê dan ereban ku siyaseta asîmilasyonê li ser kurdan bimeşînin. Ji xwe piştî ku Îraq di sala 1932'an de wek qraliyeteke serbixwe ji hêla hêzên navnetewî hat nasîn, Îraqê hemû mafên kurdan bin pê kir û zimanê hemî dezgeyên kurdî wergerandin ser erebî.

Wergera kurdî di her serdemê de ji pêşketinên wergerê yên Cîhanê zêdetir, li gor rewşên siyasî û civakî yên wê serdemê teşe girtiye, an geş bûye an jî têk çûye. Ev herdu gavên dawî jî, li gor konjektura siyasî ya serdema xwe derketine holê, ne wek geşedaneke ronakbîrî ye ku bi awayê xwezayî derketibe.

Piştî salên 1920'î pêve bizaveke berbiçav a wergerê li cem kurdan bixwe çêbû. Bi vî awayî bizava wergerê ya salên 20'î bû sedem ku form û rêgezên nû yên wek gotarên siyasî, çîrok, şanoname, helbesta nû, helbesta stûnî, rexne, roman û hwd. di nav nivîskarên kurd de zêde bê bikaranîn û geş bibe. Gelek têgehên zanistî, rexneyî û wêjeyî yên nû, bi taybet peyvên ku Ewropî ne, yên wek piyes, tîatir, otomobîl, şîmendîfer, hotel, bank, trajedî, komedî, bombedaran, mîkrob, şofêr, balyozxane û hwd. bi rêya çapameniyê wergeriyan kurdî ango kurdiya wan çêbûnû belavbûn. Bi rêya wergera pirtûkên wêjeyî û yên dibistanê, di salên 1920'î de bi sedan peyv û têgehên nû yên biyanî di vê heyamê de ketin nav zimanê kurdî û ferhenga kurdî dewlemend kir. Bi vî awayî jî ev hemî peyv û têgehên ku ji bo wergerê hewce bû ketin ber destê wergêran.

Dema meriv berê xwe dide wegera Rojava, hêj di despêka wergera nivîskî de ji bilî pratîka wergerê li ser çawaniya wergerê jî însanan serê xwe êşandine. Di serî de Cîcero û Horatius hem werger kirine û hem jî li ser çawaniya wergerê serê xwe êşandine û fikrên xwe anîne zimên. Bi vî awayî hêj di serdema antîk de terza wergerê ji bo wergêrên wê demê bûye arîşe. Dema meriv berê xwe dide nav kurdan, di demên ku di nav çarçoveya vê xebatê de meriv rastî nêrîneke li ser problemên wergerê nayê. Ango werger di nav kurdan de ji pratîkê wêdetir neçûye û kurdan neşiyane terza wergerê ji xwe re bikin derd. Wergerên olî yên metnên îslamî û yên edebî ku di serdemên cuda cuda de hatine kirin ji metneke rasterast hatî wergerandin wêdetir gelek caran metneke ku ji hêla wateyê ve hatine wergerandin afirandine. Biyaniyên ku ji kurdî ji bo zimanên din werger kirine jî, ji ber ku ji bo armanc û hedefên xwe yên li ser kurdan werger kirine, li ser qalîteya wergerê nesekinîne û bi qasî ku karibin

ji metnê fehm bikin wergera xwe kirine. Wergerên Încîlan ji ber ku tenê planên biyaniyan bûne û kurd bi piranî misilman û êzdî bûne, kurdîbûna încîlê jî bandorek ne li ser ronakbîrên wê demê kiriye û ne jî li ser gel kiriye. Dibe ku meriv bikare bêje ji ber ku pratîka wergera kurdî bi piranî di çarçoveya plan û programekê de nehatiye kirin, problemên wergerê jî nebûye rojev ji wergêran re. Helbet têkiliya vê bi pêşketina nivîsa kurdî re jî heye.



ENCAM

Dema mirov li pêvajoya pêşketina wergerê mêze dike xebatên wergerê ewil ên bi rêk û pêk di Serdema Antîk de dest pê dikin. Ji wê çaxê ve her roj werger û pirsgirêkên wergerê ji mirovan re bûye meraq û însan ketine nav hewldana wergerandinê û çareserkirina pirsgirêkên wergerandinê. Bêguman pêşketina wergerê li her erdnîgariyê di demên cuda cuda de li gor îhtiyac û pêşketina civakê derketine holê. Meselaxebatên wergerê li Yewnanîstanê zêdetir di Serdema Antîk de ,li Rojhilatanavîn di sedsala 6-7-8'an de derdikevin pêşberî me. Dema em berê xwe didin kurdan ev yek di sedsala 19'an de encax dedike pêşberî me.

Tê qebûlkirin ku bingeha xebatên wergerê li Yewnanîstanê ji hêla Cicero û St. Jerome (Hieronymus) ve hatiye avêtin. Ji wan heta nêveka sedsala bîstan nîqaşên li ser wergerê li der û dora nêrînên wan hatine kirin. Li nav misilmanan jî kêma zêde meriv dikare bêje heman nîqaş hatine kirin. Her çiqas ev nîqaş bi şiklekî derzanistî hatibin kirin jî ew ji bo zanista wergerê (wergernasî) bûn bingehe. Di sedsala bîstan de bi pêşketina xebatên lînguîstîk, teoriyên wergerê avabûn. Piştî nêveka sedsala bîstan xebatên wergerê bû dîsîplîneke akademîk. Di vê sedsalê de bi taybetî kesên wek Euguene Nida û Andréi Federov berê wergerê dan lînguîstîkê. Bêguman divê rola Noam Chomsky neyê ji bîr kirin. Bi nêrînên Chomsky ên bi navê “Rêzimana Veguhêzer a Afrîner ” (Generatif Transformational Grammar) derketin holê xebatên Nîda xurttir bûn.

Dema meriv berê xwe dide kurdî li gor gelên din, ji bo wergerê paşxaneyêke tije nîn e. Di nav kurdan de bizaveke wergerê ya xurt jî çênebûye ku saziyên wergerê ava bikin û bi sazûmanî wergeran bikin û li ser wergernasiyê serê xwe bêşînin. Xebatên wergera kurdî jî yên di çarçoveya vê xebatê de ku xebatên wergera kurdî ji destpêkê heya çareka yekem ya sedsala 20'î nixandiye, ji bizavên pêşketina wergerê bêpar maye. Lê bêguman wergera kurdî jî li gor guherînên civakî û siyasî yên cîhanê teşe girtiye. Wergera kurdî li gor şert û mercên civakî û siyasî yên nav civaka kurd û gelên cîran yên wek ereb,fars û tirk, geş bûye an jî qels bûye. Dem hatiye wergera metnên îslamî zêdebûye, dem hatiye wergera metnên edebî zêdebûye,dem hatiye wergera pirtûkên dersan zêdebûye. Ango her wextekê li gor şert û mercan bi xwe re bizaveke wergerê derxistiye.

Di pêvajoyê xebatê de me dît ku xebatên wergerê yên kurdî di serdemên cuda cuda de li gor rewşên civakî û siyasî geş bûne. Di dîroka wergera kurdî de heya 1930'î, şeş gavên girîng yên wergera kurdî derdikevin pêşberî me:

1. Gava yekem rastî mîrekiya Erdelanê tê ku wergêrê ewil ê kurd Xanayê Qobadî di vê serdemê de derdikeve.

2. Gava duyem bi xebatên mîsyoner û rojhilatnasan geş dibe.

3. Gava sêyem xebatên wergera mewlûdname û eqîdenameyan e ku wek bizaveke wergerê derdikeve.

4. Gava çarem avabûna çapameniya kurdî ye ku rastî dawiya sedsala 19'an û serê sedsala 20'î tê. Gelek xebatên wergerkirî di çapameniya vê serdemê de tên weşandin.

5. Gava pêncan jî ew e ku di sala 1926'an de, bi daxwaza nûnerê bilind yê Brîtanîyayê, bi pişgiriya hukumeta Îraqê nivîsgeheke wergerê ya kurdî li Bexdayê tê vekirin û pêşî li wergera kurdî vedibe gelek werger di vê serdemê de tên kirin.

6. Gava Şeşan wek bizava îcrakirina şanoyan derdikeve. Ji şanoyên ku tên îcrakirin bi piranî, ji şanoyên biyanî ji bo kurdiya soranî tên wergerandin. Ji 1920'î dest pê dibe heya 1930'î didome.

Di vê xebatê de nixandî li ser xebatên wergera kurdî yên ku me bi dest xistin an jî em jê haydar bûn hat kirin. Hin xebat jî ji ber nebûna derfetan me xwe negihandinê. Em hêvîdar in ku di vê hêlê de gelek xebatên bînan kirin û rabirdûya wergera kurdî ronî bikin.

ÇAVKANÎ

(1913). *Rojî Kurd*(3).

Kitabi Mukaddes-Eski ve Yeni Ahit,Bab 11. (2005). İstanbul: Kitabı Mukaddes Şirketi.

<http://dengekurdemisilman.com/klasik-kurt-edebiyati-i.html>. (2018, Haziran 20).

Aksoy, B. (2002). *Geçmişten Günümüze Yazın Çevirisi*. Ankara: İmge Kitabevi yayınları.

Aydoğan, M. (2002). *Berê Gotin Hebû*. Stokolm: Weşanxaneya Nefel.

Bassnett, S. (2002). *Translation Studies*. New York: Routledge.

Bozarşlan, M. (1985). *Jîn* (Cilt I). Uppsala: Weşanxana Deng.

Bozarşlan, M. E. (1998). *Kürd Teavûn ve Teraki Gazetesi*. Uppsala: Weşanxana Deng.

Bruinessen, M. v. (1985, 4). Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebi'nin Notları. *Studia Kurdica*, 13-37.

Demircioğlu, C. (2013). El-Cahız'dan Manastırlı Memet Rıfat'a: Arap Çeviri Kuramcıları İle Osmanlı Mütercimleri Arasındaki Bağlantılar. *Turkish Studies*, 739-759.

Ece, A. (2007). Erek Odaklı Kuram, Skopos Kuramı ve Bağıntı Kuramı Bağlamında Çeviri Eğitimi. *Eğitim Bilimleri Dergisi*(26).

Ghanooni, A. R. (2012). A Review of the History of Translation Studies. *Theory and Practice in Language Studies*, 77-85.

Göktaş, N. (2005). Fransa'da Yazınsal Çeviri Yaklaşımları (Bir Tarihçelendirme Denemesi). *Çukurova Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, 51-62.

Hornby, M. S. (2006). *The Turns of Translation Studies*. Philadelphia: John Benjamin Publishing.

Irgat, M. (1992). *Dermanên Bijîşkiya Gelêrî*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Katipoğlu, H., & Kutluer, İ. (1998). Huneyn b. İshak. *İslam Ansiklopedisi* (Cilt XVIII, s. 377-380). içinde İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı.

Kaya, M. (1992). Beytül Hikme. *İslam Ansiklopedisi* (Cilt 6, s. 89). İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı.

- Keskîn, M. (2013). Di çapameniya dewra Osmanî de wergera kurdî. *Wêje û Rexne*.
- Kızıltan, R. (2000). Antik Çağdan 19. Yüzyıl Sonuna Kadar Edebi Çeviri Kuramları -1 Antik Çağdan Barok Çağın Sonuna Kadar. *Ankara Üniversitesi Dil Ve Tarih Coğrafya Fakültesi Dergisi*, 71-88.
- Kızıltan, R. (2001). Çeviri Tarihi- Aydınlanma ve Erken Romantizmin Edebi Çeviri Kuramları. *Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih-Coğrafya Fakültesi Dergisi*(41), 37-68.
- Koyî, H. Q. (1913). *Rojî Kurd*, 82.
- M..., H. (1913). *Rojî Kurd*.
- Mertoğlu, M. (2013). Yusuf Ziya El Halidî. *TDV İslam Ansiklopedisi* (Cilt 44, s. 32-34). içinde İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı.
- Mûdanî, X. (1913). *Rojî Kurd*, 32.
- Munday, J. (2001). *Introducing Translation Studies: Theories and Applications*. New York: Routledge.
- Munday, J. (2001). *Introducing Translation Studies: Theories and Applications*. New York: Routledge.
- Öpengin, E. (2011). *Wergêr û wergêran di kurmanciyê de: paşxane û hindek pirsên îroyî*. Sanadaj: University of Kurdistan Press.
- Öztürk, M. (2017). *Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî*. Diyarbakır: Lis Yayınları.
- Öztürk, M. (2018). Çîrokên Werger Ên Mela Mehmûdê Beyazidî. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Entitüsü Dergisi*, 33-63.
- Pîrbal, F. (2002). *Mêjûy Wergêranî Kurdî*.
- Radegundis, S. (2013). *Çeviri Kuramları, wer. Emra Durukan*. İstanbul: Değişim Yayınları.
- Rieu, C. (1881). *Catalogue of The Persian Manuscripts in The British Museum*. London: Gilbert and Revington.
- Rieu, C. (1888). *Catalogue of The Turkish Manuscripts in British Museum* (s. 70).
- Sarıkaya, M. (2013). El-Câhız'dan Es-Safedî'ye Çeviri Teorisi, *Bilimname* III,3,2013,133-151. *Bilimname*, III(3), 133-151.
- Serfiraz, M. (2013). Türkçe Kürtçe Bir İlmihal. *Kürt Tarihi*, 55-60.

- Serfiraz, M. (2015). *Kurd, Kitêb, Çapxane*. Stenbol: Weşanên Peywend.
- Stepan. (1857). *Încîl*. Stenbol: Çapxaneya Kayol.
- Suçin, M. H. (2012). *Dünden Bugüne Arapçaya Çevirinin Serüveni*. Kurgan Edebiyat Yayınları.
- Tanrıverdi, E. (2007). Arap Kültüründe Çeviri Çalışmaları ve Huneyn b. İshâk Ekolü. *Divan, Disiplinlerarası Çalışmalar Dergisi*, 12(23), 93-150.
- Tek, A. (2015). *Osmanlı Edebiyatında Mem û Zîn Mesnevisi ve Yayılımı*. Ankara.
- Toska, Z. (2015). Di Pêwenda Edebiyata Klasîk de Mesnewiya Mem û Zînê. *Ji Duh Heta Îro Di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî*, (s. 114). Mêrdîn.
- Tunalı, G. (2006). Çevirmen Kimlikleri; Tarihsel, Dizgeci, ve Eleştirel Bir Yaklaşım. İzmir: Teza Lîsansa Bilind Ya Neweşandî.
- Tytler, A. F. (1907). *On The Principle Of Translation*.
- Venuti, L. (2004). *The Translation Studies Reader*. New York: Routledge.
- Venuti, L. (2008). *The Translator's Invisibility*. London: Routledge.
- Yıldırım, K. (2013, Şubat). Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni. *Kürt Tarihi*(5), 28.
- Yıldırımçakar, Z. (2016). *Werger Wek Kirineke Çandî*. Mardin.
- Yücel, F. (2016). *Çevirinin Tarihi*. İstanbul: Çeviri Bilim Yayınları.